

Kurdên Sûrya: Pevçûnek di Nav Pevçûnekê da

Raporta hejmara 136 li ser Rojhilata Navîn | 22 yê kanûna diwem a 2013 a
Wergerrandin ji Inglîzî

Naveroka Mijara

Kurteya rêvebir.....	i
Sifariş	iv
I. Destpêk.....	1
II. Ji serhildana welatên Ereb heta derfeta Kurdan.....	6
A. Komara Erebî ya Sûriyeyî û Kurd	6
B. Tevgerê Heremî.....	9
C. Serokatî dikeve dest partîyê sîyasî da	11
D. Bi serketina PYD ê	12
III. Dijberîyê Partîya.....	17
A. Komîteyê ciwanan.....	17
B. Encûmena Niştîmanî ya Kurdî (KNC): Konfederasyonek Serkeş	18
C. Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD): Pêwendîyek rîgir gel PKK ê.....	19
IV. Dijberîyê Heremî.....	22
A. Barzani wek navbeynkerek berjewendîxwaz	22
B. Tirkîye hatê meydanê.....	28
V. Zêdebûna şerxwazîyê.....	31
A. Bilindbûna alozîyê xwemalî di navbera Kurdan da	31
B. Pevçûn li ser Qamişloyê	33
VI. Pêwendîyên aloz gel Dijberên Ne-Kurd	35
A. PYD: pêş girtina rîyek serbixwe	37
B. KNC: Pêwendîyên bêhêvî gel Dijberên ne-Kurd	38
VII. Encam	41
PÊVEK	
A. Nexşeyê Sûrya.....	42
B. Nexşeyê Partîyê Pêwendîdar gel PKKê	43
C. Nexşeyê Partîyê Pêwendîdar gel KRGê	44
D. Naveroka Nîşanê Kurtenav	45

Kurteya rêvebir

Hember berfirehbûna pevçûna di nav Sûrîyê da bajarê kû piranîya xelkên wê Kurdin, di asayî yê da ma ne. Ji ber kû ev bajara ne gelek ber çav nînin, dûr ji êrişen dewletê ma ne. Bi derbas bûna demê, bo kû hêzên ewlehîyê Esed bikaribin di cihekê da kom bibin ji bajarên Kurda paşve kêşan. Komê Kurd hatin û şûna wan girt: kû bajarê xwe rizgar bikin û heremê xwe biparêzin û xizmetê pêdivî pêşkêşî xelkê xwe bikin û bo Sûrîya paş Esed rewşa civakê amade û bihêz bikin. Desthelatê mezintir ji dikarin bi dest bînin lê ne bi sanahî. Ji ber dijminîya navxwe, dijminî gel Ereba (hember pevçûnê wê dawîyê) û dijberîyê heremî li ser mijarek bi navê pirsgirêka kûrdistanê armançen Kurda niha ji bê çareser maye. Ji bo Kurdê Sûrî, ku bi sala hember zûlmê hatine û mafê wan yê serekî hatîye bin pê kirin, balkêş kû dijberîyê navxwe bi dawî bînin, daxwazê xwe zelal bikin – eger bi lihev kirinê sext jî bibe – û gel her saziyê bihêzê di pêşeroja Sûrîyê lihev bike heta kû bikaribin mafê xwe zelal bikin û bidin misoger kirin. Û niha dema wê ye kû hevkûfê ne- Kurdên wan stratejîyek pêşkêş biken û giş Sûrîyan misoger bikin ku di dewleta nû da, mafê netewa, dad û lêpirsîn bi berfirehî bê qebûl kirin.

Kurdên Sûriyeyê, komekin ku ji hêla neteweyî û zimanî gelk xelkê dî yên ev welatî ferq dikin, di erdê nêzî sînorê tirkîyê û Eraqê da dijîn, lê di gelek bajarê dî yên welat wek Şam û Helebê jî gelek kûrd dijîn, bi rastî eger em bixwazin bipeyivîn, dibî em bêjin ku bajarê wan di heremeke tenl da nînin, ci li hêla sîyasî – ewan wek wekhev xwe yê Eraqê di rejîma Bes da Serbixweyî bi dest neanî bûn – û ci ji hêla coqrafayî jî, ji ber ku di heremê bakûrê rojhilate ji ku xelkê wê bi gelenperî kurdin, netewê di wek Erebê Sûnî, Aşûrî, Ermenî, Tirkemen û Îzidî ji di hinek taxa da dimînin. Ji ber wê em nikarin ser heremek yekgirtî bipeyivîn. Zêdetir ji wê ev berevajîyê birayê xwe di Tirkîyê, Iranê û Eraqê ji qazanca jîyan di çiya da bêpişkin heta bikarin bi asayî dijberî dewleta navendî saziyê çekdar saz bikin.

Rejîm behayek baş ji Kurdê Sûriyeyê re nadet û bi pejirandina hinek xebatê sîyasî û çekdarî (dema ku dij bi tirka dihatin bikar anîn) û xebatê tawanbar (zêdetir qaçax) ewan piştîvanîya hinek ji wan bi dest anî bûn, lê ewanê dî bi giştî di bin ferq û cudahîyê û zilma bi pergal bûn. Yek ji mînaka ev naberaberyê bê welat bûna û jîyan di valahîyê da û binpê bûna mafê bineyîyê nêzî 300,000 hizar kes ji kurda bo kû dibe ji sedî 15 ji du milyon Kurdên Sûriyeyê. Lê hinek caran serhildan çê dîbin lê tên qir kirin li ber vê Kurdên Sûriyeyê bi giştî hêminin.

Ev rewşe diguhere. Her wek me di sala 1991 û disan di sala 2003 di Eraqê da dît, aloziyê tundê yê niha derfetek daye dest Kurda ji bo çak kirina – û yan herî kêm destpê kirina çak kirinê – tiştekê ku bi bawerîya Kurdan şâşîyek dîrokî bo, anku bîryara dewletê Firansî û Inglîzî li ser piş vekirina Rojhilata Navîn bi rewsek ku ev kirine gelê herî mezin yê bê dewlet. Wisa diyar dike ku ev li ser vê armancê micidin. Tevî ku hebûna nêrînê cûda li ser çavanîya bûne ev yekê, bûye sebeb ku hêdî hêdî pey vê armancê biçin.

Di sala 2011 da dema ku li sûriyeyî da sehilda çê bo, ciwanê kurd besdarî serhildanê bûn, lê partîyê kîvneşopê kurda nêrînek cuda hebûn, ev ji vê yekê ditirsîan ku heke besdarî mixalifan bibin li alîyê dewletê ve bi sebeba tolhildanê bêن qir kirin, û serpêhatîyê wan, ji bê alîbûna Ereba di dema serhildana xwe ya sala 2004 an – û qir kirina paş vê – bîra wan dihat û gihiştine ev encamê ku pê tevlî nebûn xwe,

berjewendî yê xwe bimeşînin, û li ser vê dilnigeran bûn ku têkoşerê ciwan rola wan rexne biken. Û herwisa rejîm ji bi hivîya pêşgirtin ji saz bûna cepeyek nû û pê misoger kirina dijberîya Kurd û Ereba, rewş zêdetir aloz kir, û xwe ji heremê kurda dûr xist, û li ser vê gelek partîyê Kurda biryar girtin ku zêdetir besdarî pevcûna nebin, anku ne gel dewletê bi şar bêñ û ne piştevanîya biden vê, û hember dijbera ji pêvajoyek bi gûman û tirsê meşandin ji ber ku ev bi giştî Erebê netewperest û Islamî nas dikirin.

Di dema niha (û bi yeqîn di encama pevcûnê domdar) partîya herî bibandor PYD (Partiya Yekîtiya Demokrat) e, û her ev partîye kêmirtîn daxwaza şer li gel rejîmê heye û bûye sebeba gûmana lihev kirina Kurda gel rejîmê. Partîyek ku bi xurtî hatîye birêxistin û perwerde kirin û çeke kirin, çığa Kurdê sûriyeyî ya Partiya Karkerêñ Kurdistanê (PKK) ye ku xwe partîya şorres ya herî balkeş di Tirkîyê daye. Demek kêm paş destpê kirina serhildana Sûriyeyê. PYD ku gel PKK ê di çîyayê bakura Eraqê da dima, vegerrîya Sûriyeyê, û komek çekdar gel xwe anî nav welat. Ev partîye di sala 2012 ê paş derketina hêzên ewlehîyê rejîmê ji heremê kurda, derfet bikar anî û xwe ji alîyê siyâsî û ewlehî xurt kir, û herî kêm di pênc bajara, mirovîn dewletê ji navendê fermî xiste der û ala xwe bi şûna ala Sûrî danan. Û pê ev kiryare, ev partîye wek berpirsê saziyê dewletê di bajarê Kurdan da, xwe da nas kirin.

Dijberê giring yê PYD çend komê cuda ji partîyê biçûk yê Kurdin ku gelek ji wan pêwendîyê nêz gel komê Eraqî hene. Di cotmeha 2011 da, bin siya Mesûd Barzanî, serokê Hikometa Herema Kurdistan (KRG) di Eraqê û Serokê Partîya Demokrata Kurdistanê (KDP) di Encumana Niştîmanî ya Kurd (KNC) da kom bûn. Ev Encumene dijberê bibandor yê PYD ê ye, lê hebûna dijberiyê navxweyî û nebûna hêzek xebatkar di nav Sûriyeyê da, bandor vê wek hêzekê kêm kirîye. Wisa pecçûnê Sûriyeyî bi saz kirina valahîyek ewlehî û siyâsî di heremê Kurdan da, bûye sebeba zêde bûna dijberiyê ev du partîyê serekî.

Komê Kurd ne tenê li gel hev dijberiyê diken lê di heman demê da gel dijberê – ne-Kurd ji dijberin. Ev komene giş dixebeitin bo bi dest anîna berjewendî yê xwe, dû şûnpê û zêde kirina heremê bindestê xwe dikan. Ji ber bi bandor bûna neteweperestîya Erebî û Islamxwazî di nava dijberê ne-Kurd da û herwisa pêwendîyê bercavê wan di gel dewleta Tirkîyê û piştivanê kevneşopê wan di nava welatê Kendavê, gelek Kurd, bi taybet lê ne tenê alîgirê PYD, ji wan biyanî ne. Hevdem gel zêde bûna pevcûna û metîrsîya zivirana wan bo şerî giştî yê navxweyî, pevcûnê olî û netewî di rojevê dane, berî niha welat bûye şahidê pevcûnê navbera şervanê PYD ê û komê çekdarê dijber (ku gelek caran bi şâşî û nehêjayî Artêşa Azad a Sûriyê, FSA tê bang kirin). Heta ev demê pevcûn tenê li ser desthilatdarîyê bûye lê gengazê di pêşerojê da bibe pevcûnê mezintir ser rewşa pêşerojê ya Kurdan.

Di davîyê da pevcûnê Sûriyê, bûye sedema bi şidet bûna şerê na berçav li ser dil û rihe tevgera netewî ya Kurda di herçar welatê (Sûriye, Eraq, Iran û Tirkîyê) da ku ev tevgere di nava wan da bilav bûye. Piştivanê heremî yê PYD û KNC anku PKK û KDPa Barzanî, du modelê serekî ji netewperestîya Kurdî û herwiha du mînakê dijber bû rûbirû bûn gel dewleta Tirkâ destnîşan diken, ji ber ku sînorê dewleta Tirk di nav pişkek mezin ji erdê ku Kurd welatê xwe yê dirokî dizanin da derbas dibe. PKK pê bikar anîna şerê çekdar hember Tirkîyê, xebîfye ku Enquerê neçar bike ku mafê çandî û siyasiyê Kurdan zêdetir bike, di berevajî yê da, KDP, pê bikar anîna bandora xwe di Hikometa Herema Kurdistanê, di ev salê dawîyê da xebatê mezin kirine ku pê çê kirina pêwendîyê abûrî û siyâsî dewleta Tirkâ han bide bo kiryarek biqazancit û hevdem kêm kîrina girêdayî bûna xwe gel dewleta Bexdayê.

Tırka xwe jî di nava vê komê da cî digre. Girêdana PYD ê li gel PKK ê ne zelale, lê bi bawerîya Tırka bersiva ev pirsê di mêt da hatîye dayîn, di bawera Tırka da, tevgera Kurdê Sûriyeyê çiqek biçük yan rûnivîsek biçük ji PKK ê ye û xebatê wan ji bo bides anîna desthilat di Sûriyeyê da metîrsîya geş kirina hestê cudaxwazi di Tirkîyê da heye. Çeperê PYD yê bihêz di nêzî sinorê Tirkîyê ku gengaze di pevçûnê gel Tirkîyê ji alîyê PKK ê va bêñ bi kar anîn, ji alîyê Enquerê ve nayê pejirandin.

Hevdem gel kêm kirina dijberiyê navxweyî, misoger kirin Enquerê û berçav kirina hêza xwe, Barzanî dixebite ku bibe navbeynkerê lihev kirina navbera PYD ê û KNC ê. Herdu parti ji vê kiryarê mifa werdigrin: ji ber ku KNC yê hevalê navnetewî û meşrûti heye, lê bi şidet dijberî navwxeyî hene û ser erê bê desthilate, berevajî yê vê, PYD ê piştivanîyê bihêz yê xwemalî hene û lê meşrûtiya navnetewî wek wê tuneye. Lê berhemâ navbeynkerîya Barzanî ku Desteya Kurdi ya Bilind (SKC) tê bang kirin, di rewşa herî baş da tenê ji bo berjewendîya ye, herdu alî ji yek re piştrast nînin, û herdu alîya gel pêwendîyê aloz gel mixalifê Sûriyeyî hene, di navbera wan da ser heremê balkêş pevçûn ketîye holê; û herdu çavrê ne ku rewşa welat bê zelal kirin.

Herwisa, teví ku di dema niha da, Tirkîye naxwaze yekser êriş li ser PYD ê bike – ji ber metîrsîya ketina nava agir û herwisa nebûna hecetênen şer gel PKK ê – û li gel vê hindê ku rolêk balkêş daye Barzanî ji ber ku ber ji PYD ê bigre. Lê gengaze ku ev rewşe nedûme. Pê derbas bûn demê, bi gengazîyek zêde dibe ku berjewendîyê Hewlîr û Enquerê li yek veqetin. Ji ber ku Hewlîr dixwaze herema desthilatdarîya kurda di sinore Eraq û Sûriyeyê da xurttir bike, lê Tirkîyê bi yeqin ji bandor vê yekê ser Kurdê welatê xwe, û bi taybet bandor vê li ser rewşa Pkk ê ya giştî ditirsît.

Kurdê Sûriyeyî dibe heri zêde bixebeitin ku nakevine nava pevçûnê zêdetir yê heremî û herwisa ji bo serbixweyî ya zêdetir nexebitin. Pêşeroja wan niha di Sûriyeyê da tê bê zelal kirin, û dibe ev li ser rola xwe di pergala pêşerojê da gel hêzê Sûriyeyîya biaxivin û li rêzgirtina mafê xwe yê serekî di pêşerojê da misoger bibin.

Sifarişt

Ji bo Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD)ê, Encûmena Niştîmanî ya Kurdî (KNC) û nûnerê komê Kurd yê serbixe:

- Lihev kiranê xwe yê sîyasî û fermî xurttir biken û ji bo bidest xistina stratijîyek yekgirtî bo dabîn kirina awlehî û xizmetê serkî ji heremê kurdan re lihev bikin.
- Bê ku hûn gel dewletê bi şer bê, gel pişka mezin li civaka Sûrî pêwendîya girê bidin, bo ev kiryarê hûn dikarin alîkarîyê mirovxazanê, çê kirina nexweşxana bo sivîl birîndar bê hûrbûn li ser netewê, girêdanê sîyasî û hevxemîti gel astengîyê hevwelatîya di giş Sûriyê da biken.
- Li kiryarê ku bibe sedama metirsîya cuda bûna Kurdistanê wek guhartina nîşanê giştî di gel nîşanê Kurdî, xwe ragirin.

Ji bo Desteya Kurdî ya Bilind (SKC):

- Li ser tîşen ku hûn dixwazin desthilatdarê serhetî bo rêzgirtin ser mafê Kurda biçî bine, helwestek zelal û yekgirtî amade biken û li ser vê esasê gel wekhevê xwe yê Sûriyeyî bipeyivîn.

Ji bo PYD û hêzê çekdar yê Yekîneyên Parastina Gel (YPG):

- Pevçûnê xwe herî kêm bikin, rola xwe di berpirsiyariya xwemalîya polîsa di heremê Kurda da sinordar biken û gel komê ciwana yê serbixwe û KNC yê lihev û alîkarî bikin.
- Xwe ragirin ji kiryarê zordarîyê yan qutifandinê di heremê bi destê xwed da.
- Xwe ragirin ji kiryarê ku bibe sedema êrişa bi çek ya Tirkîyê, wek bikar anîna axa Sûriyê wekî çeperek bo çekdarê ku PKK piştîvanîyê lê dike.

Ji bo şervanê ku ji alîyê KDP ê ve hatin perwerde kirin û di bin sîya KNC ê da dixebitin:

- Tenê hember peymana zelal gel PYD ê bikevina nav Sûriyê, peymana ku têda heremê xebatê rûn dibe û destnîşan dike ku dibe çawa dijberîyê herdu alîya bêñ çareser kirin, û pergalek zelal bo nasandina şervana di herdu hêzê da, serokatî û xebatê wan pêk dîne.

Ji bo dijberê ne-Kurdê Sûriyeyî bi taybet endamê çekdar:

- Gel Desteya Kurdî ya Bilind li ser sazkirina pergalek demokratîk kû têda wekhevîya hevwelatîya û rêzgirtin ji Kurda ji tê da hebe, bipeyivîn û yan piştgirîyê biden hevpeyivîna.
- Bi rewşek berçav piştgiriya xwe ji betal kirina hemî zagonê ku mafê komê taybet ji Kurda binpê kirin îlan biken.
- Di dema xebat di heremê ku bin destê komê çekdar yê Kurdî da ne, li gel Desteya Kurdî ya Bilind lihev bike.

Ji bo dewleta Tirkîyê:

12. Xwe ragire ji êrişa yekser li ser heremê Kurdê Sûriyeyê, û hevdem bo çareser kirina pirsa Kurdan di Tûrkîyê da xebatê xwe zêdetir bikin.
13. Gengaze bi piştîvanîya Desteya Kurdî ya Bilind li gel PYD ê bipeyivîn, û dibe armanca ev peyivîna bi taybet li ser saz kirina mekanîzmekê bo pêwendî û lihev kirinê li ser awlehîya sinora bî.
14. Dijberê ne-Kurdê Sûriyeyî han biden ku komê dijberê Kurdî di nava pergalek siyasî ya demokratik da li berçav bigrin, û destnîşan biken ku di pergala nû da giş hevwelatîya tê mafê wekhav hebin.

Ji bo Hikometa Herema Kurdistanê (KRG) di Eraqê da:

15. Xwe ragirin ji berdanê komê Kurdî ji canê hevê û bi şûna vê dû siyeseta yekbûnê û bihêz kirina nûnerî û rewayî ya Desteya Kurdî ya Bilind herin.
16. Bi taybet KNC û PYD han bide ku lihev kirina wan zêdetir bibe heta ku bikaribin bi alîkarîyê komê ciwana yê serbixwe aştî û ewlehîyê di giş heremê Kurdên Sûriyeyê da saz bikin.

Hewlêr/Şam/Birûksel, 22 yê kanûna duyem a 2013 a

Kurdên Sûriyeyê: Pevçûnek di Nav Pevçûnekê da

I. Destpêk

Di kêleka zêde bûna pevcûna di navbera çeperê layengir û dijberê rejîmê. Heremê bi giştî Kurd di bakûr û bakûr rojhilat, pevcûnê alozê taybet li xwe dibîne. Ev pevcûne di navbera Partiya Karkerêñ Kurdistan (PKK), komek ku bo bidest anîna mafê zêdetir bo Kurda ji sala 1980¹ heta niha şorrişike çekdar hember dewleta Tirkî birêve birîye, ji alîyekê û ji alîyê dî ji komên dijber ku bi giştî di bin navê Encûmena Nişîmanî ya Kurdi (KNC) da kom bûne, û ji alîyê Partiya Demokrata Kurdistanî Eraqê (KDP) bi serokatîya Mesûd Barzanî ve têni pîstîvanî lêkirin, da derketine holê.

Xuya ye ku mezintirîn û bihêztirin partîya Kurd anku Partiya Yekîtiya Demokrat, (PYD), ku di sala 2003 ya da hatîye saz kirin, ji alîyê îdeoloji û li ser gotinê hinek kesa ji alîyê rîexistinî û çekdarî jî girêdayî PKK ê ye. Tevî ku PYD napejirîne ku çîqek ji ev komê ye, lê endamek ji Koma Civakêñ Kurdistan (KCK) ye. Ku partîyek giştîye û serokatî û rîçikê we wek PKK ê ye, herwek di binê ev perê da da agahîyê zêdetir tê dîtin.²

Di navber wan duyan da girêdanê çekdarî ji hene, çîqa çekdar ya PYD anku, Yekîneyêñ Parastina Gel (YPG), di navenda PKK ê da di çiyayê Qendîlê di bakûrê Eraqê da hatîye perwerde kirin. Hebûna PKK ê di heremê da gelek caran bûye sedama bordimana asmanî ji alîyê hêzê Tirkî di sala 1990 ê heta nihe, di nêz da ev bûyere bû sedema aloziya di navbera ev tevgerê di gel Serokê Hikometa Heremê Kurdistanê anku Mesûd Barzanî, ji ber ku wî pêwendîyê xurt di gel Enquerê hene. Ji bo PKK ê, serhildana Sûriyeyê ku ji Adara 2011 a da destpê kir, derfeteke bû guherîn – yan herî kêm bi rengîn kirin – a hêzên sîyasî û çekdarê pîst serê xwe.

¹ Partiya Karkerêñ Kurdistanê (PKK), komek têkoşer û neteweperes ya Kurd di Tirkîyêm daye, ku di sala 1978 ji alîyê Abdûla Ocelan ve hat damezrandin, ev her niha ji serokê ev partîyê ye, tevî ku ji sala 1999 di Tirkîyê da di girtîgehê da dimîne û sizayê hepsa hetahetayî jê re hatîye birîn. Ev partîye îdia dike ku dû mafê çandî û sîyasî yê kurda ye, û ji armanca xwe ye destpêkî ku damezirandina dewleta serbixwe ya Kurdi bû paş vekêşaye. Sîyasetê dewleta Tirk xelkê kurd ku hejmara wan ji sedî 15 heta 20 a tê texmîn kirin, bi maweya çend deh salan ji zimanê xwe yê serekî û mafê zagonî dûr xistîye, û her ev bûye sedema serhildana sala 1984 an. Herî kêm 30,000 kes ji herdu alîya di pevcûna da canê xwe ji dest dane. Rapora hejmara 213 Koma Kirîza Ewrûpa, Tirkîye : *bi dawî anîna şorrişa PKK, 20 ê Ilona 2011 an.*

² Ji bo agahîyê zêdetir li ser sirişa aloz ya PKK ê û sazîyê pêwendî dar gel wê, binêrin ji, rapora hejmara 219 Koma Qeyrana Ewrûpa, Tirkîye : PKK û çareserîya pirsa Kurdan, 11 ê Ilona 2012 an., rûpelên. 7-9. Nûnerê PYD di mijarê derive da anku Alan Semo zelal kir ku, tevî kû PYD endamek ji KCKê ye lê belê sazî ya xwe parastîye: "PYD partîye Sûriyeyî ye li gel serok, rîexistin û sazîyê raybet bi xwe heye. PYD tenê ji hêla îdeolojiya hikometa xweserîya demokratik girêdayî KCK ê ye, herwek partîyê dî yê Kurdên Sûriyeyî ku gel KDP yan PUK ji hêla îdeoloji vê hevparin". yê Koma qeyranê, 10 tebaxa 2012 a.

Tevî ku PYD di Sûriyeyê da bibû partîyeke qedexe,³ lê serokê vê demek zû paş destpê kirina sehildanê ji Qendilê vegerrîya welat. Salih Mûslim serokê ev partîyê ji ber xebatê sîyasî yê nazagonî di Sûriyeyê da di girtîgehê da bû lê berî sala 2010 revî û ji PKK ê di Eraqê da daxwaza penaberîyê kir, rejîme ji wî re ku xwe dûr ji welat bû sezayê hepisa hetahetayîyê birî, dibêji ku ev di meha Nîsanna 2011 a da vegerrîyaye hermê Kurdî yê Sûriyeyê.⁴ di vê demê da ev partîye bo bi dest anîna piştgirîyê ji alîyê Kurdên Sûriyeyî vê herî zêde dest bi xebatê sîyasî û çekdarî kir. Hember gotinê kesekê ku pêwendîyê nêz di gel ev partîyê hene, her di vê demê da bû ku PKKê 1000 şervanê çekdar bo saz kirina çığa çekdar ya PYDê anku Yekîneyên Parastina Gel (YPG) şande Sûriyeyê.⁵

Ev bûyerene bi taybet di nava komê dijber da bûne sedema ev şibhê ku PYD gel dewletê lihev kirîye û ïzin standîye ku dîsa hebûn xwe ïlan bike û berçav dest bi xebatî bikê û di miqabil da gel hêzê ewlehiyê erîşî mixaifê dewletê di heremê Kurda da bike.⁶ Hinek ji vê jî derbas dibin û navê we dijû yê şebbiha li ser dadinên.⁷ belgeyên ku tê Îdia kirin yên partîya Baasin û ji alîyê Al cezîrê ve hatine weşandin, nîşa diden ku ev rejîme di destpêkê da biryar girtîyê PYD ê wek nabeynkerek heremî bikar bînî û xwe yekser erîşî heremê Kurda neke. Yek ji ev belgeyan ser pêdivîya “kontrol kirina heremê Kurdan; û lihev kirina nehîne gel [PYD] bo erîş kirin ser dijbera û serhildanê; û têkil nebûna [yekser] ya hêzên ewlehîyê di heremê Kurdan da”dupat dike.⁸ Koma kirîzê (Qeyran) nikarî rastîya ev dosîya misoger bike yan hebûna lihev kirina fermî di navbera PYD ê û rejîmê dupat bike. Gengaze ku PYD tenê ji derfeta vala bûna heremên ku pêştir ji hêzên ewlehîyê vala bûyî, yan heremê ku ev hêzene tê da kêm bûn û yan bi giştî tê da nebûn, mifa wergirtibî û hevdem gel Şamê gihiştibe taktîka lihev kirina kurtdemî.

³ Bo mînak di 2009 an da, çar Kurdê Sûriyeyî bi gumana endametîya PYD û “xebat li ser cuda kirina pişkek ji axa Sûriyeyî û zeliqandian vê ji dewletek bîyanî re” sezayê şes sal bendîxanê ji wan re hate birin. El-Erebîyê, 10 Çiriya paşîna 2009 an.mînak di 2009 a.

⁴ Binêrin ji <http://carnegie-mec.org/publications/?fa=48726>.

⁵ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Kurdistanâ Eraq ê, 7 Çilê 2012 a. yek ji lêkolînker Kurdê Sûriyeyî ku rexnekerê PKKê bû ev rexne red kir: “Hemberî pişkek ji lihev kirina PKK ê gel Îranê, evan 500 gerîla ji Qendilê ji Sûriyeyê re şandin. Îranî ya ji wan re fişar dianî ku kesen zêdetir ji Qendilê bişînîn, û Îranîya daxwaz dikir ku hinek caşîyarîker, bi menaya rastî: caşê kerê] ji Kurdên Îranê ji biçin, lê Kurd qebûl nakin û me lihev kiribû ku tene gel we di lîre da [di Îranê da], alîkarîya we bikin ne di Sûriyeyê da”. Hevpeyivîna telefonî ya Koma Qeyranê, Kurdistanâ Eraq ê, 7 kanûna duyema 2012 a.

⁶ Kesek dijber di Koma Netewî ya Kurda da got, “Ez nizanimbi rastî lihev kirina wan ci bû, lê hinek nîşanî li ser lihev kirina wan zelalin. Bo mînak, ji bo hinek ji endamê PYD ê sizayê girtinê hatibû birîn lê dema ku ev ji Qendilê hatne Sûriyeyê nehatin”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 31 Kanûna yekema 2011 a. Koma Qeyranênikarî ev gotina dupat biket.

⁷ Şebîhe di destpêkê da ji bo komê çete dihate bikar anîn ku pêwendîyê wan gel hêzên desthilat dar hebûn re dihate û xelkê heremê beravê ditirsandin û pê makîna Mêrsêdêz Bênz ku jê re digotin şebeh (ruh) hat û çûn dikirin. Dewletd ev di sala 1980 ê da qir kirin, lê ev nave her ma û gele kesê sivil ku alîkarîya dewlet dikirin re dihat gotin. Yek ji endamê Koma Netewî ya Kurda got “me ci elaqe tine ku em alîkarîya PYDê bikin ji ber ku ev wek Şebeha di heremê Kurdan da dixebeitin, wek mînak, dema ku sixurekê di nava saziyê ewlehîyê dewletê ji partîyê Kurda re agaî didan, PYD ê ev kuşt û ji wî re xaîn got; evan difin û guhê wî ji birîn”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, kanûna duyema 2012 a. KurdWatch, rêxistînek komelê civakê ye di Berlînê da cih digre, bo mînak di 4 temûza 2012 a da rapor daye ku di hinek bûyera da xelik ji alîyê piştigirê PYD ê vê bi kiryarê radikal hatine tirsandin. Koma Kirîzê di rewşekê da nîne ku bikare ev gotina ne dupat biket.

⁸ “Dosîyeyê Şamê”, El Cezîre, 20 ê Adara 2012 a.

Hevdem gelbihêz bûna dijbera û kêm bûna desthilatdarîya Esed, PYD beşdarî Sazîya Lihev kirina Netewî bo Guherrîna Demokratîk(NCB) bû, û rola serokatîya vê li ser stuya xwe girt. Ev rîxisrine ku komek navendî ya ku di Xezîrana 2011 a da çê bû û bi gelenperî ji Erebê sosyalîst û Kurdan pêk hatîye û bi cid dixwaze ku rejîm biguhere, û hevdem gel êrişe derwê dibere û rixneyê tund rastî komê radikal di nava dijbera da dike.

Di Temuza 2012 û hevde meha paş serhildana bê encam, hinek nîşan ji kêm bûna desthilatdarîya dewletê û bihêz bûna dijbera xûya dike û PYD ê jî rawestê xwe radikaltir kirine. Ev partîye paş derketina hêzên ewlehîyê rejîmê ji heremê kurda, derfet bikar anî û xwe ji alîyê siyasî û ewlehî xurttir kir, û dema ku komê dijberê çekdar di heremê ne-Kurd di bakûrê Sûriyeyê dest bi serhildanê kirin, PYD ê mirovîn dewletê herî kêm di pênc bingehê xwe – Ayn al-Arab (di Kurdî da Kobanî dibêjin), Amûda, Al-Malikîyah (Dêrik), Efrîn û Cindirê⁹ – ji navendê fermî xiste der û, ala xwe bi şûna ala Sûrî danan.¹⁰

Û paşa ev partî bo partîya herî balkeş ya Kurd di welat da, û berçav xwe wek berpirsê saziyê dewletê di bajarê Kurdan da lê bilîti ji bajarê balkeş yê Qamişlo yê, xwe da nas kirin.

Ev weşana nehatî dîtina ji hêzên partîya PYD ê tirka xiste di nava metirsîyê da, ji ber ku heta pêş ev bûyer bi çavê ciqek ji PKKê temaşayî ev tevgerê dikir. Bi lez Recep Teyib Erdogan serokwezîre Tirka metirsî da ku eger PKK bixwaze di Sûriyeyê da cepera saz bike, dewleta wî “mafê bêgengazî” bo êrişê ji xwe re rewâ dizane.¹¹

Bihêz bûna PYD di bihara 2011 da bû sedema wê hindê ku partîyên dî yê Kurdî – bi giştî 16 partîyê biçûk û siyasî ku her dem di gel hev di pevçûnê da bûn – gel hev yekêtîyek saz biken û dû piştîvanek biyanî bikevin. Evan di Oktobera 2011 da, Encûmena Niştimanî ya Kurdî (KNC) di bin siya KDP bi serokatîya Barzanî saz kirin. Gelek partîyê ev komê, ciqê vejetîyayî ji Partîya Demokrat Kurdistana Sûriyeyî, anku yekimîn partîya Kurdi di Sûriyeyê da bûn ku di sala 1957 da hatibû saz kirin.¹²

Cudayîya endamên KNC ê bûye sedema alozîyê xwemalî yê çendlî di nav da. Aliyêv ev Komê piştîvan, îdeolojî û bingehê piştgirîyê yên cuda hene. Niha du partîyê bibandor di nava ev komê da ji pêwendîyê xwe gel partîyê Eraqî mifa werdigrin: Partîya Demokrat a Kurdî li Sûriyeyê (PDKS), bi serokatîya Abdilhekim Beşar, ku

⁹ Cinderêş ku hinek caran di Kurdî da Cindêris tê gotin û bi giştî bin destê Efrînê daye. Binêrin Bashdar Pusho Ismael, “Bîxêr bêñ bo heremê Kurdistana Sûriyeyê”, *cîhana Kurdan*, 24 Temûza 2012.

¹⁰ Hinek kes li ser ev mijarê bi şibhe ne ku gotinê PYD ê li ser “Rizgar kirina” ev bajarane rast bî. Abdûlhakim Beşar, serokê Partîya Demokrata Kurdistana Sûriyeyê (Birayê Partîya Demokrata Kurdistana Eraqê bi serokatîya Barzanî), di dawîya Temûza 2012 da got, “Rizgar kirin bi wateya paqî kirina bajarî Kurda ji hêzên Sûriyeyî û bi yekcari nêhêlan vegerîna wane. Lê niha, hêzê ewlehî yê Sûriyeyî di hemî rojavayê Kurdistanê [Sûriyeyê], bi taybet di bajarê ku bi nav rizgar bûn da hene. Raste ku ala partiek taybet li ser saziya hatîye danan, lê eger dewlet bixwaze dikare wan ji bajar bêxe der. Kontrola saziya niha ji di bin destê dewleta Sûriyeyî da ye. Ev bi sanahî makîneyê xwe çîbiçî diken. Lima dikarin bêjin ci bajarê Kurdan [nehatine rizgar kirin]”. Hêvidar Ahmed, “Serokê KNC: Kurdê Sûriyeyî ji kiryarê PYD ê bêhêvî bûne”, *Rûdaw*, 1 Tebaxa 2012 a. Tevî ku hêzên dewletê di hinek bajarê Kurdan da li ser textê xwe manê lê vegerîna dewletê pê bikar anîna zorê evjî di demekê ku di heremê di da bi şidet hember şorişa şer dike, cihl şibhê mezine.

¹¹ Today's Zaman, 26 ê Temûza 2012 a.

¹² Gelek partîyê ev komê, PaşGulanaîyê Partîya Demokrata Kurdistana Sûriyeyê ne; ku komek ji partîyê vejetîyayî, zeliqandî û cuda bûyî ji dema damezirandian ev partîyê di sala 1957 da bûye û liber vê zelal nîne ku kîjan çêgirê rewâ yê wê ye. Abdûlhakim Beşar, Abdûlhemid Derwêş û gelek serokê partîyê di wisa idia diken. Binêrin ji “Dijberê Kurdên Sûriyeyê kê ne? geş bûna komê Kurdî, 1956-2011”, KurdWatch, rapora 8 ê, Kanûna 2011a, rûpela. 25.

birayê partîya KDPê ya Barzanîye; û yan dî Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê, (ku niha paş ve emê jê re bêjin Partîya Pêşverû), bi serokatîya Abdûlhemîd Derwîş, ku birayê Yeketî Niştîmanî Kurdistan (PUK) ya celal Talibanî ye.¹³ Dijberîyê herdemî di nava KDP û PUK xwe wek dijberîya nava PDKS û Pêşverû nîşa daye, ev dijberîye gel dijberî yê dî di bîn sîwan a KNC ê da didomê.

Têkoşîn ji bo aştiya PYD û KNC saz bûne. Di 11ê Temûza 2012 a, hevdem gel kêmek mayî ku dewleta Sûriyeyî ji bajarê Kurdan paşve bikişîne, Barzanî li ser astî dana wan li ser parvekirina desthilatê xebitî. Ev lihev kirin ku bi navê “Peymana Hewlîrê”, tê nasîn, armanca vê ev bû ku ev du partî di dema derbas bûnê da hevpar hikometdarîya heremê Kurdî bikin û Desteya Kurdî ya Bilind (SKC) saz bikin.

Ev peymane bo sedema şokê bo Enqere, ji ber kû Tirkûye bi çavê hevalekî ji Barzanî dinêrî ku dibe PYD ê ji meydanê bêxe der, ne kesek kû, peymanê gel girêbide.¹⁴ Ji sala 2007 ê, nêzikatîyê abûrî di nava Kurdistanî Eraqê gel Tirkîyê bo sedema pêwendîyê zorbihêz di navbera Enqere û Hewlîrê.¹⁵ Pêwendîyê bîhêz di navbera Barzanî û Tirkîyê bo sedema têkil bûna wî di pisgirêka Kurdên Sûriyeyî da. Gelek sala, Tirka Barzanî xistibû bi zora xwe ji bo ku dijberî PKKê di Qendîlê da bixebite. Ji paş sala 2011 a ji her ev kiryare hember PYD ê jê hêvî dikir pê vê hoyê ku, tenê berjewendîyê wî di demek da têbî dest anîn ku di Sûriyeyê da bandora dijberî partîya birayê xwe kêm bike û rola xwe di rewşa siyasîya Sûriyeyê da xurttir bike. Li ser vê esasê dewleta Tirka gihiştê vê encamê ku sîrîşa pan-Kurdî ya PKKê ne tenê desthilatdarîya Barzanî we serikê hikometa Kurdistanî Eraqê ji ber metirsêyê dêxîne belke herwisa dibe sedema han dana dilheziyê gengaz yê pan-Kurdî yê wî.

Peymana Hewlîrê pragmatîs bûna Barzanî xiste berçav û ev mijare bîhêz bûna PYD û metirsîyê çekdarî û siyasî di navbera PYDê û KNCê da dupat diket. Ji ber ku bîrhatîyê şerr ê birakûjî di navbera PUK û KDP di sala 1990 a, niha ji di mîjkê gişt Kurdên Rojhilata Navîn da may, şerr ê birakûjî gelekî bal Kurdan gelekî bi nefrete. Pevçûnê xwemalî di navbera Kurdistanî Sûriyeyê da herwisa gengaziya şer ê di navbera PKKê ş KDP ê di başûrê Eraqê da ji dêxe berçav.¹⁶

Hevdem, Barzanî hinek pêngav bû bîhêz kirina hevalê xwe havêtin. Wî di sala 2012 da got ku KRG di kempê Kurdistanî Eraqê da dest bi perwerde kirina Kurdên veqetîyayî ji artêşa Sûrî kirîye.¹⁷ Wî paşa zelal kir:

¹³ Ji bo xwandina dîroka giştî ya partîyen Kurdistanî Sûriyeyî binêrin ibid ê.

¹⁴ Cêgirê AKP û ravêjkarê serokwezîre Tirkîyê got, “ev têkoşîne ci caran balkêşîya pêwendîyê gel Tirkîyê çînîne...saz kirina çîhek nû bo rûniştin û zêdekirina bandora PKKê tiştek tîne ku bête qebûl kirin”. Yalçın Akdoğan, “Yeni Kandil’lere izin verile-mez” [“iznek nû ji Qendîlê re nayê dan”], *Star*, 27ê Temûza 2012 an.

¹⁵ Rapora hejmara 18 ê ya Koma Qeyranê ya Rojhilata Navîn, Tirkiye û Kurdistanî Eraqê: Dijberî yan Alîkarî, 13ê Novembera 2008 an.

¹⁶ Pevçûnê wisa li ser Eraqê ji bndor hene, ji ber ku gelek gengaze PKK bersiva KRG ê hember PYD ê bide. Hêjayî bas kirinê ye ku di pevçûnê di navbera Îran û PJAK (Partîya Jîyana Azada Kurdistanî) di sala 2007 an da jî kêşa nava Eraqê. Îranê di bersiva kuştina du serbazê xwe, êris kir ser Kurdistanî Eraqê. Ev pevçûne zêdetir ji mehekê dirêjî hebû. Û PUK jî têkil bû û 200 serbaz şandin ku dij bi PJAKê di bajarê Silêmanîye da bi şerr bêñ. Binêrin ji “Rrt Hewlîr: Pevçûnê PUKê û PJAKê di Silêmanîye da”, dosiyeyê balyozxana DYB di Bexdayê da., 19ê Îlona 2007an, ku ji alîyê Wîkî-Lîks ve bilav bûye.

¹⁷ Binêrin ji Can Arif, “Kurdîn Eraqî birayê xwe yê Sûrî perwerde diken”, EL Cezîre, 23 Temûza 2012.

Nêzî 10,000 heta 15,000 penaberê Kurdên Sûriyeyî hatine Kurdistanê. Gelek ji wan ciwanin. Raste ku hinek ji wan perwerde bûne lê ne bo êriş birinê belki ji bo parastinê perwerde bûne. Heremê ku ev tê da dijîn çi pergalê parastinê tine û dibî ev bikarin ber ji aloziya bigrin.¹⁸

Yek ji kesê hatî perwerde kirî got:

Di dema ku perwerde destpê kir, programê cuda ji mere dabîn kiri bûn, perwerdeyê serekî taybetî servana û herwiha perwede kirina efsera bû. Ev kiryare bin destê Azîz Weysî ,serokê hêzê Zerevanî yê da bû, [hêzên nîv-çekdar wek jendirmân ku girêdayî KDPê ne].¹⁹ bi giştî hemî kesên ku besdarî kempû perwerdeyê dibin ciwanenê Kurd yê Sûriyeyî ne. ku bo revîn ji serbaziyê yan bi sedema bêşolîyê ji Sûriyeyê revîne. Hinek dî jî bi bawerin ku ev kiryare rîyek bo alîkarî dan ji gelê Kurd û pêvçûn gel rejîmê ye.²⁰

Ev hêzane ku hejmara wan di ev demê da nêzî 650 kes bû û di Oktobera 2012 a da nêzî 1,200 kesa bûn,²¹ gengaze ji bû dijberîya YPG ê – hêzên çekdar yê PYD ê hatibine perwerde kîrin. Di rastiyê da, hatîye rapor kîrin ku hêzên wan ji ber dijberiyê ku gel YPG ê hebûn û ji ber ku kontrola sinorê Sûriyeyê ji destê wan daye, bo çûna nav Sûriyê rastî astengîya hatine.²²

Hember peymana Hewlîrê gengazîya dijberiyê di navbera PYD û KNC kêm bû lê tine nebû. PYD heta îro, û bi taybet bi piştgirîya hêzê xwe yê çekdar û bingehêk xwe yabihêz di nava Kurdên Sûriyeyî da, bi giştî bi tenê xebatê xwe domandine, û hem ji hêla siyasi û hem ji hêla çekdarî desthilatdarîya Kurdistana Sûriyeyî di bin destê xwe da hêlaye; kîmasîya serekî ya wê girêdanê vê gel PKK ê ye ku hem gel Barzanî û bi taybet gel Tirkîyê dijminaî heye. Di hember da, KNC e ku niha jî hevpeymanek bilav e, nikarî wek sazîyek yekparce kiryarek bibandor bike. Lî heta niha, bi piştgirîyê siyasi û malî yê derve serpê maye. Li ser vê esasê, pevçûnê Kurdan di Sûriyeyê da hember yek bi kurtî bi menaya dijberîya partîyek bihêz hember hevpeymanen bêhêz di hember da hevpeymanek bêhêz gel hevpeymanek bihêz.

¹⁸ Hevpeyvîn gel Serok Mesûd Barzanî, *Esasa pêwendiyê navnetewyi*, 27ê Îlona 2012 an.

¹⁹ Bo zanyarîyê zêdetir li ser hêzên ewlehîyê Kurd, Binêrin ji Rapora hejmara 103 ya Koma Qeyranê, Rojhilata Navîn, *Eraq û Kurd: Dijber li gel Tirsa Paşvçûnê*, 28 Adara 2011, Beşa IV.

²⁰ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Serbazek Kurdê Sûriyeyî Ku Artêşa Sûriyeyî bi cî hêlaye û besdarî kempê Perwerd kîrin bûye, Hewlîr, 3ê Oktobera 2012 an.

²¹ Ibid.

²² Binêrin ji Roj Ahmed, “Nêrînek taybet li ser hêzên çekdarê Kurd di Sûriyeyê da”, *Rudaw*, 5ê Tabaxa 2012 an.

II. Ji serhildana welatên Ereb heta derfeta Kurdan

Nêzî ji sedî 10 ji 23 milyonî xelkê Sûriyeyî netewa Kurdistan,²³ ku bi giştî di heremê Hesekê di bakûr rojhilat da û pişkek mezin jî di nêzî sinorê Tirka heta Efrînê di bakûrê rojava, û herwisa di bajarê Heleb û Şam û çend bajarê biçûk wek Qûnîtira da dijîn û bilav bûne. Zêdetir ji bilav bûna cografi, her wek gelek Kurdan di giş Rojhilata Navîn da ji hêla sîyasî jî firqe firqe ne û her ev mijare bûye sedema peyda bûn partîyê cuda di nava wan da ku amadene gel hêzên dijberê heremî lihev bikin. Ji dema destpê kirina serhildana Sûrî di sala 2011, guhertinê balkêş di pêşeroja sîyasî ya Kurdan da ji ber encamê xebatên wane yê nû ne ku dixwazin xwe wek lîstekvanêni sîyasî yê balkeş bidin nas kirin, xebatek ku gel gelek astengîya hembere.

A. Komara Erebî ya Sûriyeyî û Kurd

Pêwendîyê di navbera Kurdan û dewleta Sûriyeyê her pêş ku rejîma niha bi partîya Beesî di sala 1963 desthilatdarîyê bi det bîne jî bi aloz bû. Di sala 1962, berpirsan pê bikar anîna daneyê serjimêriya herema El-Cizîrê (Herema di navbera çemê Dicle û Fîrat da) di bakûrê rojhilat da nêzî 120,000 Kurd ji mafê hevwelatîyê veqetandin, pê vê hecetê ku ev kesene koçberê nezagomî ne û ji alîyê Tirkîyê vê hatine.²⁴ Îro rojê hejmara ev Kurdên bê welat û zarokê wan gihiştiye nêzî 300,000, kes anku ji sedî 15 ji du milyon Kurdên ev welatiye.²⁵ ev di rewşek valahîya zagonî da dijîn, bêpar ji mafê xwe yê balkêş dijîn, mafê wek: Geşt di nav yan derveyê Sûriyeyê (ku pêdivî bi pasaport û nasnamê heye); hebûn malê; zewicîn bi rewşek zagonî; bi karanîna alîkarîyê xwarinê to; beşdar bûn di helbijartina da; û hebûna şola fermî (çi wek karmendê dewletê û çi wek nûnerê hatî bijartin). Tevî ku kesayetî ya hinek ji wan wek kesê biyanî (*ecanêb*), hatîye tomar kirin, lê gelek ji wan bi giştî nedîti hatine hesibandi. Ji kesê wisa re dibêjin “kesayetîya wan nehatîye tomar kiri” (*mektûmîn*, anku: kesen nehînî). Hember texmînekê di sala 2008 a da di Sûriyeyê da 154,000 ecanib û 160,000 mektûmîn dijîn.²⁶

Mafê zimannasî yê ji bi salane ku ji Kurda hatîye standin. Destûrkê di sala 1958 a bilav kirina gotina bi zimanê Kurdî qedexe kir, heyâ dibistanê şexsî jî nikarin ev

²³ Rapora hejmara 108a Koma Kirîzê, Rojhilata Navîn, *Serhildanê Gel di Bakûrê Afîrêkayê û Rojhilata Navîn (VI): Serhildana Gelê Sûriyeyê pê zivirînek hêdî*, 6ê Temûza 2011 an, r. 20.

²⁴ Hemberî Rêxistina Mafê Mirovan, “[i] di sala 1962, serhejmîrîyek taybet bo sedema veqetîna 120,000 Kurdên Sûriyeyê – ji sedî 20 ji Kurdên Sûriyeyê – ji mafê hevwelatî di Sûriyeyê da. Ev serhejmariya taybet ji her alîyekê bi rewşek Birayê malbatekê ku di gûndek Sûriyeyê da hatibûne dinê bi rewşek cuda dihatin dabeşkirin. Bav dibûne kesê biyanî tevî ku zarokê wan hevwelatî dibûn. Hejmara Kurdên bê welat bi derbas bûna demê zêde dibû, sedema vê yekê jî xwedî zarok hebûna ev kesa bû kû di sala 1962 yan da bibûne bê welat ; di encamê da, niha hejmara wan 300,000 kes tê texmîn lêdan”. “Sûriye: Kurdên Bêdeng Kirî”, Oktobera 1996 an. Dewletê kiryara xwe wisa mafdar dikir ku gelek ev Kurdanê ji welatê ciran bi taybet ji Tirkîyê ketine nav a welat. Paş helweşandina serhildana 1925 an dij bi komara neteweperestîya ji nû sazkirî ya Kemal Atatürk, gelek Kurdên Tirkîyê ji ber metirsîya serkut kirin ji Sûriyeyê re hilatin. Bo zanîna zêde li ser the serhildanê, Binêrinji <http://carnegie.org/fileadmin/Media/Publications/PDF/Tirkîyê's%20Kurdish%20Question.pdf>. Serhejmariya sala 1962 yan û encama vê wek xebatek giştî bo berî girtin ji rûniştina komê ne-Ereb di ev welatî da bû, û di rastiyê da ji destpêkê bo sedema piştivanî ji xwedî zevîyê mezin. Jemal Barût, “Kaifa naşa’at muşkilat ’ağanib Turkiyâ< fi Sûriya?”, *Le Mond diplomatik – Rûnivîsa Erebî*, Tabaxa 2009 an; “Kurdên bê welat di Sûriyeyê da: Penaberê nazagonî yan kûştiyê sîyaseta neteweperest?”, KurdWatch, rapora 5, r. 6.

²⁵ Ji ber nebûna hejmarê dupat kirî, hejmara du milyon wek texmînek hatîye pejirandin.

²⁶ KurdWatch, rapora 5, herev., rr. 6-9.

zimanî perwerde bikin. Rejîmê navê bajar û gûnda ji Kurdî bi Erebî veguherrandîye, bo mînak navê bajarê Kobanî kirîye Eyn al-Erab.²⁷ Di sala 2008 a da dewletê mafê milkîye û kirêñ û firtina erdî di heremê bersinor jî ji Kurdan stand û ev ji ser listeya dirêj ya qedexeyîyê Kurdan zêde kir û pê ev qedexe kirin bo sedema vê hindê ku Kurdên hevwelatî ji nekaribin xwedî milkîyeta xwe bin.²⁸

Rewşa Kurdan di dema desthilatdarîya Hafêz Esad û Beşar Esad da neguherî. Teví ku Beşar Esed kemasiyê zagoan sala 1962 dupat kirin bû lê bi sala hevveletî bûna ecanib yan mektûmîna qebûl nekir.²⁹ Herwek Koma Kirîzê (qeyran) pêstir bas kiribû Kurd di vê babetê da rastî gelek astengîya hatin û hermem berpirsa bi rewsek berçav û eşkere çavê xwe li ser rewşa bakûrê rojhilatê Sûriyeyê girê didan, heremek ku ji alîyê kanîyê sirîstî gelek dewlemende, lê wisa dihat temasayı kirin ku wek çêla şîr ya dewletê xûya dikir.³⁰

Dema ku serhildana sala 2011 destpê kir Kûrdên Sûriyeyî di besdar bûna xwe da bi guman bûn. Teví ku ev ji dewletê nerazî bûn, lê bîrhatîyê qir kirina hovane ya dewletê di sala 2004 a di Qamişloyê da³¹ û her wisa berteka dilkevir ya xelkê na-Kurd – ku herdem li ser hestê cudaxwazîyê Kurdan bi gumanin – di mîjîyê Kurdan da mabû. Yek ji xebatkarê ciwanin wisa dibêje: “Di destpêkê da tirsek yecar zor di meydana da xûya dikir. Û di destpêkê da partîyê siyasi yê me izna besdar bûnê ji mere nedidan. Paşa, tırsa me xwe ji hebû ku xelkê di bi çavê ‘cudaxwaza’ [infisaliyûn] temaseyî me dikirin. Me dizanî ku dewlet ji her wek bûyerê 2004 yê Qamişloyê dixwazê ev navî li ser ma danê”.³²

²⁷ Hember gotinê Rêexistina Mafê Mirovan, dewletê di salê 1970 yan da dest bi bijartina navê Erebî bo bajar û gûndê Kurdan di Heremê Hesekê û Kurd daqê di nêzî Efrînê da kir, binêrin ji www.hrw.org/raporas/1996/10/01/Sûriyeyê-silenced-kurds. Bo nêrînek giştî li ser rewşa Kurd di Sûriyeyâ da, Binêrin ji Dêyvîd MekDowal, *Diroka Kurdan ya Rojê* (Lenden and New Yûrk, 2004), rr. 466-484; û Jordî Tejel, *Kurdên Sûriyeyê: Dirok, Siyaset û Civak* (Lenden, 2009).

²⁸ Binêrin ji “Destûra 49ê: Ji mal derêexistina xelkê Kurd? Nêrînek li ser encamê siyasi û abûriyê destûrekê”, KurdWatch, rapora 6. di Ilona 2008an, Destûra 49 ê kirîn, firotin û kêt girtina erdî di heremê bir bi sinor da dijwar kir. Partîyê Kurdi xebatê dewletê ji bo Ereb kirina (teerîb) bajarê Kurdan, sermezar kirin. Teví ku ev destûrê heremê Ereba yê Hawran, nêzî sinorê Urdinê jî xistine bin bandor xwe, Binêrin ji ibid.

²⁹ Beşar Esed di axavtinekê da di sala 2007 bi berçavî şâsiyê serhejmarîya 1962 yan da ûlan kir û di navbera ecanib û mektûmîna cudahî dana, û got pirsgirêka ecaniba tene di demekê da gengazê ku rewşa mektûmîna bête çareser kirin. Hevwelat bûna herdu koma dibû sedema zêde bûna hejmara Kurdan li hember Ereban di bajarê Hesekê da. Amude.com, 18 Temûza 2007 an. Bo çareser kirina ev pirsgirêkê heya destpêkirina serhildana di sala 2011 an da ci pêngav nehatin avêtin.

³⁰ Rapora Koma Kirîzê, *Serhildana Gelê Sûriyeyê pê zivirînek hêdî*, herev.

³¹ di Adara 2004 an da, di Listika futbolê di bajarê Qamişloyê ku giringtirin bajarê Kurdî di heremê Kurdî yê Sûriyeyê da ye, di navbera Kurdan û Ereban pevçûn çêbû. Temâşavanê Kurd ala xwe ya netewî bilind kirin û ji bo Serokkomarê DYA yê, Gorg W. Bûş, ku di sala 2004 an da êris bir ser Eraqê durişmê piştgirîyê dan. Ev serhildane berferh bû di nava sê rojan da giş bajarê Qamişloyê girt. Xwepêsendera navena hermî ya partîya Bees şewîtandin û peykera Hafiz Esed hiweşandin; di bersiv da, Artişê bi hezaran serbazê xwe ji Qamişloyê re şandin, û bi hovene serhildan serkut kirin ku bo sedema kuştina herikêm 30 kesa û birîndar bûna 160 kesî û girtina 2000 kurdan, Hemberî “Sûriye: bila zexta li ser Kurdan bi dawî bê”, Rêexistina Mafê Mirovan, 26ê Novembera 2009 an. Bo nêrînek giştî, Binêrin ji Julie Gauthier, “Les événements de Qamichlo: Irruption de la question kurde en Syrie?”, *Études kurdes 8: Errance et terre promise. Juifs, Kurdes, Assyro-Chaldéens* (2005), rr. 97-114; Robert Lowe, “Kurdên Sûriyeyê: Vedîta gelekê”, Programa Rojhilata Navîn, Çatham House nîvîsa rûniştina têgehînê (2006), rr. 1-8; û “Serhildana Qamişlo: destpê kirina rojênu ji Kurdên Sûriyeyê re?”, KurdWatch, rapora 4.

³² Hevpeyivîna Koma Qeyranê, xebatkarek Kurdê Sûriyeyê, Hewlêr, 7ê Oktobera 2012 an.

Berteka her bajarekê gel yê di cuda bû. Bo mînak, di Amûda da koma ciwanê heremî beşdarî şorresê bû û serpêhatiyê xebatkarê ciwan yê ku di sala 2004 an da bi dest anî bûn, bi kar anîn, di heremê di da ku parti yê siyasî yê Kurdan dihêz bûn, serokê ev partîya ji qirkirina hovane ditirsîyan û hestê serhildane bi taybet di bajarê Qamişloyê da, kontrok.³³

Rejîmê ji ber ku nedixwast hêzê xwe yê balkeş di bakûrê rojhilatê da xerc bike ji ber vê dixwast berî ji aloziya ev heremê bigre û herwisa dixwast sehildana dijbera wek serhildanek firqeyî ya Erebê Sûnî bide nas kirin û razî bûna netewê di biparêze. Û di encamê da, gel aloziyê heremê Kurdan bi nisbet hertemê dî bi hişyari bertek da û bi lez gel Kurda pêwendîyê siyasî girê da.³⁴

Di nîsana 2011 an, paş ku serhildanê dij rejîmê di giş bajarê Erebî da çê bû. Rejîmê mafê hevwelatîyê ji çend hizar kurdê herema Hesekê re dabîn kir.³⁵

Mebesta nehînî ji pêşkêş kirina ev mafî, razî kirina ev kesa û berî girtin ji serhildana Kurdan hemberî rejîmê bû. Zelal tine ku ev taktîke bibandore yan ne. hinek Kurd bi bawerin ku ev kiryare bes tine, lê hesta wan wisa bû ku eger dij dewletê nexebitin, gengaze di pêşerojê da mafê zêdetir bidest bînin.³⁶ Hinek kesê dî gel ev kiryarê dijberin. Yek ji xebatkarê ciwan xelkê Qamişloyê ku di sala 2011 a da hevwelatî bûn bi dest anî bû, belgeya nasnama xwe ya Sûriyeyî ji Koma Kirîzaê re nîşa da û got, “Dema sala borî min ev belgeye girt, her ev rojê beşdarî xwepêşandana bûm”.³⁷ Herwisa Rejîmê çend girtîyê siyasî yê Kurd di Oktobera 2011 a da hember lihev kirina xwe gelPYD ê serbest berdan. Ev stiratijiye herîkêm heta qasekê serketî bû, her wek yek ji kesê ku pêwendîyê baş gel PYDê heye, di destpêka sala 2012 da wisa axivî:

Niha rejîm lawaz bûye, ji ber wê em dikarin mafê taybet bi Kurdan bi dest bînin, her wek me di mijara hevwelatî yê da dît. Sûriyeyê pêştir Kurd ji bo serbazîyê ban dikirin û ji wan re belgeua hevwelatîyê dide lê paş bi dawî hatina serbazîya wan belge jê distand. Seks bê hevwelatî nikare bi zaginî bizewice. Nikar mal, makîneyan tiştê di bikirin.di destpêkê da PYD ê ji endamê xwe xwast ku beşdarî xwepêşandana nebin, ji ber wê rolek mezin di bêdengîya heremê Kurdan da hebû û her ev mijare bû sedema pêşkêş kirina hevwelatîyê ji Kurdan re. zêdetir ji vê, 3 meh pêş, giş girtîyê PYD ê ji girtîgehê Sûriyeyê serbest hatin berdan.³⁸

³³ Ev xebatkare ku endaml Komîteyê Ciwanan di Amûdayê daye got, “Amûdayê da, di nava giş kesan da em di Sûriyeyê da yekim kes bûn ku paş Dera [cihê ku serhildan di Adara 2011 an da livê da destpê kir] yê me xwepêşandan bi rêtixtin kir. Em bû yekim car di 29 Adarê da derketin kolana. Me dixwast em, wek bajarên dî yê Sûrî gel serhildanê hevrê bin, herdu ala yê Kurd û Sûriyê di destê me da bûn û durişmê me ji bi herdu zimana bûn. Me di xwepêşandane ïna heyâ gel bajarê Kafr Nubil ku bajarek – [Erebe] û ji ber durişmê xwe yê rindik binav bû, berberî dikir – li ser ku posterê kijan me rindiktirn. We me ji bûyerê 2004, yê Qamişloyê serpêhatî girtibûn, û ev carê xelkê zêde ketin nava kolana, ji ber ku hêvîyê zêde hebûn”. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Hewlêr, 9ê Oktobera 2012 an.

³⁴ Binêrin ji rapora Koma Kirîzê, Serhildana Gelê Sûriyeyê pê zivirrînek hêdî, herev., 6ê Temûza 2011 an.

³⁵ BBC, 7ê Nîsana 2011 an. Destûra 49 (Nîsana 2011an) ji ecanibê hatî tomar kirî yan bê welat re hevwelatîyê pêşkêş dike lê Mektûmînan nabîne.

³⁶ Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Hewlêr, Kanûna duyema 2012 an. Kurdek dî yê bê welat, ku di kempa Domîz di herema Kurdistana Eraqê da bibû penaber îdia dikir ku rejîmê gelek dereng dest bê “pêşkêş kirina” hewwelatîyê ji Kurdan re kirîye û kiryare li ber fişare kirîye ne ji ber dilêxwe bo “zivirrîna mafê wan” ji wan re. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Domîz, 7ê Cotmeha 2012 an.

³⁷ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Xebatkarek Kurdê Sûrî, Hewlêr, 6ê Oktobera 2012 an.

³⁸ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Kurdistana Eraqê, 7ê Kanûna duyema 2012 an.

B. Tevgerê Heremî

Di berteka serhildana di hemî heremê welat, tevgerê kêm dijî rejîmê ji alî Kurdan ve birê vê çûn, ku di esasa wan da komê ciwanan ku pêş da hebûn yan wek “Yekîtiya Hevrêziyên Heremî” (LCC) ji nû da saz bibûn, cih digirtin.³⁹ Xebatkarê ciwan pê bikar anîna Facebookê û medîyayê dî yê civakî dest bi rêxistina xwe dikirin. Herwek yek ji wan dêjî:

Di destpêkê da me di, Amûda da, biryar girt ku em koman saz bikin tenê ji ber ku em xwepêşandanê xwe bi rêxistin bikin, paşa Amûda dora Res el-eyn [Serê Kanîyê di Kurdî da] û Dêrikî gihiştê. Di dawîya 2011a da, giş Yekîtiya Hevrêziyên yê Kurd di Yekîtiya Hevrêziyên Ciwanên. Di sala 2012 a, veqetînek saz bû, û neh komê ji hevpeymanîyek yek di bi navê Yeketîya Avahî da cih girtin.⁴⁰

Durişmê ev xebatkarane her wek durişmê bajarê dîye, ewan jî dixwast ku “dewlet hilweşit” (isqat el-nizam). Ev xebatkarane bi giştî, ermanca xwe ya hevpar gel besê dî yê civakê nîşa dian. Rojnamevanek Sûriyeyî dupat dike: “Dema ku em di Hema yê da durişmekê dibihîsin, rojek paşê her ev duriş di Qamişlo yê da dihatbihîstin. Dijbera [Yekîtiya Hevrêziyên Ciwanên Kurd (LCC)] û dema ku dewletê di Homs û Hema yê da êriş dibirn ser xwepêşandana, LCC yê Kurd dixebeitî ku peyama hevxemî ya xwe nîşanî xelkê ev herema bidin”.⁴¹ Xwepêşandan ku bi giştî di rojê ïnê da birêve diçû, gel tevgera serhildanê di giş welat da ku paş nîvîja dawîya hefteyê wek xala destpêkê bo kom bûnê bikar dînan, wekyek bû, tevî ku gelek Kurdên sekular ditirsîyan ku di Şamê da rejîmek islamî bibîte desthilat dar.

LCC yê Kurdî her di destpêkê da rastî dijberîya partîyê sîyasî yê Kurdî bûn ku hez nedikirin beşdarî xwepêşandanê hember rejîmê bin. Xebatkare kurd dibêjî:

Partîyên Sîyasî xelê ji xwepêşandanê dilsar dikirin. Gelek hêcet ser vê mijarê hebûn. Hineka bawerî bi hilweşana serhildanê hebû. Herwisa dilnigeranîya wan ev bû ku ciwanin tevgerek dij bi partîyê kevin saz bike. Û gelek kesan jî dixwastin ku gel dewletê hevpeyivîn saz biken. Xebat karê serbixwe xwepêşandan saz dikirin û gelek ciwana biryar girt ku partîya bi cî bêhlin.⁴²

Zêdetir ji vê, ji ber ku xwepêşandana LCC ya li ser helweşana rejîmê bû û ci tevgerê sîyasî alîkarîya wan nedikir, ev komene rastî êrişâ PYDê hatin, ji ber ku ev partîyê tepisandina xwepêşandanê di heremê Kurdistanê da wek pişkek ji xebatê kontrol kirinê dizanî.⁴³ Di encamê da, gelek LCC ku di Qamişlo yan Amûdê da bûn ji ber ku di pêşiyê da PYD di ev bajarane da bû, bêhêztirîn komê LCC yê bûn.

³⁹ Ev Komene ji, Tevgera Ciwanên Kurd, Yekîtiya Lihav kirina Ciwanên Kurd û Yekîtiya Ciwanên Kurd, pêk hatibûn.

⁴⁰ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Xebatkarek Kurdê Sûrî, Hewlêr, 9ê Oktobera 2012 an. Hemberî gotinê Abdulselam Osman, damezrênerê Yekîtiya Hevrêziyên Ciwanên Kurd di Kanûna 2012 an da, giringirîn komên hevrêziyên ev komene bûn; koma wî, Avahî, Ciwanên Jidayikbûna Azadiyê, Tevgera Ciwanên Şoreşê yê Kurd, Tevgera Ciwanên Kurd û Sewa. Bo zanînê zêde Binêrinji www.kurdwatch.org/Sûriyeyê_article.php?aid=2719&z=en&cure=240.

⁴¹ Hevpeyivîna telefonî ya Koma Qeyranê, Adib Abdulmajid, 1 Şubata 2012 an.

⁴² Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Xebatkarek Kurdê Sûrî, Hewlêr, 9ê Oktobera 2012 an.

⁴³ KurdWatch hinek ji bûyerê ku hember rapora, endamê PYD û alîgirê wan, êrişî ciwananê dijberî rejîmê kirine, yan gef li wan xwarîye û yan revandine, tomar kirine. Li gor ev raporane di 7ê Ilona 2012 an, PYDê sê çalakvan li Amûdê girtin û paşa êriş pê dar û keviran êriş birine ser xwepêşandanê ku dixwastin wan rizgar biken; di 29ê Hizérana 2012 an, endamê PYD di Eyn el-Erab û Efrin êrişî

Terora Meşal Temo damezrînerê Tevgera Pêşerojê, ku partîyek bîçûk ya Kurdê Sûriyeyî bû û bi tundi gel dewletê dijber bû û girêdanê nêz di gel xebatkarê ciwan hebû, di 7ê Oktobera 2011 a da, bû sedema xwepêşandana herî mezin heta îro di ev herema da. Temo yek ji ev siyastevanê Kurd bû ku di xwepêşandanê dij rejîmê da besdar dibû û daxwaz hilweşana rejîmê dikir, û herwiha besdarî Encûmena Netewî ya Sûryeyê (SNC) bû, anku hevpeymanîyek ku ji komên dijber û bi taybet Ereb saz bibû. Ev ji alîyê kesê ku cilê sivîl li ber da bûn hat kuştin û di demekê da ev bûyer qewimî ku ew besdarî civînek siyasî di malekek şexsî di Qamişloyê da besdar bibû. Wek berçav ev bûyeriye ji alî dewletê we hat qewimîn, lê di wê mijarê da gumanê mezin li ser têkilîya PYD ê bi vê kiryarê jî.⁴⁴ Tevî ku LCC yê Kurd idia diken ku di giş ïnê paş terorê nêzî 10,000-15,000 xwepêşander ketine kolanê Qamişloyê lê çi dosye bo dubat kirina ev gotinê tine. Vîdyo yê YouTube ê ku dupat kirina wan jî pir zehmete, bi giştî hejmara xwepêşndera 1000 kes nîşa diden.⁴⁵

Cudayî wan ida ya ne, xwepêşandana ku terora Temo bû sedema vê, nedomî. Ji ber ku komê ciwanê Kurd di bin fişara da bûn heta ku di nava serhildana Sûrî û herwiha di nava siyaseta Kurdan da bêcîh bimîne. Sedema ev pirsgirêkê ev bû ku ev komene ji ber zêde bûna dijberiyê nava Kurdan – ku bi giştî ji alîyê partîyê siyasî, û herwisa bi hoyâ astengîyê zêdê di lihev kirina gel komê mixalifû na – Kurdî di cihê dî da zêdetir dibû- û herwisali ser vê hindê ku ewan neşeya ev xwepêşandana giştî bêxne nava pêvajoyek siyasî ya zelal, qerimîn. Li ser gotina yek ji xebatkara:

Komê ciwanê Kurd roji bi roj tûşî veqetînê bûn. Me di destpêkê da dixwast em gel komîteyên ciwanan di heremê dî yê welat da lihev bikin, lê ev kiryare herdem dijwartir bû. Ji Qamişloyê heya Şamê pê makîneya nêzî 9 demjimîrka rîye. Partîyê siyasî jî xebitîn ku hinek ji komîteyê ciwana nêzî xwe bikin. Ewan di destpêkê da ji ev koma re çek û dirav didan. Ji ber vê veqetînê di nava xelkê da zêde bûn.⁴⁶

xwepêşandana kirin; û di 12ê Temûza 2012 an, alîgîrl PYDê êrîş birin ser çend komê ciwanan di Al-Malikiyah ê da. Binêrin ji www.kurdwatch.org/index.php?cid=245&z=en. PYD ev tawane qebûl nake. Salih muslim hevserokê PYDê ji KurdWatch re got: “We nûçeyek belav kir, tê de PYD bi hin kiryanan tê gunehkarkirin. Em vê yekê qebûl nakin PYDê rêxistîneke siyasî ye. Em zordariya ji ber armancine siyasî û çewisandina mirovan red dikin, em wê riswa dikin PYD kesek nerevandiye û gef li tikesî nexwariye. Ka ji min re kesekî bînin ku dibêje ew ji alîyê PYD ve hatiye revandin an gef lê hatiye xwarin. Yek kesê nişanî min bide ku bêje PYDê ev revandîye û gef lê xwarîye. Ev tenê propaganda ye, ku armanca wê tenê wêneyê PYD û tevgera azadîxwaz a kurdî reş bike. Em vê yekê qebûl nakin”. Li gor KurdWatchê, 8ê Çiriya paşîna 2011an.

⁴⁴ Di 8ê ilona 2011ê de Mişel Temo ji hewildaneke kuştinê filî. Piştî hewildana kuştinê wî ji KurdWatchê re gotibû: “Biryar a rîjîmê ye. Lê teqez kesen nas wê biryare pêk bînin. Çeteyên (şebîh) rîjîmê pir in... Berî niha li Kobanî xortek hatibû revandin, li Serê Kaniyê du kesan lêdan xwar û li Dêrikê[Al-Malikiyah] hewildana revandina kesekî pêk hatibû”. Ji ber ku ev kiryarane heû ji alîyê PYD ê ve pêk hatibûn, gengaze Temo dixwaze balê nikşîne ser rola PYDê di terore xwe di meha Îlonê da. binêre jî: www.kurdwatch.org/index.php?aid=2077&z=en&curc=232. Tevî ku çend rayedarê KNCê û Kurdêna serbixwe yê Sûriyeyê bi şexsîti idia diken ku PYDê Temo kûştîye, lê xelk rejîmê qatil dizane. PYD, Tirkîyê berpirs dizane, lê Lîkolînker ev yekê bawer nakin ji ber kû, Temo yek ji ev Kurdan bû ku besdarî SNC yê bibû û SNC jî di bin destê Tirkîyê da ye. Binêrin ji www.kurdishglobe.net/display-article.html?id=B401BD71512EFC6525D69EA3048CD6F7.

⁴⁵ Bo mînak, Binêrin ji www.youtube.com/watch?v=a_pr-YhoawE; www.youtube.com/watch?v=P5gHLa29m8k; www.youtube.com/watch?v=KmCmG5niuxg; and www.youtube.com/watch?v=pLPefehcnscs.

⁴⁶ Hevpeyîvîna Koma Kirîzê, Xebatkarek Kurdê Sûrî, Hewlêr, 6 Oktobera 2012.

Ya Balkêş eve ku. PYD hiriş dibir ser xwepêşandanê dij bi rejîmê û xwepêşandanê ku ji alî wan vê birêve dicûn, zêdetir bo piştgirî ji PYD ê bûn heyâ dij bi rejîmê. Di dawîya cotmeha 2011 an da paş damezrandna KNCê ji her ev meşe hat domandin û xwepêşandanê wan jî bo xurttir kirina bingeha xwe bû heyâ dij bi rejîmê.

C. Serokatî dikeve dest partîyê sîyasî da

Li kîlega xwepêşandanê ku ji alîyê ciwane we hatibûne birêxistin, xwepêşandanê dî ciyawazîyê taybet bi xwe hebûn û bi şûna yekbûn gel serhildana giştî, nîşanîya proğremê taybet bi wan bû. KNC û PYD durişmê neradikal hember rejîmê bikar dianîn, heyâ dema hestê netewperestîyê Kurdî zêdetir û zelaltir dibûn jî – pirranîya ev durişmane “Ne’ bo Beesê û ‘ne’ bo hêrişa biyanî” bûn.

Bi taybet PYD zêdetir hestê Kurdayetîyê di xwepêşandanê xwe da nîşa dida û ev kiryare pê bi kar anîna nîşanê Kurdî û herwisa îlana piştgirî ji Abdûla Ocelan re serokê PKK ê ku di Tirkîyê da girtîye bi çî dîna. Herwek lê pêşiyê da hat bas kirin, PYD ê kiryarl xwe pê vê hecetê nerm kiribûn ku digotin ev kiryare alfîkarîya Kurdan dike ku ji dewletê mafê xwe bistînin.⁴⁷ KNC jî dibû sedema dilsarîya xwepêşandan dijî dewletê, û di şûna vê da xwastikê vê îlan dikirin ku taybetî bi Kurdan hebû. Yek ji berpirsê fermî yê KNC ê wiha zelal kir:

Di destpêkê da, demaserhildan destpê kir, me nedixwast em gel kesên zêde beşdfar bin ji ber ku eve bizavêke taktékî bû bo berî girtin ji kuştina xelkê. Giş kesê dizanî ku di xwepêşandanê tevgerê Bihara Erebî, Ereira Roja ïnê xwepêşandan dikirin. Lê me Kurdan biryar girt ku em roja Çarşemî yê xwepêşandanê bikin, heyâ ku em xwe ji wan cuda bikin.⁴⁸ Paş damezrandina KNC ê, xelk kêmîtir li ser “helweşana rejîmê” ravesta û zêdetir ser bidest anîna mafê serbixweîyê bo Kurdan û “guherrîna giş pergalê” [taxyîr al-nizam] daxwaz dikirin.⁴⁹

KNC îdaya piştgirî ji têperîna demokratik hebû. Abdilhekîm Beşar, serokê PDKS ê, Birayê partîya KDP ê, got, “KNC daxwaza ‘guherrîna rejîmê’, dike ne ‘helweşana rejîmê’, ji ber ku ‘helweşan’ peyvek bişidete, lê ‘guherîn’ ser têper bûnek demokratik dupat diker. Em ji ciwana re iznê didin ku We let the youth call for ‘helweşana rejîmê’ bixwazin, lê em xwe hez dikin pirsgirêkê bi rewşek dîplomatîk birêve”.⁵⁰ Yek

⁴⁷ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, kesek nêzî PYDê, 7ê kanûna duyema 2012 an. Di hember da, ev partîye bûye sedema parastina Kurdan di hember zextê ku di cihê dî da em dinîmin. kesek nêzî PYDê gotina jér dibêjî: “Em durişma ‘helweşana rejîmê’ bikar naynin, ji ber ku eger em wisa biken, gengaze bûyer Homs û Hema yê di Kurdistanê da ji biqewimin, û berevajî Homs û HeGulanaê, eger di Kurdistanê da qirkirin saz bibe, Birayî Misilman [Ku beşek mezîn ji SNC pêk tîmin] û kesê di, ev yekê nabînin”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, 7 kanûna duyema 2012.

⁴⁸ LCC yan dixwastin bo yekbûn gel xwepêşanderê Erebê Sûrî wek wekhevê xwe di Homs. Hema û Cihê dî Roja ïnê xwepêşandan bikiin. Lê serokê sîyasî yê Kurdan di herdu partîyên PYDê û KNCê biryar girtin ku roja Çarşemî yê xwepêşandanê bikin, heyâ ku xwe ji wan cuda bikin.

⁴⁹ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 31ê Kanûna 2011 an. Fuad Hussein, serokê Karmenê, serokatîya KRG ê, dibêjep, “Dema ku di Sûriyeyê da serhildan destpê kir, me gel birayê xwe anku partîyê Kurden Sûriyeyê rûniştinek saz kir û pilanê stratijiyeke danan. Heke herev demê da wan dest bi xebatê kiri ba, rejîmê tê yekser êrîşî wan kiriba û ew ji cudaxwazîyê re tewanbar kiribana. Lê me xwast ku em xebatê xwe hêdî hêdî dest pê biken; di seretayê da dibî em bizanin ku kesên dî[xwepêşandanê] destpê diken yan na, û paşa me [Kurdan] eger birryara bêşdar bûnê girt, em xebatê xwe bi aştiyane birêve biben û daxwaza guherîna demokratîk ya rejîm biken.”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 14 kanûna duyema 2013.

⁵⁰ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 28ê kanûna duyema 2012 an.

ji endamê di yê KNC ê ev gotine bi rewşek cuda dibêjî: “Wisa nîne ku em naxwazin rejîm helweşit. Em hêvî darin 1,000 car jîlweşit. Lê eger jêrxanê siyasi neguherin, bê ku rejîm bimîne yan here, em Kurd mafekê bidest naynin. Ji ber vê em dixwazin ku rejîm biguherî, ji ber ku ev jêrxanene, fîkrê dewleta zâlim zindî diken”.⁵¹ Bi gotinek dî, bê pêşkêş kirina serbixweyîfek zêdetir ji bo Kurdan, KNC ci bersiva bû çareser kirina pirsgirêka Kurdan di Sûriyeyê da nabînî, ferq naket kû kê desthilatdar bî.

D. Bi serketina PYD ê

Li kêlega siyasetê ferq û cudayîyê hember Kurdan, rejîma Sûrî hinek caran jî dû lihev kirin gel PKK ê û saziyê girêdayî gel vê da çûuy ji bo ku di lîstika hember Tiriyê û Eraqê wan wek Karteke amade bikar bînî. Heya sala 1970 a, bi bawerîya Şamê hebûna Kurdan di bakûrê rojavayê Sûriyê ji hebûn Erebê Sûnî ku bihev re dijîyan baştır bû, û rejîmê Pêwendîyê Erebê Sûnî gel Eraqê ji xwe re metirsîyek ewlehî dizanî. Di navbera Sala 1980 û 1990 da, pêwendîyê Tirkîyê û Sûriyeyê li ser bajarakê Hatay (ku Tirka ev di sala 1939 xisyibû ser axa xwe); pêwendîyê Tirka û Israîl; û birryara 1983 ya Enquerê bo bina kirina bendavek mezin bi navê – Atatürk – li ser Çemê Firat, tam li ser cihê bakûr ku av dihate Sûriyeyê, tûşî alozîyê bû. Di vê demê da ji ber dilgiranîya Serokwezîr Hafiz Ased, bo ku Tirkîye serkanîyê ava welatî wî bêxwe destê xwe, wî jî piştgiriya xwe ji PKKê re zêdetir kir û di axa Sûriyê û ji PKKê re cî.⁵² Tam di sala 1998 a li ber metirsîya kiryarê çekdarî yê Tirka, Sûriyê PKK ji axa xwe xiste der, û ev Partîyê kempê xwe birinê çiyayê Qendîlê di bakûre Kurdistanê.⁵³

Gel geşbûna pêwendîyê di navbera Tirkîyê û Sûriyeyê, pêwendîyê rejîma Sûrî gel PKKê xira bû. Di sala 1999 peymana Adana di navbera Şam û Enquerê, ji hêzê ewlehî yê Sûriyeê daxwaz kir ku endamê PKKê ku di nava welat da mabûn, serkut bike. PKKê di sala 2003ê ya bi nehîn PYD wek çîqa xwe ya siyasi di Sûriyeyê da damezrand; û herwiha pala xwe da xizmê endamê xwe yê Sûriyeyî ku hejmar wan gelek bûn û beşdarî pevçûnê dij bi Tirka dibûn.⁵⁴ Qir kirina hovane ya serhildana Qemîşlîyê di sala 2004 an da, ji alîyê rejîmê berçav dij bi endamê PYDê rû da ji ber ku berpirsê dewletê bi bawer bûn ku wan di serhildanê da rola serokatîyê hebin.⁵⁵

Gel serhildana 2011 an, ew rewşe guherrî. Paş xebatê bê encamê Beşar Esed bo guherrîna rewşê, Tirkîyê pêwendîyê xwe gel Sûriyueyê qut kirin û bû yek ji çalaktirîn piştîvanê.⁵⁶ Di bertyekê da, Beşar Esed rîye di nav kiryarê bavê xwe da bijart, û hem

⁵¹ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlêr, 5ê kanûna duyema 2012 an.

⁵² Binêrin ji Gil Dibner, “dijminê dijminê min: Tirkîye, Israîl, û Rojhilata Navînern hevsengîya hêza”, *Harvard International Review*, 12ê Kanûna yekema 1998 an.

⁵³ Ji bo xwandina paşeroja zêde li pêwendîyê Tirkîyê û Sûriyeyê, Binêrin ji Rapora hejmara 108 a Koma Qeyranê, Rojhilata Navîn, *veguherîna Kartan? (I): tam bûna stratiji ya Sûriyeyê*, 14ê Kanûna yekema 2009 an, rr. 5-8.

⁵⁴ Hemberî gotinê kesek ku pêwendîyê xurt gel PYDê hene, nêzî 3,500 ji şerrvanê PKKê ku di pevçûnê gel Tirkîyê da hatine Kuştin Sûrê bûne. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, 7 kanûna duyema 2012. Yek ji rîyê ku PYDê alîgirê xwe kom dike, ev ku merasîmî bîr anîna gerîlayê xwe ye hatî kuştin bi rêve dibe, herwek di wêney ku ji alîgirê PYD tê dîtin, alîgirê av partîyê posterek bilind kirine ku ser hatîye nivîsin: “înaşehîda [û] Azadi”, www.facebook.com/media/set/?set=a.369729856424259.88910.252366188160627&type=3.

⁵⁵ Binêrin ji “Nedîtina Komî”, Rêxistina Mafê Mirovan, 26ê Çiriya paşîna 2009 an.

⁵⁶ Di destpêkê da Tirkîyê idîaya reformê rejîme rast nirxand û di hevdîtinê bilin da pêşnîyara alîkarîya siyasi û zanistê teknikî ji Şamê re pêşkêş kir, paşê hevdem pêwendîyê xwe gel mixalifan saz kir û ji serkut kirin xelkê rixne kir. Heta nivîya 2011, hevsengîya ev helwestê bû bi zirara rejîmê. Binêrin ji Rapora Koma Qeyranê, *Serhildana Gelê Sûriyeyê pê zivirrînek hêdî*, herev., 6ê Temûza

bo berî girtin ji xwepêşandanê dij bi rejîmê û ji vê balkêşir bo bihêz kirina desthilata xwe hember Tirkîyê û metirsî dan ji Tirkîyê re ku disa PKKê bihêz dike, dû lihev kirina gel PYDê çû.

Ev guherîna rewşê, derfetek baş da PYDê ku hêza xwe di Sûriyeyê da berçav bike. Ev partîyê Encûmena Gelê Rojavayê Kurdistanê (PCWK) damezrand, ku ev bi şûna encûmenê heremîyê bijartî da nasîn û armanca vê pêşkêş kirina xizmetê civakî bû. Hember gotinê ye ji nêzîkê PYD ê, “di PCWK ê da nûnerê bajaren Kobanîyê, Qamişloyê û Şêyx Mesûd a Helebê [ku bi pirranî Kurdin] hatin cî girtin. Di PCWK şaredar û serokên heremî besdarin ku xebatê şaredarîyê bi şûna dewletê bicî dînin. Ev encûmene di 12 ê Kanûna yekma 2011 an da hatîye damezrandin û niha 320 endamê wê heye”.⁵⁷

Armanca xebatên PCWKê kom kirina piştgirîya ji bo PYDê ye bi rêya komê civakî, anku ji rêya pêşkêş kirina xizmetê civakî û curek desthilat darî di heremê ku tûşî valahîya desthilatdarîyê bûna.⁵⁸ Ev encûmenê dixwazî modelekê pêşkêş bike ku ji gendelî û bêpergalîya ku di nava KNC ê da berçav bû xwe dûr biger.⁵⁹ Lêkolinkarek Kurdê Sûrî dibêje:

Bi gotinê PYDê, PCWK ji ber vê hate damezrandin ku : PYD ligel xelkê yekgirtîye, û ci pêdîvî ji partîyê dî re tine. wan herdem kiryarê wisa kirine. Di sala 1992 ya, dema ku dewleta herema Kurdistanê, di Kurdistana Eraqê da hat damezrandin. PKKê Ençûmena Gelê Kurdistana Rojava di Birûkselê da hemberî vê damezrandin, ji ber kû nedikarî gel Hikometa Herema Kurdistanê (KRG) bibe yek. Niha ku KNC ê di Sûriyê da hatîye demizrandin, PCWK her gotinê xwe dubare dike: Gel digel me daye, û em gel partîyê Sîyasî [Kurdî yê dî] hevrê ne, li cihê ku dijberî wan bin.⁶⁰

PYDê ji dema destpê kirina xebatê xwê, Hêza xwe deynderî rewşa rêxistina xwe ye. Ev partîyê Encûmenê Heremî yê Gel (PLC), damezrandin û her yek kir berpirsê xrbatek taybet di heremê Kurdî yê bi destê xwe da. PLC di bin biryara saziyek navendî anku Lijneya Lihev kirina Navendî (CCC), ku ji berpirsê her beşekê pek tê û

2011 an; û “Têgehîştina Mixalifê Sûriyeyê: hevpevivînek di navber Turkia, Amerîka, û Sûriyeyê”, Projeya Demokrasîya Rojhilata Navîn, 8ê Hizérana 2012 an.

⁵⁷ Hevpevivîna Koma Qeyranê, kanûna duyema 2012. rêznameya PCWKê dixwaze xebatê wek, damezrandina encûmenê heremî, ava kirina navendê tendiristî, werzişî û çandî, zanko ya mafê mirova, dibistan û navendê ziman li ser dubat kirina perwerdeya Kurdi, geş kirina rêxistinê mediyayan û navenda mafê jinan û xebat bo zivirandina navê Kurdi yên bajaran û gûndan di heremê Kurdî yê Sûriyeyê da, bîvî bîne. “Rojhilata Navîn û Demokrasî: Bûyerên dawî yê di Sûriyeyê û rewşa Kurdan”, rûniştina PYD ê gel Koma Qeyranê, Brûksel, 12ê Adara 2012 an.

⁵⁸ Bo mînak, PYD di Efrînê da îdia dike ku pevçûnek hember çandina heşîşê birêve birîye, u bal dikşîne ser hêjayîyê xwe yê birêvebirîyê û berpirsiyê sivilî yê xwe. www.facebook.com/photo.php?fbid=397322800331631&set=a.253541481376431.66744.252366188160627&type=1

⁵⁹ PYDê bi taybet ji hêla ewlehîyê vê xwe bibandor nişa daye. Siemand Hajo ji KurdWatchê, da dibêje, “PYDê endamê taybet hene, lê xelk jî niha besdarî PYD ê dibin, ji ber ko ev kome bihêzê. Hinek kes di Qamişloyê da dêji. Her ci nebe, PYDê dikarî kolana kontrol bike û em piştgirîya wan diken. PYD ê bi berçavî ji partîyên di yê Kurdî, serpêhatîyê zêdetir hene; ev bê pêşkêş kirina berpirsiya wekparastin ji kolana, ji ciwana ra hesta bêşdar bûnê didin. Ev benzînê bi erzanî difroşin û serdana malbatê lawaz dikin û xizmetê wisa pêşkêş dikin. Berevajî ya vê, çend ciwan îdia dikin ku, diravê ku KNC yê ji KRG ê wergirtîye, bê encam kirine. Ewan nûnerek ji KRG ê şandin û rexne ji ev biryarê kirin ku çima bi şûna dirav ji saziya KNC ê re bê dayin ji endamê vê re hatîye dayin û paşê KRG û ji ev nûnerî re ji rirav dide, lê ev ji ev diravî ji xwære radike.”. Hevpevivîna Koma Kirîzê, Berlin, 7 Adara 2012.

⁶⁰ Koma Kirîzê pêwendîya telefonî, kanûna duyema 2012 an.

di sala 2007 an da hatîye damezrandin, birêve diçî.⁶¹ Yek ji endamê PYDê ku berpirsê ciqa vê ya ciwana ye, got:

Em hember ideologîya Ocelan bi bawerin ku birêexistin kirina civatê pêngavek pêdivî ye bû gihiştin ji pirojeya sîyasî ya me li ser xweserîya demokratîk. PYD tenê partîyek sîyasîye û pişkek ji projeyek mezin e bi navê Tevger ji bo Civaka Demokratî (Harakat lil-Mujtamaa al-Democratî), û herwisa tengerâ ciwana (Hereket el-Şebab), tevgera jîna (Hereket el-Mere yan Yekîti Star) û saziyê zimanê Kurdî (Mûesêset el-Lûqa al-Kurdiya) ji li ber dignir.⁶²

Hevdem gel destpê kirina serhildanê, PYD ê beşa ewlehî yê jî lê zêde kirîye û rêvebirîya Komîteya Berevanîya Gel dike û ev jî li ser xebatê Yekîtiyê Berrevanîya Gel, lénérînê diken. Xebatê saziyâ dawîyê wek hêzên polîsa ne. û hatine şûna polîsi Sûriyeyî ku di bin destê wezareta hindirrê di Şamê da ye. Ev yekîtiyênê pê bikar anîna kesen heremî, pergala keremê Kurdî diparêzin.

PYDê herwiha komek çekdarîyê bi navê Yekîneyên Parastina Gel (YPG), damezrandîye. Ev kome berî serhildanê jî hebû lê paş serhildanê, wek şîngirê Arteşê xebitîye, sinorê heremê pirranî Kurd, herwiha sinorê Kurdistan Eraqê û ji hemîya balkêstir pişkek mezin ji sinorê gel Tirkîyê jî diparêze. YPG herwisa di bajara da li kêlega Yekîtiyê Berevanîya Gel, navendê kontrol kirinê û lénérînê, danane û ewelehîya çûn nû hatinê di rîya û avahîyê dewletê dabîn kirine. Alîyê balkêş di hebûna PYD ê da çekdar bûn wê ye ku bûye sedema metirsîya Tirkîyê û komê Kurdî yê dijber.

Di Temûza 2012 a da, pêwendîyê di navbera PYD ê û rejîmê da pir alozî hebûn û herdem ji diguherîa. Bêguman berjewendîyê kurtedemî yê herdu yan gel hev têkilî heybû, rejîm ji pevşûnê di navbera Kurd û Tirka û herwisa di navbera Kurd û ereba mifa werdigirt, û di hember da PYDê jî derfetek bo xurttir kirina rewşa xwe bi dest anî bû. Lê hinek jî dijberîya wan hebû. Ji alîyekê desthilat darîya PYDê li ser heremî Kurdan dibû sedema lawaz bûna desthilatdarîya rejîmê; ji alîyê dî, ji ber ku Kurdên Sûriyeyî nefretek kûr ji rejîmê hene, bêguman îdiyê lihev kirina herdemî ya PYDê gel Şamê zirarê gehandîye bawerbarîya vê. Di destpêka sala 2012 an da, ev tevgerê xebat dikir ku etîketa “şebîhe ya Kurdî” pê mifa wergirtin ji medîyayê xwe yê civakî li ser xwe rake, û dijberîya xwe gel dewletê nîşa bide. Ev partîyê bi rewşek bipergal dest bi bikaranîna Feysbookê kir heya gotin û lêkolînê dij bi rejîmê nîşa bide, lê gelek gotinê hatî pêşkêş kiri li ser bilindkirina PKKê.

Nexweşiyê di navbera partî û rejîmê di meha gûlanê 2012 da zêdetir hate berçavê dema ku hêzên ewlehî yê dewletê hinek xwepêşander û alîgirê tevgerê girtin û hember

⁶¹ PYDê, CCC ê di dema kongreya xwe ya sêyemin di sala 2007 an da damezrand. Di vê demê da ev komîteye 11 endam hebûn. Di dema kongreya çarim ya ev partîyê di meha Tabaxa 2012 an da ev hejmare bû bi 24 kes. Here beşek berpirsê xebatek taybet bû û bi berferhbûna desthilatdarîya PYD ê di salên 2011 û 2012 an da, di giş bajarê Kurdan da navend damezrandine. Bo mînak, beşa sîyasî gel navenda partîya PYD ê pêwendîyê dignî; beşa ciwana ji hêla sîyasî, ciwanên Kurd perwerde dike; beşa çandî navendê parastina ziman û çanda Kurdan birêve dibe, herwisa saziyâ ciwanan, jin û şehîdan, û beşea mijarê jinanê berpirs, di bin destê jinê nîvîckdar yê sîysi, daye. Giş beş di Efrînê da ,ku cihê xebata dirêj ya PYDê ye, da dimînin. Di hinek bajaran da beşe taybetî têna damezrandin; bo mînak , ji ber hebûna çavkanîyê gazê di Dêrikê da, PYD beşek ji bo gêş kirina çavkanîyê sîriştî damezrandîye. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, endamê komîteya ciwanên PYDê, Hewlêr, 4ê Oktobera 2012 an.

⁶² Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlêr, 7ê Oktobera 2012 an. Ji Tevgera Civaka Demokratîk re TEV DEM ji dibêjin.

rapora piştgirê rejîmê çend kes ji alîgirê PYD ê di helebê da kuştin.⁶³ Di vê demê da, tona PYDê (di durişm û gotina da), hember rejîmê gelek tûj bû.⁶⁴ Alan Simo, berpirsê karûbarê derve yê ev partîyê ev guherrînê nîşa dide: “Me ev serhildane, alîgirê Demokrasî yê dizanî û di serhildana Demokratîk di hember çar heta pênc dehsala da bi başî besdar bûn. Heke em alîgirê rejîmê bûn, çima diba wan hevalên me di helebê da kûştibana?”⁶⁵ bobihêz kirina ev mijarê, berpirsê PYDê di axivtinê xwe da dijberîya dîrokî û pevçûnê xwe gel rejîmê destnîşn dikirin. Hevserokê PYDê, Salih Muslim got:

Xelk me tawanbar dike ku em gel rejîmê ne, lê zêdetir ji dehan sale ku em beşek ji pevçûnê gel ev rejîmê ne. partîya me bi tenê ji serhildana xelkê di 2004 an da di Qamişloyê piştgir da, û endam me bi çaran rastî êrisê hatine. Her di destpêka serhildanê da em jî gel bûne, û bûne beşek ji dijberên NCB [Rêexistina Lihevkirina Netewî ji bo Guherrîna Demokratîk] yê. Me di meydana da ji şehîdên weh şehîdên Helebê hebûne. Heke rejîm niha êrisî me nake, sedema vê ev ku ev dizane ku nikare hemberî me serketî be.⁶⁶

Derfeta rastî bo PYD ê ji bo pêşve çûnê – û bo zext li ser rejîmê – di Temûza 2012 an da û demekê kete dest ku PYD ê bo berçav kirina hêza û serbxweyî ya xwe gelek avahîyê dewletê di heremê Kurdan da xistne dest xwe. Kesek kû pêwendiyê baş gel PYD ê hene dibêje:

Me ji rayedarê bajara re got ku wan 24 demjimêrk derfet hene ku avahîya vala bikin yanji emê pê zor ê bigrin. Polisan Efrîn û Kûbanî [Eyn el-Erab] bê pirsgirêk bi çî hêlan, lê di Dêrikê da [El-Malikiyeh] paş hinek berxwedana paşve çûn. Me komîteyek bo parastina Aşûriyâ, Ereba û xelkê di saz kirîye. Niha pompeyê benzînê di dest me danê û em benzînê difiroşin û mehaneya endazyarê xwe didin. Ji ber ku pergal bilav nebe; eve tam ev tişte ku PYD niha perpirsyarîya wê heye.⁶⁷

Çavkanîyê dij bi PYD ê, wek rayedarê Tirk û sîyasetvanê Kurd ê Sûrî yê serbi partîyê dijber, dibêjin PYD ev serhildane bi alîkarîya rejîmê bi cî anî. Bû mînak, serokwezîr Erdogan idia dike ku Esed zêdetir ji pênc bajara radestî PYDê kirin.⁶⁸ Raste ku zêdebûna desthilatdarîya PYD ê di bakûr da, bêguman gelek mifayê gengaz ji bo rejîmê hene, wek bisinor kirina giş komên dî û berî girtina wan ji bo bikar anîna sinor, lê hember bilinbûna rewşa tevgerê, gelek xelkê Sûriyeyê – hem dost û hem dijminê rejimê – ji armancê cudaxwazî yê Kurdan ditirsin; û, ev mijare alîkarî dide stratijiya dewletê ya cudahî saz bike û hikomet bike.⁶⁹

⁶³ Di 3ê Gulana 2012 an, alîgirê PYD paş biçavbûna endamek tevgerê, Abdûlxaliq Hesen, ji alîyê hêzên ewlehîyê rejîmê ve, ji ber dadgehê xwepêşandanek rê xistin. Hêzên ewlehî êris birne ser xwepêşandera û da kes binçav kirin û ev mijare bû sedema xwepêşandanek mezintir di Amûdê da. Li gor rapora, PYDê ji du endamê hêzê ewlehî dîl girtin heye xwepêşander her di ev şewê da, serbest hatin berdan. Li gor rapora her di ev mehê da, çar endamê PYD ê ji alîyê alîgirê rejîmê di taxa Şêyx Meqsûda Helebê hatin kuştin. Binêrin ji www.kurdwatch.org/index.php?aid=2518&z=en&curc=245; and www.kurdwatch.org/index.php?aid=2542&z=en&curc=245.

⁶⁴ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, kesek nêzî PYDê, 7ê kanûna duyema 2012 an.

⁶⁵ Koma Kirîzê hevpeyivîna pê Skype, Lenden, 1ê Hizérana 2012 an.

⁶⁶ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlêr, 12ê Oktobera 2012 an.

⁶⁷ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Temûza 2012 an.

⁶⁸ Binêrin ji <http://englishalarabiya.net/articles/2012/07/26/228476.html>. Gengaze mebesta Erdogan Efrîn, Amûda, Dêrik, Kobanî û Cinderis bî.

⁶⁹ Kesên di li ser bûyerên Temûza 2012 an nêrînê cuda hene. Xebatkarek Kurd ji Amûda bûyerê wisa dinirxîn: “Hêzên rejîmê ji avahîyê dewletê paşve kêşan. Paşê kesên PYD yî pê çar makîneya hatin û avahî rapêç kirin.ewan izn da ku endam biçin û giş dosîya gel xwe biben”. Hevpeyivîna

Herwisa, zelale ku çîma rejîmê hez dikir bi dilêxwe iznê bide PYDê ku bi vê rewşê desthilatdarîyê bidest bîne tevî ku ev kiryare nîşa dida ku rejim lawaz bûye û pişka aram ya welat ji dest hatîye der. Mijar dî, îdiayê herdem yê PYDê ne ku dibêje em serbixwe ne û xwepêşandana dij bi rejîmê saz dike. Ne cihê sûrprîzê ye ku PYD tawna lihev kîrin gel rejîmê, bangeşeyek dizanî ku ji alîyê Tirkîyê ve hatîye bi rl xistin bo zirar gîhandin ji bawerbarîya wê, û ev vê yekê red dike.⁷⁰

Di dawîyê da, û bê nêrîn li ser vê esasê ku gelo rejim û PYD hevpeymanîya yek diken yan ne û firehîya ev hevpeymanîyê ci qasê, gengaze ku mifaxwazîya tevgerê û yekbûna berjewendîyê kurtdemî yê herdu alîya, alîkarî bede ji zelal bûna ev hevpeymanîya kurtdemî re, PYDê beşek ji bakûr xistîye bin destê xwe, bê ku rijîm xebatekê bo zivirandina wan bike.

Koma Kirîzê, Hewlêr, 8ê Oktobra 2012 an. Endamek PYDê strategîjî weisa zelal kir: “Strateji ya me, ji xwe parastin bû. In Eyn el-Erabê da, paş paşve kêşana hêjê rejîmê, erka me ev bû ku em avahîya kontrol biken û iznê ji FSA [Artêşa Azad ya Sûriyeyê, komên çekdarê mixalif û bêpergala] re nedîn ku bikeve nava bajar, ji ber kû FSA yê di kûda diçe, rejîm jî pey wane diçe”. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Hewlêr, 12a Îlona 2012 an.

⁷⁰ Berpirsek PYDê dibêje, “em ji propagandayê Tirkîyê û derewan û bangeşeya li ser pêwendîyê partîya me û rejîma zâlimdi Sûriyeyê da ne bi surprîzin. Lî mediyayê Ereb û dînyayê li gor mediyayê Tirkîyê û bê lêkolîn kîrin, me tewanbar dikin”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, 24ê Temûza 2012 an.

III. Dijberîyê Partîya

A. Komîteyê ciwanan

Tevgera ciwanan ku wek beşek ji serhildana gel ketibû meydanê bi berçavî xwe dana hemberî kevne partîyê yê sîyasî yê Kurdî ku bi giştî di KNC yê da kom bibûn.⁷¹ Bi nêrîna ev tevgerê, ev partîyane di dîrokê da qet xizmetî berjewendîyê Kurdan nekirin; û mifayê nepejirandî radestî desthilatdarê dewletê; di serhildana 2011 an da di perawêzê da man; û ji hemîya berçavtir, ne nûnerê riha serhildanê ne û ne gişt Kurden Sûriyeyî, û ji ered û ciwanîya xwe veqetîyane û bindestê serokên bêbawebar û kevn da dixebeitin. Yek ji xebatkare ciwan nerazî bûn xwe wisa derdibire: “Partîyê sîyasî bi salane ku serokê xwe neguherrîne. Ji bo Kurdan çi desthilat bi dest nexistine. Em gel van ciyawazin. Me serok tuneyê lê em di giş heftîya da li gel hev hevdîtinê saz diken û gotûbêjê diken ku çawa xebata xwe pêş bibin”.⁷² Komîteyên heremî yê ciwana heta radeyekê xwe ji partîyê kevn cuda kiranûn, û rêxisinên bê hiyerarşî û demokratiktir li gel birryargehê giştî saz kiriibûn.⁷³

Nêrîna tevgera ciwana li ser PYDê erênî ne. Tevî ku ji ber çalak bûn û bibandor bûn ev tevgerê (bi taybet di hember rêxistinê girêdayî bi KNC yê) bawerî pê hene,⁷⁴ lê vê ji tawanbar dikirin li ser, polîsî kirina kolana tam wek rejîmê; serkut kirina xebatêni ciwanan di gelek bajarên Kurdan da;⁷⁵ û girêdanê vê gel ideolojîyek bîyanî û binefret –PKK–gel dubat kirina pevçûnên Tirkîyê.

Gelek ciwanen Kurd yê Sûriyeyê dixwazin sembolê zanavê komî bêbandor nîşa bidin, û di hember da dixwazin zanavê xwe yê Sûrî bilind bikin. Hember gotinê yek ji xebatkarê Amûda:

Me herdu alayê Sûrî û Kurdi xwepêşandana da radikirin û hem bi Kûrdî û hem bi Erebî durişma “Gel Sûrî Yekgirtî ne”, didan: Lîbelê, gel pêşçûba serhildanê, pêwendîyê di navbera komîteyê ciwanen Kurd û Ereb dijwar bû, û beşek ji sedemê vê yekê, dijwar bûna hatûcûnê li seranserê Sûriyeyê û kemasîya amûrê pêwendîyê bû.⁷⁶

⁷¹ Herwek hate gotin, pêwendî gel KNCê rerş û spî nînin. Hevpeymanîya komîteyê ciwanan, ku şes komîte di navda endamin, û tevgera ciwana (Herekat el-şebab) beşdarî KINC yê bûne. Partîyê sîyasî yê beşdar di ev encûmenê da dixebeitin ku tevgera ciwanan nêzî xwe bikin, bi alîkarî dan ji wan re, ku rêxistinê girêdayî bi KNC ê saz bikin û yan bi hêviya alîkarî LCCê û tevlî kirina wan di nava KNC ê da, armancê xwe bi cih tînin. Rojnamevanek Kurd yê Sûriyeyê dibêje, “hinek komîteyê ciwana birryar girtin ku beşdarî KNC ê bibin lê birastî ciwan di KNCê da bêdengin. Dibî em Ji KNC yê re bêjin ‘Encûmena Partîya’ ne ‘Encûmena netewî ya’”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlêr, 10ê Ilona 2012 an.

⁷² Hevpeyivîna Koma Qeyranê, yek ji endamê LCC yê di Amûdê da, Hewlêr, 4ê Oktobera 2012 an. Kesek dî dibêje, “ev kkesenê bê xebatin, ev di Hotelê pênc-stêr da rûniştinê xwe birêve dibin, dixwin û divexwin û diçin. PDKS dibistanek Kurdi di Dêrikê da vekir, lê sinif bêpergalin, û yek ji xizmê endamê PDKS ê bû rêvebirê dibistanê. Eve ne ev Sûriyeyê ku em daxwaz diken”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Xebatkarek Kurde Sûrî, Hewlêr, 4ê Oktobera 2012 an.

⁷³ Di Amûdayê da, bo mînak, rêvebirîya navendî ya Komîteya Ciwanan (*idaara*) 25 endam hene, ku birryarê vê bi giştî têngirtin. Komîteyên jêrîn berpirsiya karûbarê derive; pêwendî girtin gel komîteyê ciwana di bajaern dî yê Kurdi di Sûriyeyê da; alîkarî dan ji malbayê xwedî pirsgirêk; û rêxistina fêrgeh û projeyê perwerdehîyê, li ser stû digrin. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, endamek LCC yê di Amûdê da, Hewlêr, 6ê Oktobera 2012 an.

⁷⁴ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Xebatkarek Kurde Sûrî, Hewlêr, 14ê Ilona 2012 an.

⁷⁵ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, endamek LCC yê di Amûdê da, Hewlêr, 4ê Oktobera 2012 an. Ew bûyerê Temûza 2012 an, rizgarîya bajare Kurdi yê Sûriyeyê nizanin, û girtina avahîyê dewletê ji alîyê PYDê we, bi sedema paşvê kêsana tejîmê dizanin.

⁷⁶ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, endamek LCC yê di Amûdê da, Hewlêr, 6ê Oktobera 2012 an.

Dijberî KNC yê û PYD ê, komîteyê ciwanan xweserîya demokratik yan rewşek taybet ji bo heremê Kurdan naxwazin. Li şuna wan da dixwastin ku dewletek sekular û demokratik li ser esasa hevwelatîyê saz bibe ku di nav da mafê Kurdan wek neteweyê dî, bê nas kirin. Yek ji xebatkarê ciwan yê serbixwe yê Qamişloyê got, “Sûriye navê welatekê ye ku em ciwanê Kurd ji beşek ji vê ne, Ez Kurdim û hevdem Sûrî me. Min gel ciwanek Erebê Sûrî yê hevtemenê xwe nêzêkîyê zêdetir hene heyâ gel ciwanek Kurdê Eraqî. Çareserîya ku ez bû Sûriyeyê dibînim eveye ku dewletek sekular û demokratik saz bibît ku nasnama min wek Kurdek nas bike. Abdilhekîm Beşar [serokê PDKSê] ne nûnerê Kurde Sûriye, ji ber ku nûnerê KRG yê ye. Ez pêşeroja xwe gel Sûriyeyê dibînim, ne gel Barzani”.⁷⁷

B. *Encûmena Niştîmanî ya Kurdi (KNC): Konfederasyonek Serkeş*

Herwek ku hate gotin, giringtirîn heyîya KNC yê meşrûtiya navnetewîya vê ye, ku sedema vê jî pêwendîyê vê gel KRG û di dawîyê da gel Tirkîyê bi dest hatîye. Ahmet Davutoğlu wezîrê karûbarê derveyê Tirkîyê gel serokê Koma Netewî ya Sûriyeyê, di meha Tebâxa 2012 an da di Hewlîrê berçavê KRG ê gel nûnerê KNC yê hevdîtinek pêk anî. Û gel KNC yê wek dengê Kurden Sûriyeyê hevdîtin kir. Lê nexwast ku gel nûnerê PYD ê hevdîtinê pêk bîne.

Hevdem, KNC ji ber nebûna pergalê, dûrî ji ciwanên xeabatkarê û nebûna pilanekek yekgortî, bi dijwarî didomê, serokê yek ji partîyê got, “hinek partîyê Kurd, xwastinê xwe naxazin zêde biken, ji ber ku bibawerin di berteka vê da rejîm tê wan siza bike. Ev déjin ku dixwazin navendî bimînin heyâ zirarr ê nebînin, rastî eve ku ev niha jî ji dewletê ditirsin. Tevî ku em hêvî darin ev mijare nebe sedema vejetînê”.⁷⁸

Mijara ku giringîya vê hêjî zêdetir e, sıriştâ aloz ye ev partîyane ye ku xwe sítava alozîya di navbera piştîvanê wan ye derive ye, bo bidest anîna desthilatê zêde. Abdûlhemîd Darwîş (kû ji Talibanî nêzike) û Abdilhekîm Beşar (close to kû ji Barzanî nêzike) serokê bibandor di nava KNC ê dane; cudadî ji dijberîya wan xwe, dijminîya wan sítava dijberîya di nav PUK ê û KDP ê ye bo bidest anîna desthilatê zêde di nava Kurden Sûriyeyî da. Pevçûna desthilatdarîyê di nava hinek ji partîyê endamê KNCê zêde bûye û eve nîşanek ji zêde bûna desthilatdarî û bibandor bûna ev Komê ye; herî kêm partîyek (Partîya Yasir) ji vê komê vejetîya ye.⁷⁹

KNC herwisa di heremê Kurdi yê Sûriyeyê da rolek lawaz hebû ye. Tevî pêşkêş kirina pilana damezrandina navenda di giş bajarê Kurdan da, heyâ niha jî ev pilane bi cî nehatîye; hêzên çekdar çinînin; û bandorek baş li ser komê Kurden Sûriyeyî ku ji alîye KDP ê ve di Kurdistana Eraqê da hatine perwerde kirin, tine, giş ev mijarane dibine sedema guman di şeyana ev komê da ku bikare wek nûnerê kurden Sûriyeyê biryarê bigre, yan pêdivîyê peymanê ku vajo kirine bi cî bîne.

KNC îdia dike ji bo ku bikaribe, rolekbihêz paş Esed di Sûriyeâ da bidest bîna, dixwaze reforma bike û bibe rêxistinek bibandor.⁸⁰ Ev yeke di rastî da pê kêm kirina

⁷⁷ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr 13ê Îlona 2012 an.

⁷⁸ Binêrin ji www.kurdwatch.org/Sûriyeyê_article.php?aid=2504&z=en&cure=240.

⁷⁹ di Nîsana 2012 an, komîteya navendî ya Partîya Yasir, serokê xwe, Muhamad Mosa, ji holê xistin. Ev bûyere bo sedema weqîtînê û di encamê da du partîyî, bi navê “Komîteya Navendî”, û yan dî bi navê “Kongre” saz bûn. Ibid.

⁸⁰ Endamek KNC ê rexne ji kiryarê Encûmén dike û dibêje: “pergala xeleki bo bijartina rêvebirê komîteyên KNCê bûye sedema aloz bûna rewşê. Bo mînak, dûreya serokatîya komîteya pêwendîyê dervê ya KNCê ev qasî kêm deme ku bê encame; kesê ku dibe serokê ev komîteyê dibe xebatê xwe ji yekê da destpê bike”. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, 5ê Oktobera 2012 an. Rayedarek ji partîyek nêzî

biryargira; zelal kirina xwasteka; hevpeyivî le ser wan gel PYD ê û mixalifên Sûrî ; û zêde kirina bandora xwe di meydanê da pê damezrandina çiqê eşîreta û komîteyê ciwanan, pêk dê. Ji ber vê yekê KNC dixwaze ji partîyê bi hêz re mafê veto kirinê bide. Heke ev guherrîne saz bibe di encamê da KDP dê bihêz bibe û di dura xwe jî dê alîkarîyê bide bibandor bûn Barzanî di nava Kurdên Sûriyeyê da.

Ev reformene hê çê nebûne. Lê di meha Kanûnê da çar serokê paertîyê nêzî Barzanî – Abdilhekîm Beşar, Ismaîl Heme, Mûstefa Jimâ û Mistefa Aso – damezrandian hevpeymanek nû bi navê Yekîyiya Kurdên Sûriyeyî ya Demokrat (SKDU), ilan û îdea kirin ku “ev bizave dê bibe sedema bibandor bûna siyasî ya KNC” û herwisa gotin ku hevpeyivî gel diberê Sûriyeyî li ser pirsgirêka Kurdan dê pê lihev kirin gel giş endamê KNC yê û Desteya Kurdî ya Bilind bidome. Teví ku hinek kes idia dikan ku gengaze koma nû bixebite bo bihêz kirina Barzanî hêzên dijberê siyasî yên Kurdên Sûriyeyî danê tenîstê. Xebatkarek Kurdê Sûrî ku di Hewlêrê da dimîne got:

Yekîyiya Kurdên Sûriyeyî ya Demokrat ji ev partîya pêk hatîye ku ji Barzanî re nêzîkin. Wan şiroveyên wekyek li ser federalî û hêzên Kurdên Sûri ku di Eraqê da dimînin, hene. Damezrandina ev yekîtiye dibe sedema zêde bûna cudahî ya di KNC yê da niha Barzanî jî dikarî bi tenê gel hevalê xwe rûnê û li ser pêşeroja me biryarê bigrî. Ew kiryarre asantire!⁸¹

C. Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD): Pêwendîyek rîgir gel PKK ê

PYD e partîyek siyasî ya çekdare ku bi başî hatîye birêxistin kirin, perewerde kirin û bi pêvajoya biryargirtina navxweyî ku dixwaze helwestek yekpare saz bike, hatîye bihêz kirin. Ev partîyê cuda ji dîrokek hevpar gel PKK ê, her wek vê serokatî û ideolojîyek zelal heye. Ev partîye jî di nava Koma Civaka Kurdistan (KCK) ê, da çî digre. KCK e partîyek giştîy bi serokatîya Ocelane û PKK û partîyê girêdayî vê di Îranê da anku Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK), û di Eraqê da jî Partiya Çareserîya Demokratîka Kurdistanê da nav da cî digrin.⁸² KCK û PKK hevrêzname û hevserokin: sê kesê bibandor di komîteya rêvebirîya KCKê da, herwisa di PKKê jî da serokin.⁸³

PYD e bi rewşek berçav gotin û sembolê siyasîy yê PKK ê bikar tîne. Ev partîye “xweserîya demokratîk” dixwaze, ku têgeheke ji alîyê Ocelan ji bo têper bûna

Feysel Yosif, serokê KNCê dibêj, “mêbesta me ev ku em KNC ê bêhtir bikin heya birryar girtin di nav da baştır bibe. Gengaze encama ev bûyerê bibe sedema kom bûna biryargira û kêmter bûn wan. Herwisa dibe ku ev birryare bibe sedema qazanca partîyê mezintir û ji wan re hêzek zêdetir ji bo birryar girtî bide”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Endamek ji Partiya Demokratîka Pêşverû ya Kurdistanê (ji Partiya Pêşverû ya Kurdî di Sûriyeyê da bi serokatîya Abdülhemid Derwîs ve hatîye veqetîn), Hewlêr, 4ê Oktobera 2012 an.

⁸¹ Hevpeyivîna telefonî ya Koma Qeyranê, 19ê Kanûna yekema 2012 an.

⁸² Alîgirê heremî di sala 2002 yan di Eraqê da partîyek ni nûnerîya ji PKKê damezrandin û ev bi Partiya Çareserîya Demokratîka Kurdî (KDSP) nav danan. Hêzên ewlehî yê Kurd di Eraqê da di 3 Novembera 2007 ê navenda di Hewlêr da girtin.di 2009 an da , Komisyonâ Bilinda Serbixwe ya Helbijartina Eraqê, izin neda koma “Hêwa” ku saziyek jérîn ji ev partîyê bû, ku beşdarî helbijartinê parlemanî di heremê kurdî da be. Binêrin ji “Hewlêr: namzet û hevpeymanî bo bijartinê parlemanî di herema Kurdistanê da”, balyozxana DYB ê di Bexdayê, 7ê Hizêrana 2009an , li gor belheyê bilav bûyî ji alîyê WikiLeaks ê; www.ekurd.net/mismas/articles/misc2007/11/independent_state1747.htm.

⁸³ Ev sê kesene berîti ne ji; Serokê girtî yê PKK ê Abdûla Ocelan, Morad Kereilan rêvebirê PKKê û Cemîl Bayik, yek ji daezrênerê PKKê. Rapora Koma Kirîzê, *Tirkîye: PKK û Çareserîya Pirsgirêka Kurdan*, herev., r. 11.

desthilatdarîyê û wisa tê zanîn ku bidil nayê zelal kirin.⁸⁴ Wêneyê Ocelan herdem di xwepêşandanê PYD ê da berçavin.⁸⁵ Zêdetir ji vê, herwek hate bas kirin, çığa çekdar ya PYD ê di kempê PKKê da di çiyaê Qendîlê da hatîye biçî kirin û perwerde.⁸⁶

Serbixweyî ya PYDê gel PKKê cihê gumanê ye. Xebatkarek Sûrî ku Dij bi PKK ê ye, dibêje: “Rêvebirê PYD ê ev kes nînin ku [li ser mijarê serekî] birryarê didin; ve [PKK] di Qendîlê da ye”⁸⁷ – lê gengaze zivirîn ji Sûriyeyê re bibe sedemê seretayî yê ciyawaz.⁸⁸ Berdest bûna çiqek çalak yan alîgirek PKK ê di heremê Kurdîyê nêz da, ji PKK re di pevçûnê dij bi Tirkîyê, kûrahîyek stratejîk pêşkêş dike, lê PYD dibe nêrînê nû berçav bîne û role xwe ya siyasî hember rastîyê heremî bileyzîne. Ev mijarê pêdivî heye ku, PYD e wek partîyek Sûrî, meşrûtîyek zêdetir di nava Kurdên Sûriyeyî da bîdest bîni; pêşvebirina rojevek Kurdî-Sûrî; bibe alîyek hevpeyivînê gel mixalifê (ne-Kurd) yê Sûrî; û meşrûtîyek navnetewî bi dest bîne. Tam berçave ku rêvebirê ev partîyê di berteka metirsîyê Tirkîyê li ser êriş kirina dij bi wan di Sûriyeyê da⁸⁹, di havîna 2012 an da, xwe bi rewşek berçav ji PKK ê dûr kirin û idia kirin ku gel PKK ê, enê hevparî yê ideolojîkî hene. Elham Ahmed, yek ji rayedarê PYD, dibêje, “bizava me- ji ideolojîya Ocelan mifa wergirtîye, lê em ji hêla fizikî û rêexistinî ji PKK ê cuda ne”.⁹⁰

Her tekoşîneke ya PYD ê ji bûna saz kirina nasnameyek serbixwe ji ber çığa vê ya çekdar anki YPG, tê bêencam bimînî, ji ber ku, hember rapora rêvebirîya ev çiqê niha jî tam girêdayî PKK ê ye. Endamê PYDê ser ev xalê dupat diken ku YPGê pêkhatîya serbixwe ya rêvebirîyê heye.⁹¹

Lê, bi egera zêde bûna pevçûnê di navberê sinorê Sûriyê û Tirkîyê da, û êrişa Tirkîyê bi giştî, YPG e gengaze ji bûna parastinê xwe naçar be di gel Tirkîyê bikeva nava pevçûna, û encama vê kiryarê yekbûna gel PKKê ye.

Yek ji endamê KNC ê li ser pêwendîyê tevlihev di navbera PYD ê û PKK ê da wisa difikire:

Heke PYD e dixwaze di Sûriyeya paş Esed da bimîne dibe stiratejî ya xwe biguherrîne. Ev partîye tê bibe yekim partîya bi mifa ku ji hevpeymanîya di gel

⁸⁴ Koma Qeyranê têgeha di ramanê Ocelan re dibêje ‘nezelalîya nepejirandî ya xweserîya demokratîk’, em bawerin ku ev tevgere bidil mebest xwe ji xweserîyê zelal nakin, ji ber ku her zelal kirink, gengaze ji alîyê pergakla yeknavend a Tirkîyê vê, tê “cudaxwazî” bê nirxandin. Rapora Koma Qeyranê, *Tirkîye: bidawî anîna şorrişa PKKê*, herev., r. 22. PYD bi berdewamî têgeha “xweserîya demokratîk” bi kar dîne, bo mînak, ikjnews.com/?p=494, 28 Novembera 2012 an. PKK têgeha “konfederalîsma demokratîk” bi berdevam, di bilavokê xwe yê giştî da bikar tîne, ku pergaleke ku, heremê Kurdan di Tirkîyê, ûr, Eraq û Sûriyeyê di nav da çih digrin. Ocalan ev têgehê wek “modelek pergâlî ya panKurdî ya pîramîdî destnîşan dike ku [di nav da] civak gel hev dipeyivîn, gotûbêj dikin û bîryar digrin”; Binêrin ji, “bilavokê konfederalîsma demokratîk”, 2ê Nîsana 2005 an, www.kurdmedia.com/article.aspx?id=10174.

⁸⁵ Binêrin ji “Durişm, Sembol û xwepêşandan: şorreşa Kurdên Sûriyeyê”, nîvîs û wêne, *Al-Monitor*, Hizîrana 2012 an.

⁸⁶ Ji hêla dîrokî, gelek gerîlayê PKKê ji Kurdên Sûriyeyê ne, ji ber ku PKK heya pêş derxistina xwe di sala 1998 an ji Sûriyê, bi salan di wî welatî da mabû.

⁸⁷ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, 7ê kanûna duyema 2012.

⁸⁸ Herwia , teví ku PJAK û PKK hevserok û hevideolojî ne, û PKK, şervanê Kurdên Îranê çekdar dike û jê wan re mahîyane dide, seretayî ta PJAKê pevçûn di gel rejîma Îranê ye, lê seretayîya PKKê pevçûn di gel Tirkîyê ye.

⁸⁹ Erdogan got: “alîkarîya di nav bera PKKê û PYD ê ne ser dilêmeye gere kiryarek terorê biqewime ... êrişa çekdarî dibe mafê me yê sirîştî”. Binêrin ji english.al-akhbar.com/node/10298.

⁹⁰ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 27ê Îlona 2012 an. Hevserokê PYD ê Salih Muslim ji here ev helweste girt. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 10ê Îlona 2012 an.

⁹¹ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Ilham Ahmed, Hewlîr, 10ê Îlona 2012 an.

partîyên Kurdî yê dî di nava KNCê da, mifa werbigre. Girêdana ev hevpeymaniye tê bibe sedema baş bûna meşrûtiye ev partîyê di nava xelkê da, ji ber ku, êdî xelk ev partîyê wek harîkarê dewletê nabînî. Û zêdetir ji vê êdî xelk PYD ê çiqek ji PKKê nabînî. Û bi giştî, tê meşrûtiyeta navnetewî ya PYD ê ku ji ber pêwendî yê vê gel PKKê ji dest çûbû disan zindî bibe.

Heke ji min pirs biken: “PYD çîye? Yan pêwendîyê vê gel PKKê çawane?” ez nikarim ci bersiva ji were bidim, û gengaze ku PYD xwe ji nekaribe bersiv bide. Ez bibawerim ku di nava PYDê da li ser bijartina strateji yê gengeşe heye, anku PYDe bibe tevgerek giştî ya siyasî di Sûriyeyê da, yanjî girêdanê xwe gel pevçûnê çekdarî yê PKKê bidomîne.⁹²

Bigîstî wisa tê berçav ku, PYD dixwaze xwe wek partîyek serbixwe û cuda ji PKKê nîşan bide, tevî ku PKK bandor li ser birryarê vê da hebe. Lê gengaze ev partîye di demek dirêj da nekarî ve rewşa nezelal bidomîne. Û naçar bî dest bi bijartinê bike ku, çiqek ji PKKê di Sûriyeyê da bimîne yanku bibe saziyek Kurdî di Sûriyeyê da li gel serpêhatîyeke PKK yi, lê bi rojeveke bi misogerî Sûriyeyî.

Berevajî KNCê, PYD di hemî heremê kurdan da hebûna xwe dupat kirîye û bi rêya çiqa xwe ya çekdar, berpirsiyê wek polise ser milê xwe girtîye. Herwisa ev partîyê ji ber rêxistina xwe yabihêz, bipergal bûn û dewlemenî ya xwe, hatûçûn di nava bajar da kontrol dike û herwisa pêdiviyê serekî wek sotemenî, benzîn û ar ji xelkê re pêşkêş dike. Kurdek Sûriyeyî di hewlîrê da dibêje, “Ev bersiva giş pêdiviyê xelkê diden. Bo mînakdi di taxa Şêyx Meqsûd û Eşrefîya Helebê (ku bi pirranî Kurdin), dermanxane û amûrê bijîskî xistine berdestê xwe”.⁹³

Herwek hate dîtin, PYD ku rêxistinek siyasî ye wek nûnerê Kurdên Sûriyeyê , ji meşrûtiyeta navnetewî bêpare. Endamek KNC ê ku di hevdîtina Hewlîrê di meha tebaxê 2012 an da besdar bû û di vê hevdîtinê da wezîrê karûbarê derveyê Tirkîyê nexwast ku gel PYD ê hevdîtinê saz bike, dibêje, “Davutoglu tenê dixwast gel KNCê hevdîtinê saz bike. Lê ci alîyek ji wan bû hevdîtinê amade nebûn. Hember nîrîna Tirkîyê, PYD her PKK e ye, lê gel rejîmê jî pêwendîyê vê hebne. Lê ji alîyê dî, PYD, têkilîya Tirkîyê di nava Sûriyeyê da berçav dizanî [û gel vê dijbere]”.⁹⁴ Hevserokê PYDê Salih Muslim dibêje: “Dema ku Davutoglû hate hewlîrê, em jî livê bûn, lê wî nexwast me bibîne. Bi nîrîna me, eger ev amade bin ku me nas bikin û mafê Kurdan bipejirînin, gengaz bû ku em gel wan rûniştinek saz biken. Lê hinek esas di meydanê dane û naskirina mafê Kurdan yek ji wan esasa ne”. Muslim li ser SNC yê ji axivî û got, tevî ku em bi hevpeyivîna di gel ev komê keyfxweş bûn, lê ev komê – “ku bin bandora Tirkîyê da dixebite” – di bilavokê xwe da ji PKKê re gotîye “rêxistineke terorîstî”, tîsta ku PYD vê napejirîne.⁹⁵

⁹² Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 12ê Îlona 2012 an.

⁹³ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 13ê Îlona 2012 an.

⁹⁴ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Endamê KNCê, Hewlîr, 10ê Îlona 2012 an.

⁹⁵ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 10ê Îlona 2012 an.

IV. Dijberîyê Heremî

A. Barzani wek navbeynkerek berjewendîxwaz

Barzanî û KDPa wî li hember pevçûnê Sûryeyê helwest girtin û çavkanîyê xwe, hêza xwe ya çekdarî û meşrûtiyeya navnetewî ya KRG ê bo destek dan û herwisa bandor xwe li ser KNC yê, bikar anîn.⁹⁶ Di şubata 2012 an da, Barzanî mîvendarê KNC yê di Hewlîrê da bû, û ji wan re alîkarîyê çekdarî û malî pêşkêş kirin – û eve xwe peyamek zelal bo ji bûna rejîma Esed û mixalifê Sûriyeyî , û herwisa bo PYDê, ku KRG ê di bûyerê Sûriyeyê da bibandorre û dibe KNC ji bê dîtin.

Dijberî ya di nava KNCê û PYDê da sîtava dijberiyek mezintire di navbera KDPê û PKKê li ser serokatîya Kûrdêñ ñar parç ye, û sembolek ji ramanê dîrokî yê pan-Kurdî yê PKKê û serketinê dawî yê Barzanî di berfereh kirina xweserîya Kurdistanê di Eraqê da ye. Ev bizavane du modelê serekî ji netewperestîya Kurdî û herwiha du mînakê dijber bû rûbirû bûn gel dewleta Tirkâ destnîsan diken. ji ber ku sînorê dewleta Tirk di navê pişkek mezin ji erdê ku Kurd welatê xwe yê dirokî dizanin û rîya derbas bûna tekberhemâ KRG ê ji bo bazarê Rojava, da derbas dibe. PKK pê bikar anîna şerê çekdar hember Tirkîyê, xebitîye ku Enquerê neçar bike ku mafê çandî û sîyasîyê Kurdan zêdetir bike, di berevajî yê da, KDP, pê bikar anîna bandora xwe di Hikometa Herema Kurdistan(KRG), di ev salê dawîyê da xebatê mezin kirine ku pê çê kirina pêwendîyê abûrî û sîyasî gel dewleta Tirkâ taku girêdayî bûna xwe gel dewleta Bexdayê kîmtir bike.⁹⁷

Hember piştgirîyên siyasi û diplomatîk yê dewleta Tirk, KRG ê di pevçûnê dij bi PKKê re alîkarîyê dide Enquerê. Xalaka balkeş eve ku li hember ûrişê hewayî dij bi kempê PKKê di çiyayê Qendîlê da ev partîye bêdeng maye, û barzanî ne tenê ji ber piştvanî nekirina birayê xwe yê Kurd belke ji ber şermezar kirina PKKê ji ber bi kar anîna çeka, rastî rexneya hatîye. Mehmûd Osman ue ji nûnerê serbixwe di parlemana Eraqê da dibêje: “Barzanî bin bandora Tirkîyê daye, ev êrişê PKK ê şermezar dike lê êrişê Tirkâ nabîne, û ji PKKê dixwazê ku çeka danêñ lê ji Tirkîyê re nabêjê ku pevçûnê xwe di başûrê rojhilatê ravestînin”.⁹⁸ Ji ber vê Ocelan û Barzanî li ser mijara Tirkîyê tam di dijberî hev dane; ev dijberîye li ser dil û mîjîyê giş civaka Kurda ne.⁹⁹

Li gor nêrinê KDP, pêwendîyê nêz digel Enquerê, ev gengazîyê dide tevgera wan ku rolek bilind ya sîyasî di hemî heremêñ Kurdan da li ser istu bigrî, û barzanî bike serokê hemî Kurdan. Li gor nêrinê KDPê, rewşa guncav eve ku helweşana Esed ji

⁹⁶ Teví ku KDPa Barzanî sîyaseta KRG ê hember Kûrdêñ Sûriyeyî birêve dibe, lê ev kiryarê bi hevrîziya PUKa Calal Talibânî bicî tîne. Bo mînak di dema hevdîtina wezîrê karûbarê derveyê Tirak li Hewlîrê di Tabaxa 2012 an da, yek ji rayedarê ev partîye ji besar bû. Yek ji endamê navenad sîyasî ya PUKê dibêje, “em piştgirîya Kûrdêñ Sûriyeyê dikin. Ev dawîyê da me gel KDP hevdîtin saz kirîye u mijara piştgirîya Kûrdêñ Sûriyeyê dupat kirîye”. Hevpeyivîna Koma Kirizê, Hewlîr, 9ê kanûna duyema 2013an.

⁹⁷ Ji bû piştxanê taybet bi yekbûna abûrî di navber Barzanî û Tirkîye da, bi taybet ki ser veberanînê li ser navt û gazê, Binêrin ji Rapora hejmara 120a Koma Qeyranzê, Rojhilata Navîn, *Eraq û Kurd: Biazva Hisyara Hidrokerbonêñ pir- metirsî*, 19ê Nîsana 2012 an; li ser rîznama PKKê di Tirkîyê da, Binêrin ji Rapora Koma Kirizê, *Tirkîye: PKK û Çaresesîya pirsgirêka Kurd*, herev.

⁹⁸ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Bagdad, 4 İlona 2012.

⁹⁹ Hevpeymanîyê bi wî rengî ne bûyerek nû ye. Bo mînak di sala 1997, nêzî 25,000 heya 50,000 serbazê Tirk di Kurdistanâ Eraqê da êrişî PKKê kirin. Gelek guman hene ku zelal diken ku Barzanîji Enquerê daxwaza êrişê kir bû. Ji ber ku KDPê û PUKê mijûlî şerrê xwemalî bûn û PKKê alîkarîya PUK dikir. Binêrin ji Brus Medy-Witzmen, *Lêkolîna Rojhilata Navîna hevdemî*, pirtûka. 21, 11 Novambera 1999an, r. 384.

Sûriyeyê re ev iznê bide ku ji modela Eraqê zarî bike, û desthilatdarîya Kurdan bi serokatîya Barzanî di giş herema da zêde bike. Rayedareke KDPê dibêje:

Barzanî dewletek radestî Kurdan kir, lê PKKê ev nekir. Em dixwazin pirsgirêka Kurdan bi rêya aştîyane çareser biken, û dixwazin mafê Kurdan di her parçeyekê bi rêya aştîyane bê nas kîrin. Herwisa em dixwazin kesen dî ji serpêhatîyê me mifa werbigrin. PKK nikare bandork wek me ku me [di Eraqê da] da heye [di Tirkîyê] da hebe. Me tiştek wek dewletê heye û gelek serpêhatîyê erînî qazanc kirine. PKK pê radikal bûn xwe bê encame. Dîplomasî stratijîyek hêja bo guhestina şola ne.¹⁰⁰

Hêjayî gotinêye ku, Barzanî dixwaze di nêz da civînek panKurdî di Hewlîrê da birêve bibe, û demek dirêje ku li ser ev projeyê kar dike û ev kare gengaze bibe sedema bîhêz bûna bandora KDP ê di nava Kurdan da û wî bike alahilgirê Kurdan.¹⁰¹

Zêdetir ji vê, armanca KDPê ji alîkarî kîrin gel Enquerê eve ku, xwe wek camêrek di nava Kurdên Tirkîyê da bide nas kîrin û alîkarîya pirsgirêka Kurdan bike.¹⁰² Feleh Mistafa, ku serokê rêvebirîya pêwendîyê derveyê KRG ê ye, besdar bûna Barzanî di civîna AK partîyê – anku partîya desthilat dar di Tirkîyê da – di Îlona 2012 an da ku di Enqere birêve diçû “pêngavek dîrokî” beng kir û got: “Li gor nêrîna me Erdogan sîyasetek rast hember pirsgirêka Kurdan dimeşîne. Wexta ku Tirkîyê hebûna Kurdan inkar dikir, bi dawî hatîye”.¹⁰³

Ev guherrîne di navbera pêwendîyê Kurdên Eraqê û Tirkîyê gelek balkêše. Heta pênc salên pêş, KRG û Tirkîye dijminê sondxwarî bûn û li ser mijareê wek, kempê PKKê di Herema Kurdistanâ Eraqê, xebata KRG ê bo serbixweyê ya abûrî û sîyasî ji Eraqê û idiyê wê li ser Kerkûkê, dijberîya hev dikirin û hev tawanbar dikirin. Lê bi derbas bûna demê, Enquerê pêvajoyek nû hember ciranê xwe û bi taybet Kurdên Eraqê destpê kir. Hevdem gel aloziyê di navbera Enqere û Bexdayê,¹⁰⁴ saz bûna pêwendîyê di navbera Tirkîyê û heremê Kuristanê, giş pirsgirêkê balkeş, bi taybet Enerjî, xistine bin siya xwe û bû sedema yekbûna abûrî ya herdu yan. Bûyerîn Sûriyeyê ji herwisa bûne sedema, nêzîk bûna Enquerê û Hewlîrê, ji ber ku herdu hêvîya helweşana rejîmê dîkin û herdu ji bandor PKKê ditîrsin. Di vê demê da wisa xûya dike, ku ev mijare bûye sedema dûr çûna Tirkîyê ji gumanê xirab hember mebestê barzanî, ku demek dirêj wisa difikirî ku gengazê Barzanî valahîya desthilatdarîyê di bakûrê Sûriyeyê da bikar bînî û heremek dî yê serbixwe bo Kurdan, damezrînî.

¹⁰⁰ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hemîd Derbandi, birêvebir, navenad pêwendîyê giştî, navenda serokatîyê, Hewlîr, 3ê Oktobera 2012 an.

¹⁰¹ Kemal Kerkûkî, endamê KDP, serokê berê yê parlîmana Kurdistanê, di Hewlîrê da got, “ev konferanse pêngavek girig bo ûlan kirina xwasteyê Kurdan ji xelkê cihanê re ye”. Rapora Koma Qeyranê, Hewlîr, 7ê Oktobera 2012 an.

¹⁰² Rayedareke KDP ê got “Pêdivîye Tirkîye pirsgirêka Kurdan çareser bike û gel PKKê aştîyê bike. Barzanî pê Kurdî axavtina xwe di konferansa AK partîyê da, işaret şandin. Ev hatibû ku di navbera Kurd û Tirkîye pêwendîyê girê bide û alîkarîyê bide hevpeyivîne di navbera Tirkîyê û PKKê”. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Hemîd Derbendî, Hewlîr, 3ê Oktobera 2012 an. Kemal Kerkûkî dibêje, “Erdogan pêngavê balkeş ji bo çareser kirina pirsgirêka Kurdan di Tirkîyê da rakirine. Tirkîye dikare çareser kirina pirsa Kurdan bi rêya aştîyanê, bidomîne, û em [KDP] ji bo aştîyê da nava Tirkîyê da her xebatekê ku bikarin, tê encam biden”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 7ê Oktobera 2012 an.

¹⁰³ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 6ê Oktobera 2012 an.

¹⁰⁴ Pêwendîyê di navbera Tirkîye û Eraqê, bi giştî di bin bandora xiraba, pêwendîyê şaxsî yê di navber serokwezire ev du welate anku Erdogan û Malîkî da ye. Yekim zîrar li ser ev pêwendîyê, şasfêm kirina piştîvanîya Tirkîyê ji Eyad Elavî bo şûngirîya Malîkî paş helbijartinê Adara 2010 an da, çê bû. Rapora Koma Kirîzê, Biazva Hişyara Hidrokerbonê pir- metirsî, herev.

Lê helwestê Enquerê û Hewlîrê di hember PYD ê ciyawazin. Jî ber ku barzanî naxwazî xwe têkilî şerî birakuji yê di nava Kurdan da bike, û ji ber bihêvî bûna bergîriya pevçûnê yekser di navbera çığa çekdar ya PYDê û Tirkîyê, û ji ber metirsîya alozter bûna pêwendîyê lawaz di navbera KRGê û PKKê di Eraqê da û herwiha ji ber ku dixweze wêneya xwe di nava Kurdên heremên da baştir bike, ew xebitîye ku yekîtiyek da navbera KNC ê û PYD ê da damezrînî. Pêvajoya serokê KRG ê, rola wî ya dijwar nîşa dide ku dixwaze hevsengîyek saz bike û berî ji PYD ê bigre û gengaz e ku vê ji piştîvanê vê yê kevn anko PKKê vejetîne. Di rastîyê da armanca wî han dana PYD bo bêcek bûn ye, û dixebite ku PYD bike partîyek sîyasî, û dixwaze pey vê xebatê pêwendîyê di navbera PYDê û PKKê qut bike.¹⁰⁵

Daxwaza Barzanî ji bo saz kirina pêwendîya gel PYDê, ev partî di hember Enquerê da bihêztir kirî ye. Ev xebata Barzanî dikare rewşekê saz bike ku, rê bo hevpeyivîna yekser dinavbera PYD ê û Tirkîyê saf bibe, bo mînak li ser ewlehiya sinoran. Hemî Derbendî, rêvebirê pêwendîyê giştî. Navenda serokatîya KRGê, ev gengazîyê wisan dinirxîne: “Em dizanin ji ber ci Wezîrê karûbarê derive yê Tirkîyê, hevdîtina gel PYDê nepejirand. Bi raya min ev mijare tiştek sîrîstîye. Ev ji zêde bûna bandora PKKê di wê heremî da ditirsin. Û herwisa dijayedîya gel yekîtiya axa Tirkîyê li dij nêrînê me ji tê hisab. KRGê dikare rolek erêni di saz kirina pêwendîyê di navbera Kurdên Sûriyeyê û Tirkîyê”.¹⁰⁶ Gengaze di domandine ev rîyê da, û bi hebûna derfetekê Barzanî bixwaze navbeynakarîya di navbera PKKê û Tirkîyê ji bike.¹⁰⁷

Xebata yekim ya barzanî bû aştîya di navbera du Kurdê Sûrî, bêencam bû. Di dema damezrandina KNCê di Oktobera 2011an, PYDê daxwaza besdar bûnê red kir û nepejirand ku giş partîya bi qasî hev di KNCê da nûner hebin.¹⁰⁸ Bi nêrîna PYDê bêwate bu ku ev bixwaze bibe yek ji hevdeh partîyê di bi sîbera barzanî, ji ber ku xwe amûrek bo pêşve birina rojeva xwe di Sûriyeyê da hebo. Ev partîye ji ber ku hemberîya Barzanî bike, Encûmena Gelê Rojavayê Kurdistanê (PCWK) wek rêxistinêk di hember KNCê da, damezrand.

Paşan , di 11ê Hezîrana 2012 an da, Barzanî bo nevbeynkerê lihev kirinek heft xalî di navbera KNCê û PYD da. Ev pilane ji damezrandina Komîteyek hevpar bo hevrêz kirina xebatê sîyasî û çareser kirina aloziya di heremên Kurdên Sûriyeyê da, bi dawî anîna hebûna hêzên çekdar û ravestandina bangeşa dij bi hevê pêk hatibû.¹⁰⁹

¹⁰⁵ KDP ji bo han dana PYD bo vejetîna ji PKK re, dixebeit ku rênânameyek ji bo Kurdên Sûriyeyê dabîn bike û bi wî awayî bin sîya Barzanî da gel KNCê alîkarî bike, yek ji rayedare KRGê dibêje, “Ev tam dikarin wek BDP bin, û bi serxweyî di parlemana Tirkîyê da dixebat. Giş kes ji ev guherrtinê bi mifa dibe”. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Hemî Darbandi, rêvebirê pêwendîyê giştî. Navenda serokatîya KRGê, Hewlîr, 3ê Oktobera 2012 an. (BDP anku Partîya Aşti û Demokrasiyê, ku partîye sîyasî ya Kurdên Tirkîyê ye) Rayedarek dî yê KRG ê wisan dinêje: “Dibe em gel endamê neradikalê yê BDP ê hevpeyivîn bikin û bi wî awayî ev şerri bi dawî bînin. Em dikarin heremê Kurdên Sûriyeyê biken welatek ewle. Lê dibe giş partî alîkarî bikin”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Feleh Mistafa, rêvebirê navenda pêwendîyê derive yê KRGê, Hewlîr, 6ê Oktobera 2012 an.

¹⁰⁶ Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Hewlîr, 3ê Oktobera 2012 an.

¹⁰⁷ Binîrin ji Bûltene Cihanê, 22ê Adara 2012 an.

¹⁰⁸ Rayedarek PYDê nêrînek cuda dibêje: “Mercen bo besdar bûn di nava KNCê da ev bû ku dibe encûmen bi dengê gel bê bijartin. Me dixwast KNC bijartî be ne wezifedarkirî be û nedemkratîk be. KNCê ev merece qebûl nedikir ji ber ko wan dizanî PYD bi pirraniya denga tê bidest bînî û bibe serokê KNCê The.” Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Alan Semo, 1ê Hizîrana 2012 an.

¹⁰⁹ Heft xal pêk têni ji: (1) Saz kirina Desteya Bilind ji herdu encûmena bo hevrêz kirina xebatê sîyasî û diplomatîk herwiha ji bo sazkirina projeyeke siyasî ya yekbûyî ... li ser nirxên niştimanî û netewî yêng le kurd li Sûriyê û jibo xebata ligel hemû parçeyen gelê sûrî ji bo herifandina rejîm a sitemkar û zordar di Demîşqê da, û ji bo avakirina Sûriya demokrat ligor destûreke nû ku plûralîzma netewî dipejirîne û hebûna gelê kurd û mafêñ wîyêñ etnîkî-netewî li gor peyman û belgeyêñ navnetewî di

Lê bi her awayekî ev lihev kirine nehate cîbicî kirin,¹¹⁰ û mehek dî, Barzanî disan xebitî, û wek xûya ev carê serketinek mezintir bidest anî. di 11ê Tîrmehê da, hervek di serî da hate bas kirin, herdû alîyan Peymana Hewlîrê imaz kirin û li gor vê berpirs bûn ku di qonaxa derbasbûnê da dewletek hevpar di heremê Kurdan di Sûriyeyê da, di bin sîya Desteya Kurdî ya Bilind (SKC) da pêk bînin, desteyek ku ji deh endam-pênc kes ji her alî- û sê komîteyê jêrîn bo pirsgirêkê ewlehîyê, pêwendîyê derive û xizmet danê, pêk hatîye.¹¹¹

Damezrandia SKC, pêngava yekim di navbirina gumanêñ dij bi hevin. Lê, herwek zû berçav bû, pirsgirêk niha jî berdewamin. Ev pirsgirêkene ji giş mijara zêdetir li ser ewlehîyê berçav in, ji bûna hebûna YPGê û perwerede kirina şerrvana ji alîyê KDPê ve. Di danûstandinê dura dî, wek danûstandinê Jenevê di sawî ya mehaîlonê da, pirsgirêka ewlehîyê ji hemîyan berçavtir bû. Li gor mercen lihev kirinê, PYD dibî ji destihaldarîya xwe li ser hêzên çekdar dest bikişîne û di damezrandina Lijneya Ewlehîya Hevpar da (Lijnat el-Emn El-Muştarika) ku pêkhatî ji pênc endamê PYD û pênc endamê KNC û herwiha di damezrandia Hêzên Hevpar da (Quwa Muştarika) ku ev jî pêkhatîye ji YPGê û şerrvanên Kurdên Sûrî, perwerde bûyî ji alîyê KDPê, alîkarîyê bike. Lijneya ewlehîyê û hêzên ewlehîyê dibe bin nêrîna SKCê da bibana, lê YPGê izna hatinê neda şarwanê perwerde bûyî ji alîyê KDPê di kempê bakûra Eraqê da, ku bikevine nava Sûriyeyê. serokek PYDê dibêje, “YPGê iznê nade ku çi çekdarê perwerde bûyî ji alîyê KDPê û Pêşmerge bikevina nava Sûriyeyê. ji ber ku hatina wan tê bibe sebeba şerê xwemalî”.¹¹²

Aga bûna her dû alîyan ji kêmâsiyê xwe, ji xebatê bo lihevkirinê re alîkarî dide. PYDê ji alîyê xwemalî bihêzê lê li heremê da lawaze; KNCê ji alîyê xwemalî û hêzên çekdar, lawaze. Eane metirsîyê havpar ji hene ev ji gengaziya serketina targalek nû di Sûriyeyê da û kû ji mafê Kurdan re bêbaldarî bî, û nîşana ev metirsîyê ji bêbaldarîya dijberên Sûriyeyî ji naskirina berçava mafêñ Kurda ne.

destûrê de bêñ pejirandin, û çareserkirina pirsa kurdî di çarçoveyek demokratîk da. (2) Sazkirina desteyeke bilind ya hevbes ji bo hevrêz kirina kiryarê meydanî di nav hemû hereman da. (3) Sazkirina komîteyê jêrîn ya hevbes ji bo hevrêz kirina kiryarê meydanî di nav hemû hereman da. (4) Dupatkirina bidawîkirina hemû rengên kampanyayê ragehandinê [gengazi dij bi]. (5) Qedexekirina zordariyê û redkirina hemû kiryarênu ku rewşê li herêmên kurdî nexweş dikan. (6) Sazkirina komîteyê hevbes û bêçek ji bo parastinê (7) Sazkirina komîteyê hevbes bo çareserkirina pirsgirêkê civakî. Ev komîtene dibin di ev mijarane da yê herî bilin bin”. Rûnivîsek ji: www.kurdwatch.org/pdf/kurdwatch_Do27_en_ar.pdf.

¹¹⁰ Hemberî nêrîna Welîd şexo, nûnerek ji Partîya Azadî di Ewrûp da, peymana 11ê Hizérana bêencam bûye: “ji ber ku PYD ev peymanê cîbicî nakek û xebatê xwe wek girtina çalakvana û işkence kirina Kurdan, êriş li ser malê xelkê û kuştina xelkê bê guneh didomîne”. Alan Simo, nûnerê karûbarê derveyê PYDê, gel ev nêrînê mixalife û dibêje li gor nêrîna wî, pirsgirêka serekî ev bû ku hemû partîyen Kurdan ev peymane imza nekiri bûn, wî pê biranîna peymana 11ê Temûzê ya Hewlîr destnîşan kir, “cihê hêvî yê ye ku ev carê hemû besdar bûn û hemî ya jî ev imza kirin. Berî niha hinek partîyê Kurdan, qebûl nedikirin ku gel PYDê peymanê girê bidin”. Herdu gotin ji *Rudaw hatine girtin*, 17ê Temûza 2012 an.

¹¹¹ Di peymana nû da, Encûmena Niştimanî ya Kurdi li Sûriyê û Encûmena Gel ya Rojavayê Kurdistanê (PCWK) (anku PYD) Peymana Hewlîrê dipejirîn xwe li ser bicî anîna vê berpirs dizanî; Desteya Bilind ya hevbes bo serokaftîya gelê Kurd di Sûriyeyê da saz bikin; komîteyek hevbes bo çareserkirina pirsgirêkê civakî sazbiken; bidawîkirina hemû rengên kampanyayê ragehandinî dupat kirin; hemû kiryarênu zordariyê ku rewşê li herêmên kurdî nexweş bike qedexe kirin. Binêrin ji www.kurdwatch.org/index.php?aid=2594&z=en&cure=245. Belgeya Peymana Hewlîr di www.kurdwatch.org/pdf/KurdWatch_Do31_en_ar.pdf. ê da, hatîye weşandin.

¹¹² Hevpeyînâ Koma Qeyranê, Asia Abdulah, hevrêverberê PYDê, Jeneva, 26ê ïlona 2012 an.

Niha, astengîya her balkeş li hember têgehîna û lihevkirina Kuradan ev YPG dibî damezrandina hêzên çekdar yê hevbeş bipejirînî, lê ev komê serokê taybet bixwe hene û bi giştî di bin biryarê PYD ê da nînin. PYDê du rêtê gengaz pêşnîyar kirine: YPG bikevîte bin destê SKC ê lê, di hember da, SKCê berpirsiya ewlehîyê di heremên Kurdî yên Sûriyryê da tenê pêşkêşî YPG ê bike; ya duyê, YPG dikarî servanê perwerde bûyi ji alîyê KDPê ve bêxe bi destê xwe. Ne pêşniyar yekim ji alîyê KNC yan KDP ê ve hat pejirandin ne jî ya duyê. Rayedarek KNCê dibêje ku YPG ya dibê bêçek be yan bikeve bin destê SKCê.¹¹³ aloziya ser pirsgirêkê ewlehîyê bandor xistîye ser mijarê dî jî. Bo mînak, PYDê daxwaza damezrandina desteya pêwendîyê derve kîrîyê, ji ber ku ji alîyê navnetewî lawaze û bi destanîna rewayîyê (meşrûtîyetê) pêdivî bi alîkarîya SKC ê heye. Lê KNC dibêje heyâ pirsgirêka YPGê neyê çareser kirin, em jî ev daxwazê qebûl nakin.

Di encamê da, bêbawabarî her berdewam e. Iî gor nêrînê KNCê, PYD niha ji gelekî nêzî PKKê ye û pêwendîyê reş gel rejîma Sûrî û Iranê heye. Rayedarek KNCê dibêje, “ew herdem gel serokên PKKê bi telefonê pêwendîyê digrin. Birryara dawî di qendîlê tê standin”.¹¹⁴ Endamek dî yê KNCê dibêje: “Heke ev pêwendî yê xwe gel PKKê qut biken, êdî çek û alîkarîyê malî ji wan re nayê û bi lez tê bibine partîyek biçûk”.¹¹⁵ KNC herwiha ji ber navendibûna herî zêde û biryar standian serhişk ji PYDê rexne dike, ji ber ku ev mijare cihê danûstadinê teng dike û dibe sedema redkirina beşkirina desthilatdarîyê û yan parvekirina mijarê ewlehîyê yek ji rayedarê KNCê dibêje. “Lihevkirina gel wan birr bi dijwarîye, gelek caran kesê ku têb bû danûstandina bê desthilatin û herwiha berçave ku ew dixwazin bi tenê xebat bikin.”¹¹⁶

PYD ji idia dike ku KNC, gelek bêpergal, bê encame û di heremên Kurdî da bê pişîvane. Rayedarek PYDê dibêje, “hinek ev partîyane bi giştî 40 endam çinînî û giş ji malbetek mezinin ku tenê di taxekê da bandor hene, em dixwazin gel wan lihev bikin lê ev bêpergalin”.¹¹⁷

Bi giştî, ne PYD û KNC – ne heyâ partîyê besdarî KNCê jî – nêrînek hevbeş li ser rola Kurdan di Sûriyeya paş Ased da çinînî. Tevî ko kijan ji wan dewletek serbixwe ji Kurdan re naxwazin, lê hevparîya wan her ev qase. Alîgirê Barzanî di KNCê da pişîvanîya pergala federalîyê wek modela serpêhatîyê Eraqê diken.¹¹⁸ Lê alîgir Talebanî daxwaza Sûriyeyej demokratîk hember mafê hevwelatîyê diken li gel kêmek

¹¹³ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Ahmed Sileyman, endamê KNCê, Hewlêr, 12 Îlona 2012.

¹¹⁴ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Endamê KNCê, Hewlêr, 12ê Îlona 2012 an.

¹¹⁵ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlêr, 13ê Îlona 2012 an.

¹¹⁶ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlêr, 12ê Îlona 2012 an.

¹¹⁷ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlêr, 12ê Îlona 2012 an.

¹¹⁸ Hember vê nêrînê, herema Kurdistanê beşek ji Sûriya federale ku di nav da civakê serekî (Dirozî, Elewî, Kiristîyen, hwd.) mafê damezrandina herema federala xwe hebin, û dewleta navendî desthilat darîya xwe gel wan par biket. Kesayetîyê netewî û olî esasa pêşerojê Sûriyê ne herwek ku kesayetîya Eraqa paş 2003 yan pêk anîn. Herema Kurdan ji Efrînê di bakûrê rojava da destpê dike û heya Dêrikê di bakûrê rojhîlat da didome û qamişlo paytext û cihê hikometê ye. Tevî ku hev hereme yekgirîfî nîn, lê Abdilhekîm Beşar, serokê PDKSê ku alîgirê barzanîye, dibêje, “ev ramane damezrandina heremek bi pirranî kurd li ber digri ku di nav da kîmanî para xwe hem di hikometa heremî da û hem jî di encûmena bajarê serekî da tê bîdest bîne. Para her komekê tê hember hejmara xelkê vê bê zelal kirin. Bo mînak, eger di Qamişlo da Ereb ji sedî 15 bin, para wan di encûmena Qamişloyê da jî tê ji sedî 15 be. ’s. [bi gotinek dî,] di bazarê tevlihev da , gengaze me rewşek wek Kerkûkê hebî. Û sinorek heremê Kurdan ji welat cuda bike”. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Hewlêr, 13ê Îlona 2012 an.

serbixweyî ji bo Kurdan.¹¹⁹ PYD, durişma Ocalan, anku “serbixweyiya demokratik” anji “xwe-reveberiya demokratik” di heremê Kurdî yê Sûriyeyê da ûlan dike.¹²⁰

Li gel hebûna ev astengîyane ji, Barzanî xebatê xwe bo serketina peymana di navbera KNCê û PYDê da didomîne. Wî hevrêyî ya xwe gel PYDê zêdetir kirine, û dixwaze rola wê di SKC ê dabihêz bike û di encam da rola KDPê wek piştivanê ev peymanê bibandor bike. Hevdem, berpirsê KDPê gel endamê neradikal yê PYDê gotûbêj kirine heya ku wan han biden ku xalê peymana Hewlîrê bicî bîne. Rayedarê KDPê ku xwe besdarî gotûbêja bûye dibêje:

Heke hûn yekîti saz nekin, hûn nikarin ji armancê xwe re bigehin. Em ji gel ev endamê PYDê gotûbêj diken ku pragmatîstin ne kesê radikal, û em wan han diden ku gel KNCê hevrêz bin. Dem derbas dibe. Yekbûna Kurdên Sûriyeyê gelekî giringe û dibe ev xwastekê xwe zelal biken û gel mixalifê Sûriyeyî li ser wan baxivin. Kurdên Sûriyeyê dibe xwastekê xwe zelal biken, pêş ku dem derbas bibe.¹²¹

Endamek dî yê KDPê dibêje:

Hinek endamê PYDê hene ku gel wan gotûbêj tê kirin. Tişa ku dibe ew destpêkê bal bikşîne ser, berjewendiyêndi Kurdên welatê xwe [Sûriye] ye. Niha dema vê ye ku ev ji Çiya bêne xwar anku şerrê çekdarî [dij bi Tirkîyê] bi dawî bînin u bikevine nava sîyasetê. Dema şerrê çekdarî ji Kurdan re derbas bûye. For the Kurds, the era of armed struggle has ended.¹²²

Di 22ê Novembera 2012 an, Barzanî di Hewlîrê da gel SKCê hevdîtinek pêk anî hey gel wan li ser damezrandina “arteşa Kurdî ya yekbûyî” (ceyş kurdi muwahhad), ku pêk hatîye ji YPGê û şerrvanên Kurdên Sûrî ku ji alîyê Barzanî ve hatine perwerde kirin, “ji bo parastin û rizgarîya gelê Kurd di Sûriyeyê da” gotûbêj bike,¹²³ lê serkevtî nebû. Rayedarek PYD dibêje Kurdên Sûriyeyê ku di Kurdistanâra Eraqê da perwerdehiya çekdarî dîtine, tenê pê izna SKCê (ku PYDê nîviya kursiyê vê di dest dane) û alîkarî kirin hel YPGê, dikarin bikevin nava heremê Kurdî yê Sûriyê. herwisa dibêje: “Ev niha nikarin bikevin nav welat ji ber ku hê desteyê birryar xwe zelal nekirîye, û eger ev bixwe

¹¹⁹ Ehmed Silêman serokê Partiya Demokrata Pêşverû ya Kurdistanê ku alîgirê Talibanîye bas dike ku pirsgirêka Kurdan di sûriyê da pê damzrandina dewletk demokratik hember mafê hevwelatîyê çareser dibe, dewletek navendî ku mafê Kurdan nas bike û Kurdan di nav da rolek bibandor hebî. Û heremên Kurdan tê serbixweyîk bêsinor hebî. Ew bi berçavî ferderalismê ji bo Sûriyeyê nehêja dizanî û vê red dik: “projeya heremek federal ji cografia Sûriyê da bêancame. Bi hezaran Kurd di heleb û Demîşqê da dijîn. Hesa min weye kesê bas li federalismê diken pey berjewendî yê xwe ne nas kirina mafê Kurdan di Sûriyê da. dema ez time, nizanim gel mexzenek pir av çi bikem, piyalek av bese”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 11ê Îlona 2012 an.

¹²⁰ Li gor nêrîna Sinam Muhamad, hevserokê Encûmena Gel ya Rojavayê Kurdistanê ku alîgirê PYD ye, çareserîka pirsgirêka Kurdan di Sûriyeyê da çareserîya demokratike. Alîgirê ev ramanê damezrandina sinor di navbera heremê welat da qebûl nakin û dixwazin cudahîyê netewî di navbera Kurdan û Ereban bêna kirin. Her bajarek Kurdî tê encûmena bilind ya Kurdî birêxistin bike heya rêxistinê xweser yê heremî bê damezrandin û di hember Encûmena Gel ya Rojavayê Kurdistanê, ku 300 endamê vê heye û beşe zagon danîn û rêvebirî û dadyarî heye, da berpirs bî. Di heremê tevilîhev da Ereba ji dikarin encûmenê xwe pêk bînin û bi rabêj gel encûmenê Kurdî besdarî mijara bin. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 11ê Îlona 2012 an.

¹²¹ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Kemal Kerkûkî, rayedarê KDPê, Hewlîr, 7ê Oktobera 2012 an.

¹²² Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hemîd Derbendî, rêvebirî pêwendîyê giştî, navenda serokatîya KRGê, Hewlîr, 3ê Oktobera 2012 an.

¹²³ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Baradost Azizi, rojnamevanê Kurdê Sûrî, Hewlîr, 26ê Novembera 2012 an.

ev birryarê bigrin dê astengîyê mezin bêne pêş.”¹²⁴ Rayedarek KNCê rastîya ev rewşê dupat dike û dibêje PYD ïznê nadê; û tevî ku di Hewlêrê da ev mijare dipejirandin lê her zivirrêne Sûriyeyê, birryara wan guherri; û bi her awayekî berpirsî yê xwe bi çî naynin. Wî got, “pê vê rewşê, eger yek ji pêşmergeyn Sûrî [şervanê perwerde bûyî] bixwazî ku bikeve nava Sûriyeyê, tê ligel YPG bi şer bê”.¹²⁵

Kilîla her lihevkirinek dawî, yebûn li ser ev pirsgirêkê ye ku ci kesek hem bi fermî û hem bi bandor desthilatdarîya hêzê çekdar bi dest bînî û ev hêzenê di ci beşek di Kurdistana Sûrî da û hember ci rîznameyek ïzna xebitînê hene. KDP li ser bi bandor kirina alîgirê barzanî di KNCê da – Yekîtiya Siyâsî ya demokratîk ya Kurdistan-dixebite û han dide ku modelek federalîsm di Sûriyeyê da pêk bîne.¹²⁶ Lê di dawîyê da, gengaze bixebite lihevkirinek ser konfederalîsmek Kurdî di Sûriyê da damezrîne ku hember vê her ba parêzgehek Kûrdî di Sûriyê da xwe birêve bibe. Ev pilane federalîsma KDPê gel “xweserîya demokratîk” ya PYDê tevlîhev dike û gengaze bibe sedema cudahîya Kurdistan Sûriyeyê û Efrîn di bakûrê rojava da bikeve dest PYDê û herema Cizîre, ku nêzî sinorê Eraqê ye bikeve dest KNCê (anku di rastîye da bikeve dest KRGê).¹²⁷

B. Tirkîye hatê meydanê

Siyaset Tirkîye li hember Kurdên Sûriyeyê dibî da nava çarçeweya beşdarbûna vê di nava pevçûnê Sûriyeyê bi rewşek berfireh û herwisa çar dehan pevçûn gel PKKê da bê fêmkirin ku bûye sedema mirina nêzî 30,000 kesî û herwisa xercek nêzî \$300 milyara.¹²⁸

Enquerê rolek serekî di perwerde kirin û piştgirya dan ji mixalifê Sûriyeyê re li ser stu girtîye. Bi taybet alîkarî dan ji Encûmena Nişîmanî ya Sûriyeyê (pêş ku di meha Novembera 2012 an da gel Yekîtiya Nişîmanî ya Sûriyeyê bê guherrîn), ku di Stenbolê da hat damezrandin û her di livê da rûnişt, herwisa alîkarî dan ji Artêsa Azad ya Sûriyeyê, ku komek çekadrê bêpergalin ku navena rêvebirîya wan di di başûrê rojhilate Tirkîye da rûniştiye. Heke ku Tirkîye dixwaze bi berferehî li ser bûyerê Sûriyê bandor hebî, herwisa ev bûyerane jî li ser Tirkîye bandorê hene: wek zêde bûna penaberan; bombekirina sinor; û, tişa ku gel ev raporê pêwendî heye, anku tirsa li ser vê ku PKK ev derfetê bo bihêz kirina xebatê xwe di herdu welatan da bikar bîne.

Bi nêrîna Enquerê, PYD rûnivîsek ji PKK ye ku dixebite di nava Sûriyeyê da ji xwe re şûnpî yek veke. Diencamê da ji vê ditirs ku bihêz bûna Kurdên Sûriyê bibe sedema bilin bûna hestê cudaxwazîyê di Tirkîye da. Berpirsek Tirk dibêje, “PYD û PKK her yekin. Me hinek nîşanî hene ku ev yekê zelal diken. Roj herdem di bin ewra da namîne. Mê bawerî bi cudahîyê biçûk tine û bawerîya me ji guherrînê mezine”. Berpirsek dî yê Tirk dibêje, “eger ci pêwendî di navbera PYD û PKK da tine, ev dîbî ev mijarê

¹²⁴ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Mohamed Reşo, nûnerê PYD di Kurdistana Eraqê da, Hewlêr, 27ê Novembera 2012.

¹²⁵ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlêr, 27ê Novembera 2012 an.

¹²⁶ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, serokê KNCê, Hewlêr, 9ê kanûna duyema 2013 an.

¹²⁷ Ev pergale tam wek targala Kurdistana Eraqê ye ku heremê bindestê PUK (Suran) û yê KDPê (Bardinan) e û di paytext anku Hewlêrê da herdû hevbeşin, bili ku di Kurdistana Eraqê da cudahîyê zimanî jî zêde dixin. Rayedarek KDP dibêje, “partîyek bi tenê gengaziya kontrol kirina giş heremên Kurdî tine. Negengaze cografiya hereman neyê dîtin. PYD, partîya tenê nîne, partîyê Kurdê Sûrî di be mijarên rêvebirîya ewlehî û perwerdehiyê da alîkarîya hev biken”, Hevpeyivîna Koma Qeyranê, 14ê kanûna duyema 2013 an.

¹²⁸ Binêrin ji Rapora Koma Qeyranê, Tirkîye: PKK û Çaresesrîya pirsgirêka Kurd, herev.

dupat biken. heke ev dixwazin gel me gotûbêjê biken, dibe dupat biken ku ji PKKê serbixwe ne, û guhestina çekan di navbera xwe da qet biken û bilavokek zelal bilav biken”.¹²⁹

Metirsîya giring ya rayedarê Tirk ev ku PYD di Sûriyeyê da wisan bi hêz be ku bingehê çalakîyê wekî bingehê Qendîlê damezrînî, û paşan gengaze PKK ji derveyê sinora êrîş bike yan êrîşa bi rôexistin bike. Hêjayî gotinê ye ku bingeha hêzên çekdar yê Tirkîyê û herwisa operasyonên Artêşa paş desthilatdarîya PYDê di Tîrmeha 2012 an da di hermê sinor tam berbi bajarê Qamişloyê û Kobanîyê hate sazkirin.¹³⁰ Cuda ji armancê hatî ïlan kirî ji alîyê Tirkîyê – anku ji bo berî girtin ji xirab bûna rewşa penabera û di encamê da bicî anîna kirryarê mirovazane – seretayîya Tirkîyê ragirtina PYD ji nêzîk bûna başûrê sinorê xwe yê û evê wek beşek ji stratijiya ewlehîya xwe ya netewî dizane.¹³¹

Tevî ku Tirkîye dixwaze hem ji hêla çekdarî û hem ji hêla sîyasî, PYDî lawaz bike û ragirît, lê di vê demê da naxwaze yekser li ser PYDê êrîş bike, ji ber ku metirsîya ketina nava agir; her êrîşek bi wî awayî, ne tenê pirsgirêka PKKê çareser nake gengaze vê mezintir ji bike.¹³² Zêdetir ji vê, pevçûnê Sûriyeyê encamê sîyasî û olî ji hene ku dibe sedema dijberîya komek ji lîstikvanên ne-Kurd di nava Tirkîyê da (wek Elevis, ku komek olîyê cuda ji Elavîyê Sûriyeyê ne, lê endamê herdu olan ji alîyê bêbawerbarî ji dijberê Sûriyeyê re ku bi piranî Sûnî ne, hevbeşin);¹³³ û di heremê da (Îran û Eraq, herwisa gelek Erabênu ku ji zindî bûna emperyalîsma Tirkîyê dilnigeranin) li gel êrîşa çekdarî dibe.¹³⁴ Hişmendîya diplomatî di Enquerê da ser vê esasê ye ku Tirkîyê, bîltî ji pêvçûnê yekcar yan pey çûn û lêdanê kurt, nabî li ser Sûriyeyê êrîşa çekdarî bikar bîne, ne tenê ji ber ku gel NATO yê hevpeymane, ji ber ku Tirkîye bi tenê nikare ev xebatê bi rewşek bibandor bicî bîne. Berevaj da, dixebeit ku partîyê pêwendî dar bi Barzanî di KNCê dabihêz bike bi armanca serekî ya lawaz kirina PYDê, nedena iznê ji bo bidest anîna Qamişloyê û bitenê hêştin di gotûbêjê sîyasî da.¹³⁵

¹²⁹ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Enqere, Oktobera 2012 an.

¹³⁰ Operasyonên Artêşa Tirk di, 10km ya bakûrê Qamişloyê, û di Suruç, rûbirûyê Kobanê/Eyn el-Erab, saz bû, û di vê da biberçavî tank û topxana Kobanî kiribûne armanc. Binêrin ji Servet Yanatma, “operasyonek bi armanca dijberîya PYDê di rê daye, DYÂî hember êrîşê bergirî daye”, *Today's Zaman*, 2ê Tabaxa 2012 an. Salih Muslim serokê PYD bersiv da: “parastina xelkê xwe di heremê xwe û di bajarê xwe da: mafê mine, kes nikare ku çavê xwe li ser girê bide, û eve kiryarek bû ku me kir. Ji ber vê ci pêdivî bi diltirsîya Tirkîyê û gefê vê nine”. Ruyterz, 7ê Tabaxa 2012 an.

¹³¹ Rayedarek Tirk dibêjî, “rewş gîhişte xalekê ku êdî me nedikarî em rûnên. Metirsîye ewlehî ji bakûrê Sûriyeyê destpê diken, û ew [PYD] dixwazin ev heremê biken Qendilek dî. Lê PYD nikare bo hetahetayî yê ev heremane kontrol bike. – ci cih bo ideolojîya ev partîyê di Sûriyê da tine. Ev ne nûnerê xelkê ne. Her ku rejîm helweşe, di wî welatî da ew tê bê bandor bin”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Enqere, 9ê Oktobera 2012 an.

¹³² Di Adara 2012 an da, Mûrat Karayilan serokê PKKê hişyarî da: “Eger Tirkîye dij bi gelê me di rojavayê Kurdistanê [îşareyek ji bo heremê Kurdi di Sûriyeyê da] da êrîş pêk bîne If, giş Kurdistan tê bibe ceperê pevçûnê”. Jon Heming, “gerîlayê Kurd hişyarî dane Tirkîyê li ser êrîş dij bi Sûriyê”, Rutêrz, 22ê Adara 2012 an. Ev gotinene di rastî da bi derew mezin kirina hêzên û mebestê PKKê ne, lê gengazîya kom kirina Kurdan dij bi Enquerê nîşa dide, di dema êrîş Tîrka dij bi PYDê.

¹³³ Cêfrî Getlêmen, “Eger dij bi Sûriyeyê êrîş pêk bê, şerrê olî tê bikeve nava Tirkîyl”, *New York Taymz*, 4ê Tabaxa 2012 an.

¹³⁴ Soner Cagaptay, “Çîma Tirkîyê êrîşî Sûriyê nekir”, *New Republik*, 13ê Adara 2012 an.

¹³⁵ Partîya Aşti û Demokrasiyê (BDP) di Tirkîyê da, ku partîyek mixalif di wî welatî daye, siyasetê dewletê rexne dike, “Em ne dijberî pêwendîyê di navbera KRGê û Tirkîyê ne, Barzanî dikare rolek mezin di çareserîya pirsa Kurdan da pêk bîne lê dibe PYD bê dîtin. PYD di Sûriyê da bihêzîrn

Wisa tê berçav ku bal kêşan li ser metirsîyên nêz ji alîyê PYD ê û bal kêşan li ser bibandor kirina KNCê bi armanca lawaz kirina¹³⁶ giringîya metirsîyê dî ji holê rakirîye – bi taybet ev metirsîye ku Kurdên Sûriyeyê, bi alîkarîya Barzanî, pey damezrandina modelek wek Eraqê bin. Di Tebaxa 2012 an da Wezîrê Karûbarê Derveyê Tirkîyê Davutoglu paş hatina xwe ji Hewlîr, ku hevdem gel berpirsê KNCê hevdîtin pêk anî, îlan kir eger Encûmena Niştîmanî ya Sûriyê, xweserîya Kurdên Sûriyê qebûl bike, em dijberîyê nakin:

Min ji wan re got, serokê SNCê wek Kurdek Sûrî rêvebirîya encûmenê dike. Û hûn [KNC] lêre da wek Kurdên Sûriyeyê beşdarin. rûnên û lihev biken. Tişa ku em gel dijberin metirsîya terorê ye û gengaziya vê ye ku yek ji we idia ya xwedî bûna cihekê bike. di Sûriyeyê da dibe helbijartin birêve biçî; parliamanek dibî bête damezrandin ku pêk hatî be ji Kurdan, Turkmenan û Ereban. Hûn dikarin gel hev kom bibin û bêjin em ji [Kurdan] re xweserî didin. Ev mijare taybet bi we ye. Em ne dijberî vê ne.¹³⁷

Tevî hebûna Berjewendî yê kurt-demî yê hevbes di navbera Tirkîyê û Barzanî da, Bi texmînek mezin, di demek dirêj da tê alozî bête pêş. Armanca dawî ya KRGê eve ku misoger bî ku Kurdistan Sûriyê zêdetir girêdayî vê bî heya Şamê; û bi bawerî Tirkîye ji vê ditirsî ku encame bibîte sedema handana hestê cudaxwazîyê di nava Kurdên welatê wî.¹³⁸

partîya Kurdane û nabî di gotûbêjê ser pirsgirêka Kurdan bê binpêkirin”, Hevpeyivîna Koma Qeyranê, rayedarê BDPê, Enqere, 10ê Oktobera 2012 an.

¹³⁶ Rojnamevanek Kurd dibêje, “PYD dibêje ku Barzanî bi xemsarî ji me dinêre, ji ber ku em dij bi Tirkîyê ne. Barzanî li lawaz kirina PYDê du armanc: yekim, ji ber ku Barzanî dixwaze bibe modela tenê ya netewexwazî yê Sûriyeyê, tevî ku ji sedî 50ê yan zêdetir ji Kurdên Sûriyeyê Ocelan wek serokê xwe dizanin. Ya duyem, ji ber pêwendîyê herî başdi navbera Barzanî û Tirkîyê, û Tirkîyê naxwazî PYD di Sûriyeyê da bandor hebe”. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Kemal Çomanî, 21ê Îlona 2012 an.

¹³⁷ Gotinek ji *Today's Zaman*, 9 ê tebaxa 2012 an.

¹³⁸ Rayedark Tirk agahîyê zêdetir li ser nêrînê welatê xwe zelal dike û herwisa li ser alozîyê gengazê taybet bi nêrîna Barzanî wisa diaxive: “Sûriye dewletek nîne ku bê parce kirin. Di bakûrê Sûriyê, me çi heremê bi tenê Kurdî tineye. Û damezrandina heremek wisa, dibe sedema alozîya pirsgirêkê. ev tişte her gengaz jî nîne, ji ber ku 1.5 milyon Erab her di ev herema ne da dijîn. Em Kurdistana Eraqek dî di bakûrê Sûriyeyê da naxwazin. Tişa ku gengaze em qebûl biken, pergalek bênavendî ji bo giş welate ku di nav da her parêzgehekê parêzgarek hebi û hinek jî xweserî hebi. Ew rewşê wek pergalekê ye ku em dixwazin di Tirkîyê da damezrînin”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Enqere, 9ê Oktobera 2012 an. Herwisa, lêkolinerk Tirk dibêje, “Barzanî bal dikşîne ser Karta neteweperestîyê. Projeya heremek federal di Kurdistana Sûriyê da tenê wek xeyalekê ye: ji ber ku tene Kurd di ev herema da najîn. Ji vê zêdetir rewşa abûrîya ev heremaneye, ev proje ji hêla abûrî da nikare berdewam bimîne. Bajare herî mezén yê Kurdi Qamişloye, le Qamişlo bê heleb û Şamê wek gundekê y. Qamişlo pêdivî bi Tirkîyê heye bo parastina abûrîya xwe”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Taha Ozhan, serokê, Bingeha lêkolînê Siyasî, Abûrî û Civakî (SETA), Enqere, 10ê Oktobera 2012 an.

V. Zêdebûna şerxwazîye

A. Bilindbûna alozîyê xwemalî di navbera Kurdan da

Tevî ku rewşaê Kurdên Sûriyê bi berferehî ber bi şerxwazî yê ve diçî, lê nezelale ku ev şerxwazîya berferheh bûyê dij bi kê tê bê bikae anîn, dij bi rejîmê. Dijberê (ne-Kurd), Tirkîyê yan jî dij bi hev. Hêzên PYD yê çekdar, anku YPG, bingehê konrtol kirinê di giş heremê Kurdî da damezrandine û şûna rejîmê girtine.¹³⁹

Ev partîye idia dike ku heremê Kurdî diparêzê, û wan hember dijberê çekdar, ku hinek heremê nêzî Kurdan xistene dest xwe, radigrin. Elham Ehmed, endamê PYD di Desteya Kurdî ya Bilind da, dibêj:

Em bi tenê gel û welatê xwe diparêzin. Pêwendiyê me gel Artêşa Azad ya Sûriyeyê [FSA] girêdayî bizava wane. Her ku bixwazin bikevine nava heremê Kurdî, berpirsîya ne parastina gel û welatêmeye. Dema ku FSA ê dixwast ji bo bidest xistina sinorê Tirkîyê bikeve nava Efrîn û Kobanî, em naçar bûn ku gel û welatê xwe diparêzin.

Dema ku rejîmê dixwast ji Kobanê başve bikişîne [di Temûza 2012], me pênc demjimêrk ji karmendê dewletê re derfet dan ku bajar bicî bêhlin. Ewan bersiv nedan û bîryar girtin ku biçin, û ji ber vê me jî êrîşî wan nekir. Di rastî da, heya niha jî du yan sê karmend di ev navandaneda [bê pirsgirêk] dixebeitin. Ya herî balkêş ev bû ku di dema çûna rejîmê, em naçar bûn ku bi çek bajar biparêzin, ji ber ku FSA yê pêşveçûna xwe ji alîyê Carablosê [di navbera Efrîn û Kobanî] destpê kiribû û metîrsî dida ku bajar dagir dike.¹⁴⁰

Herwek di jor da hate bas kirin, ciqê KNCê, ji alîyê KDPê we hatine perwerde kirin.¹⁴¹ Tevî ku Di Nîsana 2012 an da Barzanî piştîvanîya xwe ji Kurdên Sûriyê tenê piştîvanîya “exlaqî, sîyasî û abûrî” idia dikri, û bixurtî “piştgirîya çekdarî û dabîn kirina çekan” red dikir lê di temûzê da bi berçavî zelal kir ku ji kesê ku ji artêşa Sûriyeyê vejetîyan, perwerdehîyê çekdarî dide.¹⁴² Li gor rapora sê kepê perwerdehîyê yê serekî hene: kempa Zeyton di paraêzgeha Hewlîrê, Fîş Xabbor di parêzgeha Dihukê û Zemmar di Nînewa, ku di wan da perwerdehîyê serekî (*devret esasiya*) ji bo serbazan û sinifê pêşketî (devret el-dobbat) ji bo efseran têr pêşkêş kirin. Lîwayên nû pêkhatîne ji, efserên Kurd ku heya qonaxa sitvanîyê serketin û kesên ku ji artêşê revîyane, û herwiha ciwanên Kurdên Sûrî ku neçûne serbazîyê. Li gor gotinê yek ji kesê ku ji artêşê revîya ye:

Ji efserên pêşî yê artêşa Sûriyê re rûtbeyên leşkerî ku pêş da di artêşe da tinebûn hate pêşkêş kirin, û ji ciwanên di bin perwerdê re mehane dihate pêşkêş kirin. Ew giş ji bo pêşeroja Kurdistanê dixebeitîn û dibûne polîsên Kurdî ji heremê Kurdan re, wek hêzên pêşmerg di Kurdisata Eraqê da.¹⁴³

¹³⁹ Agadarî li ser bingehê kontrolê yê PYDê di ev çavkanîyê da hatîye, www.bbc.co.uk/news/world-middle-east-19291072.

¹⁴⁰ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 12ê Îlona 2012 an.

¹⁴¹ Abdûlhemid Derwîş, srokê KDPPSê, ku alîgirê PUKê ye dibêje: lîwayê perwerde bûyî di bi destê KDPê dane. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Jeneva, 27ê Îlona 2012 an.

¹⁴² Binêrin ji www.al-monitor.com/pulse/originals/2012/al-monitor/a-fine-balance-can-barzani-help.html. Barzanî dot “perwerde ne ji bo êrîş birinê ye; ev ji bo parastinê ye ji paş helwesîna Sûriyê û derketina valahîyê ye”. Li gor gotinê Cîn Arrif, “Pirs û Bersiv: Mesûd Barzanî serokê Kurdên Eraqê”, EL Cezîre, 30ê Temûza 2012 an.

¹⁴³ Hevpeyivîna Koma Kirîzê, serabzek pêşî yê artêşa Sûrî ku di kempa Zeytonê da perwerde bibû, Hewlîr, 14ê Oktobera 2012 an.

Rewşa pevçûna, kuştina, revandina mirova û rewşê di yê nexweşîyê di sala pêşî da, pevçûnê di navbera PYD û KNCê nişa dide, Lê belê gelek pêşî ku peymana Temûza 2012 an û perwerde kirina şervana ji alîyê KDPê ve saz bibe. Herwisa, Di êrîşen alîgirên Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) li Efrînê di 3ê Şibatê de ji kêmayî 17 kes birîndar kirin û durişm bang dikirin ku, “Efrîn bajarê şehîdaye, cihê alîgirên Erdogan û Barzanî li vir nîne”.¹⁴⁴ Di 21ê Şubatê, Nesredîn Birhik, endamek PDKSê ku alîgirê PYDê ye û rêvebirê vê Abdilhekîm Beşar e, di êrîşen tivingên fişek-teqînok di hundirê du tirimbêlan da, birîndar bibû u jîyana xwe ji dest da, wisa xuyaye ku PYDê berpirsê ev kiryarê ye. Li gor agaîyan di 19 Îlonê da, PYD birayê Birhik girt û ev rojekê ragirt.¹⁴⁵

Tevî ku peyman bidawî anîna êrîşa di Şibatê da hate girê dan û hinek xebat ji bo alîkarîyê birêve, lê zordarî bidawî nehatin. Sîymend Haco, rêvebirê serbixwe yê KurdWatch dibêje:

[di 16ê Şubatta 2012 an,] PYD û KNC lihevkirin ku dij bi hev şerr neken,¹⁴⁶ lê kuştina Nesredîn [Birhik] nişa dide ku birastî KNC gelek sadeye. KNC ji xelkê re dibêje ku rejîmê ev kuştîye, lê yek ji endamê partîyê bi şexsî ji min re got ku ev bibawer ku kuştina Nesredîn kiryara PYDê ye. Min ji wî re got: “Tê rojek bê ku, hûn daxwaza zivirîan [Partiya] Bees biken”. Wî bersiv da: “Em her niha ji dixwazin ku Bees wegere”.¹⁴⁷

Ji niha ve, heyâ demek ku KNCê ji PYDê lawaztir be, bi gengazî ya zêde tê bixebite ku pevçûnê xwe gel PYD kêm bike. Di Nîsana 2012 an, da Salih Gedo, endamek ji Partiya Yassir, ku pêwendîyek baş gel PYDê heye, ji pirsa li ser tawanbar kirina PYDê bi kuştina xebatkarê Kurdî ku endamê KNCê ne bi rastî bersiv neda u tenê got: “Kê jî li dû van kuştinan be, di nerîna me de dawî rêjîm berpirsyar e”.¹⁴⁸

Wisa tê berçavê pêwendîya ku bin çavdêriya Barzanî di navbear KNCê û PYDê da hate girêdan sembolîk bû tevî ku bandor hebe. Hefteyek paş, li gor rapora KurdWatch, PYD bi nirxek erzan di nava alîgirê xwe da çek bilav kiribûn.¹⁴⁹ Di 29ê Hezîranê da, koma Fesebooka KNCê nivîsek parvekir û di nav da PYD tawanbar kir ku “endamên çekdarê yê serpoş” i zna hatina xwepêşandanê KNC ji Kobanê re nedaye, bi teqîna guleyan ber bi ezmanan ev tirsand û yek ji alîgirê KNCê revandin. Û ev kiryarane “binpêkirina berçav” ya peymanê ye.¹⁵⁰

Herwek hate dîtin, peymana 11ê Tîrmehê bo sedema damezrandina SKCê, ku wek desteyek hevbeş bo çavdêriya kirin li ser hêzên Kurd yê hatî perwerde kirî ji alîyê KDPê ve û wek desthilatdarek yekgirtî di Kurdistana Sûriyê da hat sazkirin; xala

¹⁴⁴ Ji bo dîtina rapor û vidoyê YouTube ku ji alîyê KurdWatch hatine kom kirin, Binêrin ji www.kurdwatch.org/index?aid=2449&z=en&cure=245.

¹⁴⁵ Li gor KurdWatch, “[i] Destpêkê bawerî hebû, ku Birhik ji ber pevçûnekê bi alîgirên rêjîmê re bûye qurbanê êrîşê. Lê endamekî rêber ê partiyeke kurdî ji KurdWatch re da xuyakirin, ku Birhik berî êrîşê ji alîyê alîgirên Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) ve hatiye tehdîdkirin”. Binêrin ji, www.kurdwatch.org/index.php?aid=2464&z=en&cure=245; and www.kurdwatch.org/index.php?aid=2638&z=en&cure=245.

¹⁴⁶ Di 16ê Şubatta 2012 an da, KNCê û PYDê peymanek girêdan û di nav xwe berpirs zanîn ku pevçûnê di navbera xwe da bitaybet ber çavêن xalkê kêm biken. Binêrin ji www.kurdwatch.org/index.php?aid=2455&z=en&cure=245.

¹⁴⁷ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Berlin, 14ê Adara 2012 an.

¹⁴⁸ Binêrin ji www.kurdwatch.org/Sûriyeyê_article.php?aid=2504&z=en&cure=240.

¹⁴⁹ Li gor KurdWatch, alîgirê PYDê dikarin bi 20,000 Lîreyê Sûriyê (nêzî \$250) dikarin çekek xwekar bikirin, lê kesen dî dibe 25,000 (nêzî \$300) bidin. Binêrin ji www.kurdwatch.org/?aid=2560&z=en&cure=245.

¹⁵⁰ Binêrin ji www.facebook.com/E.N.K.L.S post, 30 Hizêrana 2012.

balkêş ev bû ku, du ji pênc endamê PYDê ko di vê desteyê da rayedarin, endanê YPGê bûn. Lê, disan jî paş demek kurt, aloziya xwe nîşa dan û lêbelê ev carê pevçûna çekdarî di navbera YPGê û hinek hêzên Kurd yê perwerde bûyî yê Barzanî, çêbûn, anku li gora rapora dema ku YPGê izn neda ku 650 serrvan bikevine nava Sûriyê. Tê gotin rayedarek YPGê gotibû, “me izna hatinê neda wan ... eger kesek bixwaze heremên Kurdan biparêze, dibî bi me re bibe yek. Em nikarin bilî YPGê çi hêzen çakdarên dî bipejirînin”.¹⁵¹

Ji dema damezrandina Yekîtiya Siyasî ya Demokrata Kurd, her yek ji çar endamê vê, komê çekdar yê girêdayî bi xwe damezrandine,¹⁵² gengaze ev kiryare di pêşerojê da rê bo hatina Kurdên Sûriyê, yê perwerde bûyî ji alîy KDPê ve, ji Sûriyê re saf bike. Gengazîya derketina pevçûnê di navbera ev hêzane û YPGê di deme hatina wan da, û yan parvebûn ev heremê di nnavbera çend komên cuda da, di pêşerojê da tê zelal kîrin. Lê bo diltirsîyê gel hecet hene.

B. *Pevçûn li ser Qamişloyê*

Bi texmînek mezin, di demek dirêj da metirsîya serekî ji Qamişloyê, mezintirin û giringtîn bajarê Kurdî di Sûriyeyê da ye, destpêdike, ev bajare bi hebûna, xelk berçav ji Aşûrî, Siryan û Erebê Sûnî, dilê Kurdistanê te bang kirin, û ji hêla sembolîk gelekî balkêse û sedema wê jî zêdebûn Kurdên ev bajarî û herwisa serhildana sala 2004 an e ku cihê bûyerê bû.¹⁵³ Herwisa ev bajarî hinek çavkanîyê naft û gazê hene, ku dibe sedema zêdebûna giringîya vê bo hemû alîyan.¹⁵⁴

Ji bo KNCê û hêzên perwerde bûyî ji alîy KDPê, Qamişlo gelek balkeş: ji ber ko herdu alîyan piştîvanên rastî di wî bajarî da hene, û ev bajare bingeha wan ya pêşî ye. li wir daye ku ev yan bi PYDê re tê şer bikin yan hîn bibin ku lihev bikin. Kesek nêzî PYD bi kom kirina giş hoyê giringbûna Qamişlo û metirsîyê pêwendîdar bi pevçûnê liser vê, dibêje:

Di Qamişlo yê da Ereb, Aşûrî, Siryî û Elevî hene [ku ji ber sedema şolê ji wî bajarî re hatine weguhestin], ji ber vê rewşa vê gelek aloztir ji Efrîn û Kobanî yê ye, ku bajarê Kurdî ne û çepera PYDê ne. beşek ji Qamişlo yê, binavê Mehal el- Qerabîya [beşa rojavayî], bindestê PYDê da ye; û hêzên rejîmê jî di wî bajarî da hazirin û bingeha partîyên dî jî di Qamişloyê daye. Tirkîye û Barzanî ji ber hebûna neftê,

¹⁵¹ Gotinek ji Roî Ehmad, “nêrîne taybet liser hêzên çekdarên Kurdî di Sûriyeyê da”, *Rudaw*, 5ê Tabaxa 2012 an.

¹⁵² Hemberî gotinê endamek PYD, “dema ku Yekîtiya Siyasî ya Demokrata Kurd hate demizrandin, Hekim Beşar partiya Yekîti û du çiq ji partiya Azadî [anku çar kes ji endamê Yekîtiyê] hêzên xwe yê çekdar di Dêrik, Qamişlo û Amûdê da damezrandin”. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlêr, 4ê kanûna duyema 2013 an. Herwisa KurdWatch zelal dike ku partiya Yekîti liwayek di party Amûda da birêxistîye û di Qamişloyê da jî nîşandaneke leşkerî birêve birîye. Binêrin ji www.kurdwatch.org/index.php?aid=2703&z=en&cur=245; û www.kurdwatch.org/index.php?aid=2701&z=en&cur=245.

¹⁵³ Demek piraniya xelkê Qamişlo aşûrî û siryanî bûn. Niha hejama Filehan ji sedî 15-20 a ne. aloziyê di navbera Kurdan û Filehan gelekin, û sedema vê ji ev ku Fileh bibawerin ku Kurdan bajarê wan digir kirîye û wisa difikirin ku Kurd dixwazin ev bajarî ji Sûriyê cuda biken. Di 2009 an da Filehek Sûrî di Qamişlo ji rayedarek DYB re got: “El-Cizîra [el-Cizîra, heremek ku Qamişlo di navdaye] ne Kurdistan’ e, u xelkê ne-Kurd ci caran piştîvanîya vê jiSûriyê naken – tevî ku li gor nêrîna wî armanca serekî ya Kurdane eve”. “Bakûrê rojhilatê Sûriyê: bilî Kurdên narazî, kesen dî ji hene”, belgeyê balyozxana DYB di Şam ê da, 18ê Adara 2009 an, bilavkirî ji alîyey WikiLeaks.

¹⁵⁴ Di sala 1960 an da, serkanîyê nette û Qaraçık and RiGulanalan, herdu beşek ji herema Cizîre ne. (heremek di navbera Sûriyê û Eraqê da ku dikeva navbera Dicle û Fıratê). Binêrin ji David MekDowal, *Diroka Kurdan ya Rojê*, herev., p. 476.

îzn nedane PYDê ku ev bajarî bidest bînî. her bi vê sedemêye ku pevçûnê di navbera xelk û rejîmê yan di navbera partîyên Kurdî bihev re, têne berçav.¹⁵⁵

Tevî ku Qamişlo her bi dîrokî bingeha partîyê girêdayî bi KNCê bû, lê PYDê ji di dirêjîya sal û nîva derbas bûyî da, gelek desthilat di wî bajarî da bi dest xistine. di Adara 2012 an da, rayedarê KurdWatchê Siymend Haco ji zêdebûna hêza PYDê di komkirina xelkê da agaî da û got: “Niha, PYD dikare 2,000 kesan bi [piştgirîya xwe] di Qamişlo yê da derxîne kolanan û ji ber vê xebatkarên [dij bi rejîmê yê ne-PYD] di Qamişlo ji vê ditirsin. Di pêşîyê da PYD tenê dişêya herîzêde 200 kesan di Qamişlo yê da kom bike”.¹⁵⁶ Tevî hebûna metirsîyên pevçûnê di navbera Kurdan di wî bajarî da, biciânîna serkevtî ya beşkirina desthilatê di navbera KNCê û PYDê di bin çavdêriya barzanî da, dikare bi derbasbûna demê, bixurtî pevçûnê di nava Kurdan di wî bajarî û heremên dî yê Kurdan, kêm bike.

Lê Tirkîye jî yek ji lîstikvanê ev meydanêye, û armanaca vê ya yekim, pêşgêrî ji bidestanîna Qamişlo ji alîyê PYDê ye, ku tişa ku ev dewlete jê ditirsî ev ku, bidest anîna wî bajarî dibe sedema bihêz bûna ev tevgerê û sedema vê hindê ku ev tevger bikare bal bikşîne ser giş heremê Kurdî û hemûyan bi dest bînî. Li gor nêrîna Enquerê desthilatdarîya siyasî û çejdarî ya Kurdan li ser Qamişlo – ci ji alîyê PYDê yan KNCê – vê pêk bêt, di demek dirêj da, dikare bibe detpêkek bo serbixweyî ya Kurdên Sûriyê.

Ji ber ev sedemê dijberên ne-Kurdên Sûriyê ji desthilatdarîya Kurdan li ser Qamişlo di qonaxa guhestinê da ditirsin – evjî di demekê da ku rejîm her lawaztir dibe, û SNCê û FSAê ji ber dupatkirina hêzên xwe ji bo desthilatdarêya Sûriya paş-Esed ketine dijberî yê. Riaz el-Esad, rêveberê FSA, paş serhiladana Temûza 2012 an di bajarên Kurdan da got: “Em ci caran Qamişlo ji ci partiye Kurdan re nadîn, û em amadene ji bo axa Sûriyê şerr biken”.¹⁵⁷

Qamişlo xala serekîye bo tecqînê, lê ne ya tenê ye. Bajarên dî yên bi pirranî Kurd jî cihê metirsîyê ne. bo mînak niha di Amûdê da, ku bajarek bi pirranî Kurdê, çend kom di nav da hene, ev komene pêk hatine ji: PYD, Yekîti bi serokatîya Ismaîl Hema (yek ji endamê KNC ê) û Komîteya Ciwanê Amûdayê, li gel karmendê rejîmê ku her swer şola xwe ne. Paş paşvekêşana rejîmê di Temûza 2012 an da, PYD kontrola hindek avahîya xiste destê xwe, û di Çleya pêşîn da hebûna xwe di Navena Rêveberîya Ewlehiyâ Siyasî, the Daireya saloxgêriya Leşkerî û Navenda da berferehtir kir.¹⁵⁸

¹⁵⁵ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Temûza 2012 an.

¹⁵⁶ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Berlin, 14ê Adara 2012 an.

¹⁵⁷ Edib Abdilmacîd, “Serokê Artêşa Azad ya Sûrî dibêje ez îznê nadem ku ci heremek Kurdî di Sûriyeyê da bê damezrandin”, *Rudaw*, 31ê Temûza 2012 an.

¹⁵⁸ Ji bo agaîyê zêdetir li ser Amûda, Binêrin ji www.kurdwatch.org/index.php?aid=2702&z=en&curc=245.

VI. Pêwendîyên aloz gel Dijberêne Ne-Kurd

Partîyên Kurdî netenê ligelhev belke gel komên dijberêne ne-Kurd jî bijberin, û hemû bi hêvîdarîya helwesana rejmê dû bingehekê ji xwe re digerên. Gelek Kurd, bi taybet alîgirê PYD, bi sedema hestêne neteweperstîya Erebî û serhişkia Islamî ku ji alîyê mixalifêne ne-Kurd, tê dupat kirin, û herwisa liber girêdanê berçava gel Tirkîyê, xwe ji mixalifêne ne-Kurd dûr digrin; bi sedema vê û hinek sedemê dî, mixalifêne ne-Kurd yên çekdar nikarin di hermî Kurdî da bibandor bin. Tevî ku hinek ji çekarêne Kurd gel mixalifan lihevkiri bûn, wek lîwaya Selahedîn (ji xwarê binêre) û “gurdana Meşel Temo”, ku ji kesen cudabûyî ji artêşa Sûrî pêk hatine,¹⁵⁹ hinek dî tercîh diden ku beşdarî çekdarêne girêdayî bi partiyêne Kurdish bin û yan beşdarî yek ji sê kempê ewle yê penaberan di Kurdistana Eraqê da bin.¹⁶⁰ Komên duyem zêdetir tercîh diden ji kempa Domizê nêzî Dihuk re biçin, li gel 22,000 hezar penabern, ku bi giştî ji cuda bûyîyê artêşê û malbatêne wan pêkhatîye.¹⁶¹ Du kampê dî, anku Moqebleh û Qamişlo, ku paş bûyerên Qamişloyê di sala 2004 an da, hatine damezrandin, gelek kêm penaberên nû bi xwe dîtine.¹⁶²

Dijberîyê di navbera Kurdish û Ereban bi rewsek dî ji têne berçav. Li gor rapora, PYD nuqteyên kontrolkirinê wek astengîyek ser rîya guhestîna komên dijber yê çekdar bikar dînît. Kesek nêzî ev tevgerê got ev partîye izna hatûçûnê ji bajarê bin desthilatdarîya xwe re dide lê izna damezrandina kempa û yan xebatê berçav di ev bajarane da.¹⁶³ Encama ev kiryarê bi formekê, peymana êriş nekirinê dijbihev ya qerîne tê hisab: PYD dixwaze şer ji Heremên Kurdî dûr bike, û mixalifêne çekdar dixwazin li ser xebatêne xwe yê dij bi rejîmê kom bibin. Wek encamek, herdu alî bi hevbeşî Heleb û derdûrê vê û herwisa bakûrê rojava kontrol diken.¹⁶⁴

Ev rewse di dawîya Oktobera 2012 an da kete ber metirsîya. Hinek pevçûn bi sedema pêşigirtin ji bikaranîna sinorê Tirk û astengîya pêwendîdar bi gundêne Ereban di Heremên Kurdî yê bakûrê rojavayê Heleb, çebûn. Di 25ê Oktoberê, “Lîwaya Selahedîn” ku lîwayek Kurdî ye (ku li gor rapora beşek ji FSA ye, û endamê vê bi pirranî xelkê Efrîn ne) û “Koma Al-Nesra” ya Selefi ketine nava taxa Eşrefiyê (taxek Helebê gel xelkê tevlîhev e û di nêzî taxa Kurdish şex meqsûde û heyâ ev demê di destê PYD/YPG da bû). Eşrefiyê ji hêla çekdarî da heremek bi stratejîke ji bo gîş

¹⁵⁹ Binêrin ji www.youtube.com/watch?v=LyoMgGj3tGY.

¹⁶⁰ Mihemed Balot, “Kurdên Sûriyeyê gel mixalifêne çekdar li ser xweserî danûstandin diken”, *As-Sefîr*, 20ê Hizérana 2012 an.

¹⁶¹ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, cudabûyîyê artêşê yên Kurdên Sûrî, Kampa Domizê ya penaberên, Hizérana 2012 an. Rojnamevan Caş Wod di Îlona 2012 an da nîvîsi 22,000 Kurdên Sûriyeyê di Domizê da dijin, nêzî 9,000 ji wan “mêrê sobeyîn”. <http://twitter.com/woodenbeirut>.

¹⁶² Cudabûyîyê Kurd ji artêşa Sûriyeyê ji ber du heceta direvin: tirs ji zordarîyê (ji alîyê artêşê bi sedema revîn ji artêşê û yan ji alîyê mixalifêne çekdar ji ber beşdarnebûa gel komên çekdar yê ne-Kurd); û rewşa abûrî ya xirab di Sûriyeyê da. Ji ber ku rewşa penaberên Kurdê Surî di kepê penaberan da gelek xirabe, gelek Kurdên Sûriyeyê wisa difikirn ji ber ku rewşa abûrîya Kurdistana Eraqê baše, derfetên serketina abûrî liwir zêdetirn û hêvî darin, lê ev mijare di rastîyê da pêknayê û bêkarî dibe sedema beşdarbûna hinek ji wan ji komê çekdere. Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Kurdên Sûriyeyê yê cudabûyîyê ji artêşê û malbatêne wan, Domiz, kempa penaberan, Hizérana 2012 an. Dema ku ji yek ji kesen ji artêşa Sûrî ve ceqetiyaye tê pirsîn ku ji ber ci şûna revîn ji Kurdistanê re beşdarî artêşa azad nebûye, di bersivê da dibêje: “Am piştîvanîyê ji FSA ê diken, lê beşdarbûn ji FSA ê re gelek bi metirsîye; û gengaze kû mirov bi asanî bê kuştin”. Gelek revokên dî bersiva wî dupat diken.

¹⁶³ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Temûza 2012 an.

¹⁶⁴ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Mihemed Reşo, nûnerê PYDê di Kurdistana Eraqê, Hewlêr, 1 Novembera 2012 an.

alîyan: ji bo YPG/PYD, sedema giringbûna vê eve ku, rêya ev partîyê ji bingeha wan di bakûrê rojava anku bajarê Efrînê re diveke; û ji bo komên çekdar yê mixalif jî sedema giringbûna wî heremî ev ku rêya gihiştina wan ji bajarê Azazê ku di bakurê Helebê û nêzî sinorê Tirke daye û firokexaney biçûk ya rejîmê livê da heye, vedike. Di pevçûnê di navbera ev komane û YPGê da 30 kes hatin kuştin. Û pevçûn ji vê heremê da berfireh bûn û bû sedema revandina dijbi yek di heremê da û herwisa sedema pevçûnan di gunêñ Kudî yê bakûrê wî bajarî da.¹⁶⁵

Di meha Novemberê da jî, li Res el-Eyn (Serê Kaniye) di navbera El-Nesr û YPGê da pevçûn derket, ev bajare ku ji Ereban û Kurdan pêkhatîye, di sinorê Tirkîyê da û di cihekê da cih girtîye ku berjewendîyê PYD, KNC û rejîma Esed tevlîhev dîbin. Li herdu alîyan hinek çekdar hatin kuştin. Dema ev rapore dihate amade kirin pevçûn ji nû da hatibûne destpêkirin û wisan dihate berçav ku bi rewşek metirsîdar berferh bibe.¹⁶⁶

Heya niha nezelale ku peymana kurtedem tê bikarî tevî ev pevçûnê bidomî yan ne, lê zelale ku hebûna lîwayêñ Kurd dij bi PYD, hem di nava FSA yê û hem jî di derveyê vê da, ev peymanê dêxe nava metirsîyê da. Paş pevçûnê Helebê, PYD zêdenavê çete li ser lîwayê nûyê Kurdî dana. Nûnerek PYDê got:

Em naxwazin ne gel rejîmê ne jî gel FSAê şerr bikin. Tevî ku, erka me parastina heremên Kurdî û ewleh ragirtina wan e. her di dema ku komek ji artêşa azad bikeve nava Eşrefiyê, hêzên rejîmû û pevçûnê pey xwe tînine nava bajar. Niha Eşrefiyê di bin destê YPGê daye. Mebesta me ne şere û em nxwazin gel ci alîyekê bişerr bêñ lê heyâ dema ku ev ji heremê dûr bin.¹⁶⁷

Pêwendîyên aloz gel eşîrên heremî yêñ Ereb jî berbiteqînê daye, û girêdayî bi aloziya di navber partîyên Kurd û komên dijber yê çekdar heye. Tevê ku wisa tê berçav ku di qonaxên destpêkî ya serhildanê da, herdu alîyan dawxazên xwe hember rejîmê da hevrêz kiribûn,¹⁶⁸ lê pirsgirêka erdî û gumanên dijbîhev, ku beşek vê bisedema xebatêñ demdirêj yê rejîmê bo hanadana alîyekê dij bi alîyê dî pêkhatin, û dijberîya li ser berjewendîyên heremî, bûye sedema zêdebûna bûyerên zordarîyê. Bi taybet dijminî gel ev eşîran pêktê ku rejîmê ev di dîrokê da, bû damezrandian dalanek Erebî û vequetandina Kurdên Tirkîyê û Kurdên Sûriyê ji hev di sinor da bicî kirine.¹⁶⁹

Zêdetir ji pevçûnê çekdarî û dijberî gel eşîran, PYD gel rewşekê rûbirû bûye ku jêre dibêje dorpêckirina hatî sepandin ku ji herdu alîyên mixalifên çekdar – ku izna hatina xwarin û enerjîyê ji heremên Kurdî re nadan – û hem ji alîyê Kurdistana

¹⁶⁵ Binêrin ji Lauren Williams, “Rebel groups work to contain Kurd-Arab, Intra-Kurd tensions”, *The Daily Star*, 1 November 2012.

¹⁶⁶ Clashes rapportaedly intensified on 17-18 kanûna duyema 2013, gel fighters from the Al-Nusra Front and another armed group, Ghuraba al-Sham, battling Kurdish militia after they assaulted the border town. Binêrin ji <http://mobile.france24.com/en/20130118-kurd-jihadist-fightings-rage-northern-Suriyeyê>.

¹⁶⁷ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Mohammed Rasho, PYD representative in Kurdistana Eraqê, Hewlêr, 1 November 2012.

¹⁶⁸ di Nîsana 2011 an da, civata nûnerên herema Hesekê ku pêkhatîye ji panzdeh rayedarê Kurd, çardeh serok eşîrê Ereban û Filehek, listeyek ji daxwazê taybet li ser alîkarîyê dewletê, pêşveçûna binxanê parêzgehê û mijarên dî pêşkêşî Esed kirin û heyâ ku bi vê rewşa pasvemana ev parêzgehê ji alîyê regîmê ve bê guhertin. Binêrin ji www.kurdwatch.org/pdf/kurdwatch_forderungen_en.pdf.

¹⁶⁹ Dema ku serokê eşîra Beqerê ji hatina Cebhet el-Nesra, komek selefi-cihadi ya çekdar, ji Res el-Eynê re keyf xweşîya xwe nîşan da, Kurdan bertekkeq nerînî nîşan dan. armed group, upon its entering the border town of. Binêrin ji www.rudaw.net/english/news/Suriyeyê/5416.html. alîgirîya wî ji Tirkîyê û siyasetên Tirkîyê, di nava hindek Kurdan da ev bawerîye dupat kirîye ku Enqerê eve ku eşîrê Ereb û Tirkmen di ev heremane da li hember PYDê da hevrêz bike.

Eraqê ser wan da hatîye sepandin, ku bûye sedema sazbûna astengîyan li ser pêwendîyen abûrî di navbera Sûriyeyê û Eraqê.¹⁷⁰ Tevî ku gengaze komên çekdar yê ne-Kurd, ku bi meroqî pey çavkanîya ne, tenê ji ber çavkanîya êrîş diken, lê ev kiryare hesta dorpêcbûnê û dijberîyê di nava Kurdan da bihêz dike. Endamek ji PYDê dibêje:

FSA yê li ser rêya hatina petrolê ku ji Şamê bi rêya Homs, Selamî [û] Reqa digihîste Qamişlo astengî danane. Ev pirsgirêkê bandor danaye ser Kobanî û Efrînê. Herwisa ewan sinorê di navbera Kurdistana Eraqê û Sûriyeyê girêdaye. Êdî bêwendîyê abûrî negengazin. Pêştir gundi di vegehistina amûran da çalakbûn. Lê ev jî niha di rewşek aloz dane. xeyal biken: hinek ji wan darêni bin mala xwe da dişewitînin heya xwe germ bikin. Nan çinînin. Ev dorpêç kirine niha di heremê Kurdan da berdewame dimeşe. Û ez wê projeyek bo fetisandina PYDê dizanim.¹⁷¹

A. PYD: pêş girtina rêyek serbixwe

Hember nêrîna PYDê, beşek mezin ji dijberên ne-Kurd hem gelekî nêzî Tirkîyê ne û hem ji ideolojîyek Islamî û neteweperestîyek Erebî pêk hatine. Ev mijare li ser SNCê raste, hem Encûmena Niştîmanî ya Sûriyê ya pêşî û hem saziya vê ya niha anku Hevbendiya Niştîmanî ya Sûri, ku paş civîna mixalifan di Çiriya paşîna 2012 an li Qeterê hate damezrandin. Di civîna PYDê di Brukselê di Adara 2012 an da, nûnerê vê ji metirsîya Biraderên Musilman (Ixwan) bas kirin, ji ber ku ev kome di vê demê da beşek mezin ji SNCê pêk anîbû; ev nûnerane Ixwan ji wergirtina alîkarîya re tawanbar kir, ci ji Tirkîyê, ku bi nêrîna wan ev alîkarîya bi sedema dijberîya Tirkîye hember armancê Kurdan pêktê, û ci ji welatên Kendavê, ku ev jî dixwazin İslâmîyeta li gor xwe livê da bilav biken.¹⁷²

Bi taybet, dupata nûnerê PYDê li ser gotinê aloz yê serokê pêşiyê SNCê yê anku Burhan Xelyûn ku Kurdên Sûriyeyê wek penaberên İslâmî li Fransayê nîşandabûn û li gor nêrîna wan ev gotine armanca ev komê bû binpêkirina mafê serkî yê Kurdan nîşan dide.¹⁷³

Gotina xelyûn bû sedema xwepêşandanêne mezin di giş Kurdistana Sûriyê bi taybet di nava Kurdên ne alîgirê PYDê. Sîrwan Kaco, rojnamevanek, got, “her paş gotinê Xelyûn, û gotinê Biraderên Musilman yên dî, li ser ev mijarê Sûriye ‘welatek Erebî û İslâmî’ ye, dihate dîtin ku kesên zêdetir di nava xwepêşandana da alaya Kurdî bilin dikirin, ku bi wateya bijartina meşek neteweperestîya mezin bû”.¹⁷⁴ Di hember da, SNC ji hember PYDê bêbawerbarîye, ji ber ku wisa difikire ku ev partiye ji berjewendîyê rejîmê re xizmet dike.

Di dawîyê da, PYD birryar girtina beşdarî Komîteya Tensîqê ya Niştîmanî ya Hêzîn Guhertina Demokrat bibe(NCB), ku dijberê herçêşît êrîşa biyanî di Sûriyeyê

¹⁷⁰ Hinek lêkolînker birryara girtina sinorê di navbera Kurdistana Eraqê û Sûriyeyê zêdetir ji ber nabûna stratejîyek hîşyar ji alîyê KRGê ve dizanîn heya pilanek sîyasi dij bi PYDê. Binêre ji Sîrwan Kajjo, “Kurdên Sûriyeyê di sinorê helweşanê da”, Projeya lêkolîna zanyarîyê Rojhilata Navîn (MERIP), 7ê çileya paşîna 2013 an.

¹⁷¹ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlêr, 5ê kanûna duyema 2013 an.

¹⁷² “Rojhilata Navîn û Demokrasi”, konferansa PYDê, herev.

¹⁷³ Alan Simo nûnerê PYDê got, “SNC, Kurdan wek penaberên Fransê bang dike. Çawa ezê li kêlega we da şerr bikem dema ku hûn min bi fermî nazanin?” Binêrin ji <http://peaceinkurdistancampaign.wordpress.com/2012/02/17/Sûriyeyen-kurdish-opposition-groups-hold-public-meeting-inparliament>.

¹⁷⁴ Hevpeyivîna telefonî ya Koma Qeyranê, 31ê kanûna duyema 2012 an.

da ye.¹⁷⁵ Serokê PYDê Salih Muslim bû cêgirê Serokê NCB yê anku Hesen AbdilEzîm.¹⁷⁶ Lêkolînerek Kurdê Sûrî zelal dike:

PYD bi gelek heceta birryar girt ku beşdarî NCB yê bibe. Yekim, NCB zêdetir bo guherînek demoratêkê pey axivtinê ye heyâ ku helweşana rejîmê. Duyem, PYD nikare biberçavî alîgirîya xwe ji rejîmê re nîşan bide ji ber ku piştîvanîya xwe ji nava Kurdan da ji dest dide. PYD formek ji xwe wek beşek ji mixalifan nîşan dide ku bi gotûbêja dixwazin guherîna bisepînin. Bi nîrîna min eger NCB beşdarî SNC yê bibe, PYD tê ji herdûyan veqete.¹⁷⁷

B. *KNC: Pêwendîyêن bêhêvî gel Dijberêن ne-Kurd*

KNC ku bi tundî dijberî rejîmê ye, ji NCBê re bêbawer e, (ji ber ku nîrîna vê gelekî nêzî rejîm û PYDê dizanî) û herwisa ji dijberêne-Kurd ji cudaye, KNC xwe di rewsek aloz de dibîne. SNC ya pêşîn xebatê berdewam meşandin heyâ gel KNC yê pêwendî girêbide,¹⁷⁸ pey agadar bûn ji ser vê esasê ku anîna nûnerk ji netewa Kurd di bin sîya xwe da, tê ji ev encûmenê re alîkarî bide ku bibe nûnerîn giştî yê dijberan; her wisan, Tirkîye jî bi hez bû Kurdan bêxe bin sîya komek ji mixalifan heyâ ku bikare bandor dane li ser wan. Lê ev xebatane bê encam man, bi taybet bi sedema dilnigeranîya KNCê ji bêbaldarî li ser armancê Kurdi re. Kurd ji nepejirandina gotina “Neteweya Kurdi” ji alîyê SNC ê û bi sedema nepejirandian gotûbêj li ser listeya daxwazêne Kurdan di Tîrmeha 2012 an li Qahîreyê di civîna ku ji aliyê Komkara Erebî ve hatîbû pêkanîn, bi tundî nerazî bûn; ev daxwazane pêk hatibûn ji pergalek

¹⁷⁵ Piranîya Kurdên Sûrî, wek endamê KNCê, ji êrîşa biyanî dij bi Sûriyeyê keyfxwes dîbin. Abdilbasit Seyda Serokê Kurd yê SNCê , ku 10ê Hizêrana 2012 an da ji şûna Burhan Xelyûn, hat bijartin (pêşî ku xwe ji di Çiriya paşîna 2012 an da dema ku SNC hate guherrîn, guherî), got, “eger hêzên navnetewî êrîşi Sûriyeyê, gengaze ne tenê Sûriyeyê neasa be, belke ew rewse bikeve nava welatê di jî”. Binêrin ji www.facebook.com/TheSûriyeyêNationalCouncil. Endamek partîya Azadî got, “êrîşa biyanîya bêgengazîye. Ev êrîşe bi mecbûrî çekdarî nîye. Elbet [armanc] dibe parastina gelê Sûrî li hember dewleta zâlim û zordar be”. *El-Xebrer*, wegerrîn ji alîyê *El-Monitor*, 13ê kanûna duyema 2012 an.

¹⁷⁶ Rexneker beşdarbûn di NCBê re bizavek dij bi rejîma Esed nizanin. Ji ber ku hinek komê ko ev rêtixtine saz kirin pêwendîyêne wan gel rejîm hene. Rayedareke dewleta Tirk got, “NCB opozisyon ‘Esed’e”. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Enqere, Adara 2012 an. Hinek partîye KNCê ji beşdarî NCBê bûn, lê bi zexta KNCê û Barzanî endametîya xwe ravestandine. Barzanî di 28ê kanûna duyema 2012 an di Hewlêr bi beşfarîya Koma Kirîzê axivî û got, komên Kurdi dibe ji encûmenê giştî da derkevin û beşdarî KNCê bibin. Eve xebatek bû bo yek kirina KNCê wek alîyek sêye ji opozisyonera serbixwe ya Sûrî. Paş damezrandina ev encûmenê di Oktôbera 2011 an da, réznama vê ji partîyan re derfetek du mehî diyar kir bo derketin ji komên dî yê mixalif. Di encam da, Partiya Yasir, Partiya Demokrata Kurdistan li Sûriyê bi serokatîya İbrahim Nesredîn (çiqê veqetîya ji PDKSa Abdilhakîm Beşar) û Partiya Demokrata Kurd li Sûriyeyê bi serokatîya Jemal Mihemed Baki, endametîya xwe di NCB yê da ravestandin (bişûna ku vê betal biken). Hevpeyivîna Koma Kirîzê, nûnerîn partîya Kurdên Sûriyeyê, Hewlêr, kanûna duyema 2012 an.

¹⁷⁷ Hevpeyivîna telefonî ya Koma Qeyranê, 7ê kanûna duyema 2012 an.

¹⁷⁸ Bo mînak, lêkolînerek SETAê, ku odeya ramana nêzî AKPêye, got, “dibe em KNCê bikişîne nava SNCê bi pêşkêskirina hejmare zelal ji kursîyan ji wan re.eger ev kiryare gengaz be eve tê bibe xala serketinê bo helweşana rejîma Esed. Heke KNC beşdarî SNCê bibe, di Sûriyeyâ paş Esed da tê desthilatê vê zedetir be. beşderbûn di SNCê re, gengaze ji KNCê re pergalek bihêz bide û bibe xalek giring ji bo gotûbêj kirin di gel hêzên navnetewî”. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Üfûk Ûlûtaş, Enqere, 16ê Adara 2012 an.

ne navendî, bi fermî naskirina Kurdan di makezagonê da wek neteweyek ciyawaz û bi fermî naskirina zimanê Kurdî wel yek ji zimanê fermî di Sûriyeyê da.¹⁷⁹

SNC têkoşînên xwe berdewam kirion. Tevî ku rêzname damezrandia vê ji pergala ne nadendî re bas nekiribû, lê du roj paşê civîna Qahîreyê rêznameyek nû nivîsin ku di nav da hate zelal kîrin “ku divê destûr misoger bike ku welatî, dûr ji binyada wan ya neteweyî, xwediyyê heman maf û erkan bin. Di ser wê re jî tê xwestin, ku “çareseriya pirsa kurdî bi hemahengiya ragihandinê navneteweyî yê mafê kom û mirovan pêk were”.¹⁸⁰ Lê ev nêrîna nû jî, ji bo pêşvebirian axavtinê di navbera SNCê û KNCê da ci alîkarî nekir, yek ji sedemê vê ya herî kêm gotinê Xelyûn serokê KNCê her tam paş bilavkirina vê bû, ku got nabî Kurd xew ji “şaştîghiştinê” modela federaliyê ve girêdê bidin, û got ku em vê daxwazê wek cudaxwazî dibînin.¹⁸¹

Heya bijartina Abdilbasit Seyda di Hezîrana 2012 an bo serokatiya SNCê, ku Kurd bû û hate şûna Xelyûn, jî nebû sedema nêzî bûna do KNC û SNCê. Bûna Seyda ji sala 1994 di Swêdê da bibû sedema vejetîna wî ji tevger dijber û herwisa partiyê sîyasî; pêwendîyê nêzî wî gel Tirkîyê bo sedema gumanbarîya Kurdan li ser wî, heya kesen ku gel PYDê jî hevrêz nebûn; û ji ber ronakbîrî û navendşopî ya xwe, wî nedikarî hemberîya partiyê gelperest (popûlîs) bike, ku zêdetir li ser daxwazên Kuradan yê kolanî bi navê “mafê Kurdan” dilnigeran bûn, û têgeha mafê Kurdan ev qasî berfereh bûya ku “mafê” hebûna pergalek federalî ji di navdaye.

Li gor nêrîna Kurdan, gotinê Seyda bi taybet li ser mijara federalîsmî bûye sedema pirsgirêkê. Wî di meha Adara 2012 an ji Koma Kirîzê re got, pêş ku ez bibme serokê SNCê: “ez gel pergala ne navendî hevrê bûm, lê federalîsm daxwzek radikale. Masûd Barzanî li gel me hevrîye ku rewşa me gel wan ciyawaze. Em nikarin ji Eraqê çav bikin”.¹⁸² Nûnerek ji partiya Azadîyê girêdayî bi KNC dibêjre:

Daxwaza me ev ku hevbendîyek li gel partiyê mixalif li ser naskirina mafê Kurdan û damezrandina xweserî û federalîsmê vajo biken. Lê SNC û NCB ev mijarê nafejirînin. Dijber heya dema ku mafê Kurdan ji bo hebûna pergalek federal nefejirînin, nikare hevbendîyê [anku, razî kirina KNCê bo besdarbûnê] bike.¹⁸³

Lê, KNC û SNC yê pêwendîyê xwe gel Enquerê parastin e.

Pêwendîyê Kurdan gel mixalifên Sûriyê heya paş damezrandina encûmena nû ya dijberan anku Hevbendîya Nişîmanî yê Sûriyê ku di 12ê Novembîra 2012 an hatîbû damezrand, ji rûbi başî neçûn.¹⁸⁴ Endamên KNCê û Masûd Barzaî bi xwe ji bo besdarbûn di civîna li ser damezrandina hevbendîyek mezintir ji mixalifan çûne Qeterê, tevî ku PYDe nehate gazî kîrin. Nûnerên kurdan çar merc bo besdarb xwe îlan kîrin ku pêkhatîbûn ji: dibî yek ji 3 çêgirê serokê hevbendîyê Kurd be; ji sedî 15 ji

¹⁷⁹ Edib Ebdilmajid, “Partiyê Kurd ji civîna mixalifên Sûri di Qahîre da derketin”, *Rudaw*, 5ê Temûza 2012 an.

¹⁸⁰ Li gor gotina *El-Hayatê*, wergêrr ji alîyê *El-Monitor*, 5ê Nîsana 2012 an. Mistafa Mihemed, Endamek Kurd yê SNCê, got Kurd “di bijartina armancê xwe da birastîne û dizanin ku dibe di nava Sûriyeyê da û gel dewleta navendî lihev biken”. Ü di encam da, “ew di vê rewşê da daxwaza pergalek serpixwe naken; û ne di pêşerojê da bi hêvî ninin ku ji vê armancê re bigehin. Ev zêdetir li ser mafê xwe di nava Sûriyê da dilnigerani”. Wî herwia got ku Kurdên Sûriyeyê “hêvî tinînin ku xweserîyek wek Kurdên Eraq bi dest bînin”. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Washington DC, Oktobera 2012 an.

¹⁸¹ SNC êdî ji heremên Kurdê Sûriyeyê re “Kurdistan” a Sûriyê nabêje û êdî vê wek pergala xweserîyê li Kurdistana Eraqê da nabînî. Burhan Xelyûn diyar kir ku tiştek bi navê ‘Kurdistana Sûriyê’ tine, ev modela ji Eraqê vediguhzîne Sûriyê”. Gotinek ji *Rudaw*, 17ê Nîsana 2012 an.

¹⁸² Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Istenbol, 12ê Adara 2012 an.

¹⁸³ Binêrin ji *El-Xeber*, wergêrr ji alîyê *El-Monitor*, 13ê kanûna duyema 2012 an.

¹⁸⁴ Navê fermî yê ev komê, Hevbendîya Nişîmanî bo Serhildana Sûriyeyê û Hêzîn dijber.

endamê hevbendîyê Kurd bin. Hevbendîyek li ser daxwazênu ku Kurd mafê xwe yê serekî di makezagonê da dizanin, bête damezrandin; û peyva “Ereb” ji navê “komara Erebî ya Sûriyê” bê rakirin.

Tevî ku di dema damezranidan hevrêzîyê da ci birryar li ser vê mijarê nehate girtin, lê bi lez peyamek ji serokê hevbendîyî anku, Ehmed Moazel-Xetib, hat standin ku beşdarbûna Kurdan di gotûbêjên da xêrhatin gotibû, lê daxwazê pêwendîdar bi makezagonê tenê paş hilweşîyana rejîmê têne gotûbêj kirin.¹⁸⁵ KNC ev peyame “nepejirandî” bang kir û ev red kir, û PYD ji her ev berteke nîşan da: “Kurd tenê di demekê da tê besdar bin ku daxwazê wan bêne pejirandin”.¹⁸⁶ Ev astengîya berçav li ser pêwendîyê di navbera Kurdan û Ereban rewşa sala 2003ê yan di navbera Kurdan û komên mixalifên dî di Eraqê da tîne berçav. Dijberîyê xwemalî yê KNCê gengaziya hevbendîyê gelekî kêmtiler dike. Damezrandina Yekîtiya Demokratîka Kurdên Sûriyê di Çileya pêşîna 2012 an da, aloziyê di navbera endamên KNC zêde kir; serokên SKDUê serokatîya danûstandina gel mixalifên ne Kurd bidest xistin, û partîyên dî avêtine qiraxê. Bi gengaze stiratîjîya wan ev bû ku di destpêkê kurdan bisepînene nava dijbera; û paşê, dema desthilatdarîya xwe wek nûnerên Kurdan dupat kirin, li ser çareserîyek federal di heremên Kurdan da israr biken.¹⁸⁷

Endamek KNCê ji qewimîna ev bûyerê ditirse:

Paş Dohayê, mixalifên Sûriyeyên giş daxwazênu me red kirin û axavtin li ser rewşa pêşeroja Kurdan xistine paş helweşana rejîmê. Lê [SKDU] bi her nirxekê dixwaze xwe li ser dijberên Sûrî bisepîne û bêjî em besdarî mixalifin Sûrî bûn. Ev dixwazin serokatîya gotûbêja di giş qonaxa da bidest bîmin û bi nûnerîya giş Kurdan bipeyivî. Heke ev vê kiryarê bidomînin, kursî ya xwe tê di KNCê da ji dest bidin. Tenê Desteya Kurdi ya Bilind [pêkhatî ji endamê KNC û PYDê] mafê biryar standên liser daxwazênu Kurda heye.¹⁸⁸

¹⁸⁵ Rayederk bilind ji bersiva ev pirsê da ku helwesta hevbendîyê li hember pirsgirêka Kurdan çawaye, got, “mijara Kurdan bi nêrîna me aloze, lê aloziyâ rast di nava wan xwe daye. Ev nêzî 30 komane û hinek ji wan bi tundî dij bihevin. Di vê mijarê da ji destê me nayê”. Hevpeyivîna Koma Kirîzê, Qahîre, Kanûna yekima 2012 an.

¹⁸⁶ Hevpeyivîna Koma Kirîzê, endamê KNC yê; Mihemed Reşo, nûnerê PYDê di Kurdistanî Eraqê; herdu di Hewlîrê da, 27ê Novembera 2012 an.

¹⁸⁷ SKDU’zelal kirîye ku nûnerê ji sedî 70êji Kurdên Sûriyeyêye. Binêrin ji www.rudaw.net/english/news/Suriyeyê/5562.html.

¹⁸⁸ Hevpeyivîna Koma Qeyranê, Hewlîr, 9ê kanûna duyema 2013an. Wî zêdetir got: “KNC niha di pêkanîna destpêkîyê civînekê gel dijberane ku di nav da em besdarbûna Kurdan [di] nava dijberan da li gor daxwazê zelal dane mijara gotûbêjê da. Di civîna yekim da tenê In the KNC tê besdar be, û partiya PYDê di civîna duyem da tê besdar be”.

VII. Encam

Siyaseta Kurdan di Sûriyê da diguherre û bi gengazîye mezin heyâ paş helweşana rejîmê, û bi texmîn heyâ demek dirêj her wisa bimîne. Valahîya ku di sala 2012 an da paş paşvekêşana rejîmê di heremên Kurdan da pêkhat ji alîyê komên cuda ve hate pirr kirin ku berjewendîyê ciyawaz hene, hinek ji wan pêwendîyê nêz gel PKK hene û hinek dî gel KRGê ku bin destê KDPê daye, hevrêzî hene.

Ev rewse ji Kurdên Sûriyê re hem metirsî û hem jî derfet afirandine. FSA ji xwe metirsîyeke. Ne tenê jiber ku bi ketina xwe nava hermên Kurdan yan heremê ber bi sinorê Tirkîyê ku xelkê tevlîhev hene, dibine sedema êrîşa rejîmê bo tolhildanê, belke bi vê sedemê jî ku di gelek babetan da şiklek nû ji neteweperestîya Erebî ya dij bi têgeha berferh ji mafê Kurdan di Sûriyeya paş Esed da pêk anîye. Eger pevcûnê niha bibine şerrek befereh, çekdarê Kurd û ereb jî gengaze ji ber nebûna hikometek heremî, dij bi hev bikevine nava. Herwisa, dijberîya di navbera PYD û KNC, ku niha ji ber pêtwendîyê hevbeş di nava Desteya Kurdi ya Bilind (SKC) da, kêm bûne. Gengaze bibe şerrek berçav.

Niha, bigîstî Kurdan heyâ niha pêngavê mezin ji bo bidest anîna mafê zêdetir avêtine û niha bo yekim cara desthilatdarîya heremln xwe bi dest xistine. Mebesta wan dupat kirina ev desthilatane di nava makezagona nû daye ku zo yan direngê tê pêkbê, wan derfet bo bihêz kirina xwe bi damezrandina hêzên çekdar ku erkên polîsan di heremên xwe da ser stu digrin hêja zanîne û di dema pêdivî da ev hêzane bo parastina xwe hember her hêzekê di Şamê da – ci pergala nû yan pêşerojê– ku gengaze êrîşî wan bike, bikar bînin.


Di damezirandian ev rîyê da, dibe bi hişyarî bixebeitin, ku ne dijberên ne- Kurd ji xwe bêhêvî biken û yan nebîne sedema handana dewletê biyanî bo êrîş ser wan. Di encamê da, bijara herî baş ji wan re ev ku di pevcûnê sîyasî bo damezrandian pergalek nû, ji hev re bibine hevlê tam. Ev mijare pêdivêt ku lîstikvanên Kurd yên ciyawaz li ser esasek sîyasî hevbend bin û helwestek ron bo pêşerojê saz biken heyâ li gorvê gel wekhevê xwe yê ne-Kurd danûstandin biken. Di vê mijarê da komên ciwanên serbixwe yê Kurd dikarin rolek giring di bihêz kirina pêwendîyê navbera Kurdan û endamên civakê yên dî-hem Ereb û hem komên kêmâtî yê di – û herwia hanadana daxwazên Kurdan wek beşek ji daxwazên mezintir jibo bîfermî naskirina mafê hevwelatiyê, li ser stu bigrin. Heke kurd bikarin çend salê dî idia bikin ku birryara wan bo besdarbûn di ev pevcûnê da bo sedema vê hinde ku bibine hevwelatiyê tam û mafê wan ji alîyê makezaggonê we hat parastin, mirov dikarî bêjî ev rewse di Danberhev gel rewşa pêşî, pêşveçûnek giring ji wan re tê zanîn.

Hewlêr/Şam/Birûksel, 22 yê kanûna duyem a 2013 a


Pêvek A: Nexşeyê Sûrya



Pêvek B: Nexşeyê Partîye Pêwendîdar gel PKKê



Pêvek C: Nexşeyê Partîye Pêwendîdar gel KRGê



Pêvek D: Naveroka Nişanê Kurtenav

AKP or AK PARTY – Adalet ve Kalkınma Partisi (Justice and Development Party): Turkey's ruling party, led by Prime Minister Recep Tayyip Erdoğan.

BDP – Barış ve Demokrasi Partisi (Peace and Democracy Party): a Kurdish political party in Turkey, represented in parliament.

CCC – Central Coordinating Committee: A governance body established by the PCWK in Kurdish areas of Syria. It coordinates the work of People's Local Committees.

FSA – Free Syrian Army: the main Syrian armed opposition group (in reality, a very loose coalition of groups) to emerge from the 2011 uprising.

KCK – Koma Ciwakên Kurdistan (Union of Communities in Kurdistan): an umbrella organisation created by the PKK in 2005-2007 for its affiliates in Turkey, Iran, Iraq, Syria and the diaspora. The PYD is formally a member.

KDP – Kurdistan Democratic Party (Partiya Demokrata Kurdistan): one of the main Kurdish parties in Iraq, founded in 1946 and headed by Masoud Barzani, president of the Iraqi Kurdish region.

KDSP – Kurdistan Democratic Solution Party: Iraqi affiliate of the PKK.

KNC – Kurdistan National Council: founded in Erbil in October 2011 under the patronage of Masoud Barzani, the president of the Iraqi Kurdish region, it comprises sixteen Syrian Kurdish political factions not aligned with the PYD. The most influential parties are direct sister parties of Talabani's PUK and Barzani's KDP in Iraq.

KRG – Kurdistan Regional Government (Hikû-metî Herêmî Kurdistan): the official governing body of the predominantly Kurdish region of northern Iraq. The president of the Iraqi Kurdish region is Masoud Barzani; its two largest parties – the KDP and PUK – have ruled since the KRG's inception in May 1992.

KDPPS – Kurdish Democratic Progressive Party of Syria (Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurdi li Sûriyê), or simply Kurdish Progressive Party: Syrian sister party of Jalal Talabani's PUK in Iraq, headed by Abdulhamid Darwish.

NCB – National Coordination Body for Democratic Change: a Syrian opposition alliance.

PCWK – People's Council of Western Kurdistan: PYD-affiliated elected local assembly in Syria's Kurdish areas that provides social services, established in late 2011.

PKDS – Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyê (Kurdistan Democratic Party of Syria): Syrian

sister party of Masoud Barzani's KDP in Iraq, headed by Abdulhakim Bashar.

PJAK – Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (Party of Free Life for Kurdistan): PKK/KCK sister party founded in 2004 and focused on Iran.

PKK – Partiya Karkerê Kurdistan (Kurdistan Workers' Party): Kurdish party in Turkey founded in 1978 by Abdullah Öcalan. It started an armed insurgency there in 1984 and currently maintains around 3,500-5,000 insurgents based in the Qandil mountain range of northern Iraq, as well as in Turkey. The PKK is considered a terrorist and drug-smuggling organisation by Turkey, the EU, the U.S. and a number of other countries.

PLCs – People's Local Committees: local governance bodies established by the PYD in Kurdish areas in Syria.

PUK – Yeketî Nişîmanî Kurdistan (Patriotic Union of Kurdistan): founded in 1975, one of the main Kurdish parties in Iraq, headed by Jalal Talabani, the president of Iraq since 2005.

PYD – Partiya Yekîtiya Demokrat (Democratic Union Party): the Syrian Kurdish affiliate of the PKK/KCK, founded in 2003.

SKC – Supreme Kurdish Committee: transitional governing body comprising the PYD and KNC, based on the power-sharing "Erbil Declaration" signed by the two parties under the tutelage of Masoud Barzani on 11 July 2012.

SKDU – Syrian Kurdish Democratic Union, a group of four Barzani-leaning KNC members established in December 2012.

SNC – The Syrian National Council, formerly the main formal Syrian political opposition group to emerge from the 2011 uprising. It has been superseded by the National Coalition for Syrian Revolutionary and Opposition Forces, commonly referred to as the Syrian National Coalition or Syrian Opposition Coalition.

TCK – Tevgera Ciwanê Kurd (Kurdish Youth Movement): association of Kurdish youth activists in Syria who have organised and recorded demonstrations largely using social media.

YPG – Yekîneyên Parastina Gel (People's Defence Corps): the PYD's armed wing in Syria, established in 2012 and deriving from the PKK. It is the dominant armed Kurdish force in Syria.